



bang a h e q j i kelhaamed

kovara İslamî çandî u hunerî

Sal:1 • Jimar:1 • Gulan / Heziran / Temuz / 2009 • Biha:3.5 TL

Banga Heq

Ji Kelhaamed Divê go bighê her Kurdi

عقیدە ئاقا جیانی بە

EM EVINDARÉ TE U SUNNETA TENÉ
NIMAG, GAN U MALÉ INSUNİ XELASNENO
ŞÉX EHMEDÉ XANİ



Xutba Xatirxwaziyé

Wergér : Hüseyin OLAM

(Peyxemberé me Hz. Muḥemmed (s.x.l) pişti miladé dı sala 632 da, bı hicri sala 10'a, dı nehé meha zilhiccé, roja iné, pişti zevalé, dı newala Arafaté da lı ser deveha xwe Qaswa, lı hember 124 hezar insana, dı şexsé wa de ji temamá insaniyeté re wuha xıtap kırıye)

“Hemd jıbo xweda ye. Em jé re hemd dıkn u jé alikariye dıxwazın. Xweda hidayeté bıde ki, idi kes nıkare wi şaş bıke. É ku xweda wi şaş ji bıke; idi kes nıkare wi bine hidayeté. Ez şahidi dıkn ku ji xweda péve tı ilah tının. Xweda yeke, heval u şiriké wi tının. Disa ez şahidi dıkn ku Muhammed resulé wi ye.”

“Geli insana! Lı xeberdané mın qenc gohdarıkın! Nızanım belki ji isal u péve carki dı lıvr ez u we hev nebinın. Geli insana! Çewa ev rojé we rojé muqeddesın, ev mehé we mehé muqeddesın, ev bajaré we (Mekke) çewa bajarek mubareke, wuha ji cané we, malé we u namusa we ji muqeddese, ji her destdréjiyé hatiye starkırın.”

Eşhabé mın! Muḥeqqeq huné bigéjın xweda. We çı kırıbe Ewé ji we bıpırse. Nebi nebi ku hun pişti mın şaş bıbın u bizıvrın ser halé xwe yé beré u lı suthuyé hev xın. É ku lıvr hazırın bıla vé wesyeta mın bıghının wan kesé ku lıvr ne hazırın. Dıbe ku bıgéhéjine yeké wusa ku ew gohtiné mın çétr féhm bıke.

Eşhabé mın! Lı cem ki emanetki hebe bıla véga bıde xwediyé wi. Bızanbın ku new'é faizé tev hatine hılanın. Xweda wusa hıkım kırıye. Dı seré péşi de mın faiza 'Ebbas é kuré 'Ebdulmuttalib rakırıye. Lé belé peré wey é ededi é weye. Ne zılmé bıkn u ne ji ji zılmé re rıza nişandın.

Eşhabé mın! Bala xwe bıdn, çıqas adeté ku ji cahiliyé mane tev hatine hılanın u dibiné piyé mın dene. Xundariya dewra cehaleté bı temami hatiye hıldan. Dı seré péşide mın xundariya neviyé 'Ebdulmuttalib İyas é kuré Rabı'a hılaniye.

Geli insana! Muḥeqqeq şeytan dı vé erda we de bı temami héviya xwe ji we biriye. Lé ku hun dı karé xwe yé bıçuk de bıdn pey, wé ev ji, wi dılxweş bıke. Jıbo sitara diné we xwe ji va tışté bıçuk ji durkın.

Geli insana! Miqata heqqé pireka bıkn u divé xususé de ji xweda bıtırın. Pirek lı cem we emaneté xweda ne, u we namusa wan bı emré xweda lı xwe helal kırıye. Çewa heqqé we lıser wan heye heqqé wa ji lı ser we heye. Heqqé we yé lı ser pireka ewé ku, nivina we mıḥafeze bıkn u kese ku hun jé ne xweşbın bé ızna we wa nexın mala we; lé belé ku bé ızna we tışki wusa bıkn, xweda ızna we daye, hun karın wan dı nivina wan de bı tené bıhéln, ku rast nebun hun karın bıledanek sıvık lıwaxın. Heqqé pireka lı ser we eve ku lı ser örf ü 'adeté, xwarın u cılı wan te'min bıkn.

Geli mü'mına! Ez du emanet ji we re dihélım. Ku hun lıwan xwediti bıkn u lı peywan herın hun tıcar şaş nebin. Ev emanet kitaba xweda Qur'an a Kerim u sünneta peyxemberé wi ye.

Geli mü'mına! Lı gohtiné mın qenc bıhısın u baş fehm bıkn! Hemu müslüman brayé hevin. Jı müslümaneki re xun u malé bırayé wi ne helale. Le ku bı dılxweşi bıde helale.

Geli insana! Cenabé Heq, her ki heqqé ki wi hebuye xweda heqqé wi dayiyé. Para her kesi ji mirasé jé re veqatandiye, ne hewceye ku wesyet lı xwedyé mirasé bé kırın. Zaruk ser doşeka ki çébe 'eydé wi ye. É ku zınayé bıké bépar dimine.

Geli insana! Rebbé we yeke. Bavé we ji yeke. Hun hemu zarwé Ademin. Adem ji ji axé ye. 'Ereb ji é ne 'Ereb, u é ne Ereb ji ji é 'Ereb ne mezıntrın. É tensor ji é tené wi reş, é tenreş ji ji é tené wi sor ne mezıntr e. Meznati bı teqwayé ye, bı tırsa xweda ye. Ki pır ji xweda bıtırse lı cem xweda é bı qımet ew e. Koleki reş lı ser seré we bıkn amır, u ew ji bı kitaba xweda we idare bıke gere hun lé bıhısın u ita'eta wi bıkn. Her kes bı sucé xwe mes'ule. Sucé kur lı bav naye kırın, u sucé bav ji lı kur nayé kırın.

u Qenc bala xwe bıdn! Qetiyyen va çar tıšta nekn!

u Tı tıştéki ji xweda ra nekn şirik.

u Ew cané ku xweda daye u heram kırıye bı neheqqi ne kujın.

u Zınayé nekn.

u Dızıyé nekn.

“Geli insana! Wé sıbé mın ji we bıpırın, huné bejin çi?”

Seḥabiya wuha gotın:

“Te Qasıdiya xweda bı ci ani, te erka xwe bı heqqi bı ci ani, te wesyet u nesıhet lime kır, emé lı ser van şahidi bıkn!”

(Bı ser viya Resul é xweda (s.x.l) tılya xwe ya şehadeté bıınd kır, paşi bı ser cemaaté de bıır u ani u wuha goht:

“Şahid be ya Reb! Şahid be ya Reb! Şahid be ya Reb!”

J1 Weşankâr



Ale md ji Rebbê ‘alemê re be. Selat û silav li ser Peyxemberê me Muḥemmed Sallallahu ‘aleyhi we selam, al û eṣḥab û etba’ên wî be...

Birayên Mısılmânên Kurd! Me nîyete bi izna Xweda ê ‘alemê bi vî şeklî em Kovarekî bi zimanê kurdî, bi navê “Banga Heq ji KELHAAMED” derxîn. Em hêvîdarin ji Xweda ê ‘alemê ku serfrazîyê bide ji domandinê re, û me ji rîya emrê xwe dernexe. Feydê pê bide gelê me û tevên Mısılmana û bike wesîla hîdayeta ji rê ketîya û şîyarîyê...

Sebebê me hewceyî dîtîye bi bal derxistina vê kovareê ev çend tiştin:

1– Bi delîla ayeta 31’ê ji sure ê Beqere hinek ‘alimên Îslamê weke Îmamê Eş’arî, Cabbaî û Ka’bî gotine, tevên zimana tewqîfîne ne îstîlahîne.¹ Xweda ê ‘alemê bi bavê me Hz. Âdem dane hînkirin. Wî jî bi zarokên xwe dane hînkirin û bi vî awayî ziman gehane îro... Yanî tevê zimana Xweda çêkîrîne û bi însana dane hînkirin. Ne ku însana ew çêkîrîne û bihev dane hînkirin. Her ziman diyarî û emanetekî Xweda ye liba ên ku pê xebirdin. Lazîme biparêzin û dewrî nesla peyxwera bîkîn. Pêşîyên me zimanê me ê Kurdi, parastîne û gîhandîne me. Divê em jî vê diyarîyê û emanetê biparêzin û biğhînin zarokên xwe... Armançek jî ji armanca me bi derxistina vê kovareê ev e...

2– Bi delîla ayeta 22 ji sûre ê Rûm, gelekbuna zimana ‘elametek û nîşanek ji nîşanên Xwedane û delîlek ji delîlên meznayî ya wî ne. Ji ber vê yekê, divê tevên zimana bêne sitirandin û neyên jibîrkirin. Dî şerî’eta Îslamê de tevê zimana azadîn, tî ziman ne memnu’e. Dî demên dewletên Îslamîde tî sultanên zalim jî men’a tî zimana ne kîrîne. Belê piştî îdarê neislamîyê li welatê Mısılmana bune ḥakîm, zimanê kurdî hatîye men’kîrîn. Ji ber vê yekê parastîna her zimanî li ser xwedîyê wî zimanî lazîm e.

Me dest bi derxistina vê kovareê kiriye ku em pê zimanê xweyî kurdî miḥafeze bîkîn. Lewra ziman ayetek ji ayetên Rebbê me ye. Çawa em divên zimanê xwe bistirînin, wek vê em divên ku ḥemu gelê dî jî zimanê xwe bistirînin. Pîrbûna zimana ayetek ji ayetên Rebbê me ye. Em mexluq û ‘ebdê Xweda ne, û em Mısılmanin. Ji ber vê lazîme herdemî bergeh û nêrîna me di çarçova rîza Xweda de be.

3– Xweda ê ‘alemê gava tişteki dide yekî wî tiştî jibonî miḥafeze bike pê şêrîn dîke û dide ḥezkîrîn. Xweda ev di fitreta her kesî de bicî kirîye. Çawa her însan ji ewladên xwe û malên xwe ḥezdike bi vî awayî ḥez ji zimanê xwe jî dîke. Gava yek bi zimanê wî pêre xeber dide kêfa wî tê. Vens û sebra wî bi wî insanî tê, pirtîr jê fêmdike û divê lê guhdarî bike... Ji ber vê yekê ders û danezanîya qençtir û xweştir

ewe ku bi zimanê meriv be.

Jiber ku me xwest em jî, bi zimanê xwe dîn û dîroka xwe ji gelê xwe re bêjin û bi vî awayî xîzmetekê ji gel û dîn û zimanê xwe re bîkîn –Tevî ku hinek kovarêndin jî Îslamî û kurdî hene. Lê belê me nihêrt hingî ku zordesta zimanê me û gelê me ji paşve hiştîne hewceyî zêdetir heye– me jî xwest em jî milekî xwe bîdine ber vî barî.

4– Ji demeke dirêjve Ewropayî dixwazin temamên xelqên Mısılman ji Îslamê dur bîxînin û dûrahî bêxînin nav wan û Îslamê bi wan bîdînin jibîrkirin. Li vî karî bi gelek wesîla dixebîtin. Yek ji wan xebata jî tehrîf kîrîn û xerakîrîna zimana ye. Bi navê ‘edilandîna zimanan gotîne Îslamî ji nav zimanan derdixînin û di cîyê van de yan gotîne sun’î yan jî gotînen xwe bîkar tînin. Hinek insan bi zanebun hinek jî bi nezanî jî vî karê çepel re bune alet. Çawa ku ji zimanê Tirkî gotîne Îslamî davêjin bivî awayî jî ji zimanê kurdî gotîne Îslamî davêjin yan jî diguherînin. Parastîna ziman û ‘edilandîna wê ne ewe ku ji peyvên Îslamî û ji peyvên dost û cîrana bê parastînin û di cîhê wan da peyvên gîrîb û emperyalîstan bête danîn. Lewra bûneke tabî’î û fitrîye, insan çawa exleq dide û distîne ji heval û cîranê xwe, ziman jî didîne hev û distînin. Bi vî awayî insan nêzî hev dibînin û jihev fêmdîkin, dibîne hogîr û ji hev îstîfade dikin û jihev bawer dibînin. Ji ber vê yekê zimanên ‘Erebî, Farisî, Tirkî û kurdî gelek nêzî hev bûne. Lewra xwedîyê van zimana cîranê hevînin, têkîlî ya wan bi hevra heye û tevde Mısılmanin.

Bixêr înşaallah ewê kovara me bi giranî bi zimanê kurdî û Îslamî û kulturel û sîyasî be. Beşne nivîsê me ewê bi herfê Latinî bin, beşin jê jî ewê bi herfê ‘Erebî bin. Me di kovara xwe de biçukê kurmanca jî jibîr nekîrîn. Bi distûra Xweda jibonî biçukê kurda emê di kovara xwe de tiştê sîpehî û xweşik û delal û bikêr, diyarî bîkîn.

Dî vî karî de jiber ko em nûne û neceribandîne dîsa jiber ko em însanin, kêmayî û qusurê me wê çêbîbîn. Me hêvî ye ji birayên xweyî xwendevana ku ji mere bîbînin alîkar. Nebînin pozber û reqîb û neyar. Lewra nîyeta me jî xîzmete ne pozberî û reqabet û menfa’ete.

Înşaallah emê di destpêkê de kovara xwe ji sé meha carekê derxînin. Belê bi alîkariya rebbê xwe em hêvîdarin ku di wextek nêzik de emê ji mehê carekê derxînin.

Hêvîya me ji xwendevanê meyî hêja eve ku ne bi şîretê xwe tene, bi dî’ayên xwe jî ji me re bîbînin alîkar ku em kovara “Banga Heq ji KELHAAMED” bigîhînin her kurdî û her cîhî.

Xweda ê Te’âlâ bi me û we û ḥemukê Mısılmana ra be. Salamên Xweda ê ‘alemê, li we xwendevanên hêja bin. Em we dispêrîne Xweda ê ‘alemê.

Xefkên Lı ber Xort u	M. EMİNZADE - 3
Banga Heq.....	- 5
Heyat u Mırna me.....	Mucahidé Mala Evdlilé Kolo - 6
Suretê Fatihê.....	- 7
Em Evindaré	M. Xalid Bağdu - 8
Hemd Ji Te Re Be.....	Mehmud KILIÇ - 10
Mersela Fila	M. Mehmed et-Tibyati - 11
Mewluda Nebi.....	Zinnur Zıvngi - 13
Çil Hedis.....	- 15
Ehmedé Xani Kiye.....	Necat ÖZDEMİR - 16
Lı Ser Dirokê.....	Zinnur ZIVINGİ - 18
Peyvên Mezına.....	- 19
Serpêhatiya Feqe Suheyb.....	M. Eliyê QIZILTEPE - 20
Jı Cewşenê.....	M. Tahr SORANİ - 22
Pelek Ji Tarixê.....	İsmail FURQAN - 23
Exlaqê Xebatê.....	Muhsin CANAN - 26
Hinek Hesbihal.....	Recep TOPRAK - 28
Kija Pır Şérine?.....	Fexreddin ŞEMREXİ - 29
Hevpeyvîn (Tehsîn İbrahim Doski).....	- 31
Medeniyetek me hebu.....	- 37
İro ez dîlzîz bume.....	İhsan ATAQ - 38
Ey Ustad é mîn!.....	Mirza NUR - 39
Cotkar révi mar.....	M. Zülfü TAN - 40
Ewwel birîqî.....	Şêx Ehmedé Xani - 41
Lı Ser Resulullah.....	Melayé Cıziri - 42
Ya Reb Hewar.....	Melayé Batéyi - 43
Ellah çî zatek ehse n e.....	Feqiyê Theyran - 44
Tét.....	Eliyê Heriri - 46
Herfé Héca é.....	Siyehpuş - 47
Ehmed Yasin e.....	Mela Mizgin - 48
Yek kes heye.....	Mela Eliyê Zila el-İlmi - 49
İnsan bîla Bawer bîkîn.....	M. 'Ebdullah Dêrguli - 50
Ya Resulallah.....	Şêx Müşerref - 52
Heyf u Heyf	Haci Fettah Hezrowi - 53
Were.....	Recep TOPRAK - 54
İlahî.....	Cevdet KARAMAN - 55
Du Hicw.....	Salih Begê Héni - 56
Nîmac, Can u malé.....	A. Gönül - 57
Pé nome Homé, ma dest	İ. Çabakçuri - 58
'Eqida İmané Ava Heyatêye.....	- 59
Bexçê Zaroka	- 62
Elfabe - Ferheng	- 64



Bedi'uzzaman

ŞİRETA BEDİ'UZZEMAN 4 MELA SEİD É KURDÎ

U weseyeta paşi: Xwendin, xwendin, xwendin... Desthevgirtin, Desthevgirtin, Desthevgirtin...



Seid Yusuf

HER KESİ JIBO XWE, 24 AN EMÉ JIBO KÉ BİGRİN

"Té çeyî u qenci dîkır... Tu lı me xwedi derdiket... Tu her tıştê me bu... Lé belé a nîka tu lîber mîriné ye... İcar té me terk bîki u here... Lı pey te ki heye kul ı me méze ki?"



Omer Nisébini

ZIMAN U ÇANDE U 35 WÉJEYA KURDÎ...

Dinê İslamê ti carî qeyd ne danîne ser zimana. Kî bî çî zimanî xeberdabin, piştî ku misilman bune jî bî zimane xwe xeberdan e. 'Adetê xweyî neğeyrî İslamî dom kirin e. Şahidê me dîrok e.

XEFKÊ LI BER XORT Û KEÇÊN KURDA

Bi navê Xweda ê Rehman û Rehim

Silavê Xweda ê Te'ala li ser we xwendevanê hêja bin.

Her daim û demê hemd ji Xwedara be. Selat û silav jî li ser peyxemberê me Muḥammed Sallallahu aleyhi we sellem be.

Bi rastî iro em pir dilgeşin. Xeyalên meyî duh, îro pêk hatin e. Em bivê zahf kêfxweşin. Lewra bi zimanê xwe, emê karibin çend gotina ji hev re bêjin. Li gorî zanebun û taqeta xwe karibin rîya heq û rastîyê şanî hevdu bidin û li ser rastîyê bibin alîkarê hev.

Jîyana mirova bi hinek tiştên qîymet digre. Heger ev tişt nebin, ji jîyanê re rûmet namîne û di neqeba heywan û mirovan de farqî çêna be. Bes em zanin ko mirov û heywan di jîna xwe de ne wek hev in. Belê her çikasî di tiştên de bişibîne hev jî dirastîyede ne wek hev in. Însan bi hiş û wijdan û gelek xesê xweyî ma'newî de ji heywana tê veqetandin. Xususe bi îman û karê xweyî Îslamî de ev farqî der tê holê.

Ji berêve dijminê Îslamê êrîşa didine gelê Kurd. Ev jî ji ber ko gelê Kurd, ji roja Îslam qebl kirî heta weke iro ji dîne xwe tawiz ne daye û ji armanca xweyî Îslamî ne vegeriya ye. Dîrok şahide ko ti carî gelê Kurdê misilman dev ji Xweda ê xwe û peyxemberê xwe û dîne xwe ne berda ye. Dem hatîye bi hezara kesan xwîna xwe rijandî ye, dem hatîye talanbun û koçberî dane ber çaven xwe dîsa jî ji jîna xweyî Îslamî ne vegeriya ye û paş ne ketine.

Êrîşên neyara ti carî ne sekinîn e. Car hatîye wek me got, bi kuştin û talan û zulm û zorîyê hatine, car hatîye bi xapa hatine. Li ber gelê meyî misilman xefkê xaîn vedane jibo ko wan ji dîne wanî pak û paqij dur bikin.

Iro disa bi van xapê xain wek rovî di kêlek û quncikan de sekinîne û xort û keçên me, yek bi yek dikin xefken xwe. Wan ji dîne wan dur dikin. Ji ber vê divê em gelekî şehrezar û jîr û zana û şîyarbin. Dijminê Îslamê raste rast nayên me. 'Eyarê dostanî û hevaltîyê li xwe dikin û bi wî awayî tene me. Gotinên xwe dixemlînin û bi wan gotinên xemilandî me bê hiş dixin. Piştî digihine armanca xwe, wek dûpişk bime



divedin. Dek û xap û xefkê wan gelek in û dikevîne her rengî. Ji bo bighine armanca xwe her tiştî mubaḥ dibînin. Ji ber vê yekê divê em li hember wan xwe bi parêzin. Êrîşê wanî xain def bikin û kemîne wan bi feşkilînin.

Em vîya ti carî jibîr nekin ko dijminê Îslamê serê pêşî êrîşî imanê dikin. Lewra baş dizanin ko iman, xwedîyê xwe ji hemu nebaşî û xerabîyan dur dike û disitirîn e. Îman weke mertal li hember tîr û rima di sekin e. Weke dîya kezeb şewitî xwedîyê xwe hemêz dike. Nahêle xesar lê bibe. Dijmin vî tiştî baş dizane. Ji ber vê yekê dixwaze pêşî imanê ji holê rake yan jî ze'îf bike. Gava îman ji holê rabu yan jî ze'îf bû, parastina wî kesi nebi mefere. Êdî ji her nebaşî û xerabîyê re amade dibe. Wek kopal berî wî bindine kû bi wirda diçe. Berxwedan jê re namîne û hew karê bi dijminra tekoşînê bike.

Xefkê xain û kafira zaḥfin. Li her alî dideynin. Wek mezinê xweyî şeytan ji her alî de tîn û insana dixapînin. Ev xafk, hêdî hêdî imanê bê sitar dihêlin û lingê yekî dişemîtînin.

Înşaallah bi izna Xweda ê Te'âlâ, bi alîkarîya Wî di pêşde emê li ser van dek û kemîn û xefkê wan binivîsînin. Ev xefk çine? Bi çi awayî misilmana digşênine nav xarabî û guneha? Emê bersiva van pirsê bidin u vana derxine holê.

We dispêrime Xweda...

*"Dî bêgewetiyê de zarokeki neh salî u
yextiyareki not salî wekhevîn. Belê ewê
yextiyar, ro bi ro dithewe ber bi qebrê
ve diçe; ê zarok rast dibe, ber bi xortanîyêve bilind dibe." (Munazarat)*

ŞIRETA BEDÎ'UZZEMAN MELA SEÎD Ê KURDÎ

Ey geli Kurdan!

*Îttifaqê de quwwet, ittihadê de heyat, dî bratiyê de
se'adet, hukumetê de selamet heye. Kapîka ittihadê
u şîrita muhebbetê qewî bigrîn, da we jî belayê
xelas ke.*

*Qenc guhê xwe bîdîné, ezê tûşteki jî we re bibêjim:
Hun bîzanîn kus ê cewherê me hene; hîfza xwe jî
me dixwazîn.*

Yek İslamiyet e; ku hezar hezar xuna şehidan bîhayê
wê dane.

Ê duduyan insaniyet e; ku lazîme em xwe dî nezera xelqê de bî
xîzmeta 'eqî, cîwanmêrani u insaniyeti xwe nişani dîné bîdîn.

Ê sîsiyan milliyeta me ye, ku meziyetê da me; ê berê ku bî qenciya xwe sağîn, em bî kar ê xwe, bî
hîfza milliyeta xwe , ruhê wan dî qebra wan de şad bîkîn.

Pîştî wê sé dijminê me hene, me xerab dîkîn:

Yek feqirtî ye; Çîl hezar hemmalê Stenbol ê delîl ê wê ye.

Ê duduyan cehalet u bêxwendîni ye; ku hezar jî me da yek "qezete" nîkarîn bîxwinîn delîla wê ye.

*Ê sîsiyan dijminî u îxtîlaf e; ku ev 'edawet, quweta me wunda dîke, me jî musteheqî terbiyê dîke u
hukumet jî jî bêînsafiya xwe zulm lî me dîkîr.*

*Ku we ev seh kîr, bîzanîn çara me ev e; ku em sé şur ê elmas bî dest xwe bigrîn, da ku em hersê
cewherê xwe jî dest xwe nekîn u her sé dijminê xwe jî ser xwe rakîn.*

U şur ê 'ewîl: me'rifet u xwendîni e.

Ê duduyan: ittifaq u muhebbeta millî ye.

*Ê sîsiyan: insanê bî nefsa xwe şuğl ê xwe bîke u mîna sefîlan jî qudreta xelqê hévî neke u pîştî xwe
nedêté.*

U wesiyeta paşî: Xwendîni, xwendîni, xwendîni... Desthevgirtîni, Desthevgirtîni, Desthevgirtîni...

Mela Seîd

*(Ev şîret jî teref Bediüzzeman Seîd ê Nursî bî zîmanê Kurdî hatiye nîvsandîni. Dî sala 1908'an de dî
qezeta (Rojnameya) "Kurd Teawun we teraqî qezetesi" de, dî héjmarî 1 ê de hatiye weşandîni.)*

“Banga Heq ji KELHAAMED” DÎVÊ GO BÎGÎHÊ HER KURDÎ

Bi navê Xweda ê Reḥman û Reḥim
Silavê Xweda ê Te’âlâ li ser we
xwendevanê hêja bin.

Hemd ji Xweda ê ko em bi Îslamê rûmet kirî û
jîneke Îslamî dayî me ra be. Selat û silav li ser
peyxemberê me Hz. Muhammed Sallallahu ‘aleyhi
we sellem û malbat û eshabê Wî û tevê Misilmana be.

Xweda ê Teâlâ me ji ‘ebdîtîya xwe re xuluqandîye.
Di Qur’an’a pîroz da weha ferman kirîye:

“Mîn cinn û însan, tenê ji bonî ji min re
îbadet bikin xuliqandine.”

Ev ayeta pîroz emrê me dike em tenê ji
Xweda ê ‘alemê re ‘ebdîtîyê bikin, imanê
pê bînin, jêre şîrka çenekin û em emr û
nehyê wî bicî bînin. Yani divê em li her cihî,
di her demî, di her karî de di daîra emr û
nehyê Wî de bimeşin û tevgerîyê bikin.

Ji ber vê xususê di serî de divê di
muamelê xweyî bi pîrek û zarok –yani bi
her ferdê malbata me re– û xwedî û cîran
û heval û bi gelê xwe ra heta bi tevê
insanara em ji çembera ko Rabbê me ji me
re tayîn kirî dernekevin û sînore Wî derbas
nekin ko ew jî çember û sînore Îslamêne.

Di vê ma’nê de mu’amela meyî bi
misilmanên Kurd re û ên wekîdî re bi
cemiyet û civat û komel û weqfên der û
dorên me re (ên ko xessasiyetên wani
Îslamî hene û ên ko tûnene) bi tevgerî û lebatên
Îslamî û ne Îslamî re inşallah wê di daîra Îslamêde be.

Xwedîyê kîja dîn û cîhannêrîn û fikrê bin ferq
nake, muddê ko neyartî û dijminantîyê bi Îslam û
Misilmana re nekin, heqaret û îstîhzaa bi wan nekin,
em dikarin bi wanre rûnin û xeberdin. Belê cihê ko
em lê rûnin divê heram tede neyê kirin û gawa rûbirû
hate xeberdan rezdarî hebe.

Hinekên ko demekî guneh jî ji wan çêbubin –heta
gunehên mezin jî ji wan çêbubin û neyartî bi Îslamê
û Misilmanare kiribin jî– lê belê vêga nedi ‘eynî tuşt û
kîrnên xwe debin, disa em karin bi wan re rûnin û
xeber bidin. Bi qedêr îmkanên xwe em karin ji
xwestinên wanî insanî re ko ne guneh û ne muxalifên
Îslamêbin re bibin alîkar.

Mesuliyet û mukellefiyeta meya Îslamî jime divê
em pê bijîn, pê ‘emel bikin û divê em wê bigîhînin
insana. Ji Misilmanekîre nav, kar, meqam û reya
insanekî çî dibe ferq nake di vê hîdayetê jêre bixwaze
û ji bonî vê yekê gîret bike û çî jê bê bike. Lê divê pêşî
ji mala xwe û zarokên xwe û xwedîyê xwe û qewme
xwe dest pêbike û ji bonî hîdayeta wan ji wanre bibê
alîkar. Ev raste û Îslamî ye. Şêrîne dilê me Hz.



Muhammed Sallallahu aleyhi we sellem jî wilo kirî ye.
Jibonî xwedîyê xweyî nêz û tevê xwedîyê xwe di’a kiri
ye. Ji Xweda hîdayeta wan xwestî ye. Li ser wan
xebitîye ko bîkevîne rîya heq...

Inşallah emê bi bîranîna vê mesuliyetê, pêşî xwe
gihênine malbata xwe piştê xwedî û cîranê xwe û
bivan hemuyanre jî emê xwe gihênine tevê birayê
xweyî Misilmanê Kurd. Emê vî tuştî pêşî têxine jîyana
xwe û pê ‘emel bikin. Bi xêr divî karê xwede nalezênin
û bi sabîrbîn. Xelata karê xwe jî ji Xweda ê xwe
bixwazin.

We dispêrime Xweda ê Teâlâ...

• Zariyat: 56

HEYAT U MIRINA ME JIBO XWEDA YE

Temamé wesfé hemd u pesindaniyé ji Rebbé alemé ra be. Selat u selam liser qenciré insana, mestiré temamá Péğembera, liser Muhammed u liser ehlé mala wi ya pak u paqj be.

Sebebé xulqiyeta insan 'evditiya xweda ye. Kâinat bî temami jibo xîzmeta vé ğayé u armancé hatiye xulq kîrîn. Gera tav, hiv, dñnya u sîterka tev jibo véye. Buyeré dî kainatêde tev jibo vé ber xwedan dîkîn dî şuğîlîn u kéferat dîkîn. Tav jibo vé der dikeve, ronahi u şewq dîde. Hiv jibo vé li ezman weke çîrayé taritiyame ronayi dîke. Baran jibo vé liser erdé dîbare, erda hîşk sağ dîke. Giya, dar, temamá enwa'é féki u şînayî ji bo vé çé dîbîn u şîndîbîn. U weke vé hé, bé jimar buyeréndî tev xîzmetkaré vé meqsed u armanca pîrozîn. Liber çav ev buyer çîğas hêsan u besitbîn ji dema bî çavé hikmeté, bî berça'vka Qur'an u sünneté em lé meyzénîn emé bîbînîn go ev buyer ji dîtinameyi ber ça'v cîhéye, cudaye.

Dî Qur'an a Kerim suré Saf dî ayeta 'ewîl de, xwedayé Rehman u Rehîm wuha fermankîriye: "**Mayé dî 'erdu ezman de tev tesbiha wi xwedayi dîkîn**" Jî vé ayeté té fémé go her çîşt, çî bî can u çî ji bécan her çîşt xweda zîkîr dîke. Her keseki bî zîmané xwe yezdané xwe zîkîr dîke. Cîhé buna zîmané wa nabe sebebé bî hevketîn u jî hevketîna wan. Meqsedê wan zîmana teva zîkîrkîrîna xwedaye. Dî encama wédajî héviya razîbuna xweda dîkîn. Her **yek bî zîmané** xwe zîkîr dîke. Dema wun guh didîne dengé heywanata, her yeki bî awaki deng derdîxe. Weke bül**l**bil dengé hîneka zahf xweşe. Hînek deng jî hene merîv jî bihistîna wan 'acîze. Lé belé ew jî hev ne acîzîn. Kes bî keseki ra pev naçe, mîqersiyé nake. Her weki tev dî zanîn go weke bedenawan zîmané wan jî jî bo pék anîna wé meqsedê mezîn go 'evditiya xwedaye, hatiye dayîn jîwan ra. Ew zîman bîwé meqsedé bîqedre. Eger ew zîman dîvé meqsedé da were bîkaranîn, bî qîmete. Yan na, ew jî perçek goşte. Her tîşt bî meqsedê xwe bî qîmet dîbe. Çewa desmala seré xwîşkê Müslüman jî kînc hatiye çékîrîn lé belé jîber ku jî wé meqsed, bî cî anîna emré xweda ye, ew desmal sembola ayeta

xweda

ye bî qîmete.

Heta ew kînc seré xwîşkê Müslüman ne nuxu-mîne bî qîmet nabe. Her wuha ew zîmané go xweda jî zîkîr neke ew zîman jî tî qedr u qîmeté wi tûneye.

Dî navbera insanade jî gelek zîman hene. Lé ew ne weke heywanane. Ew zîmané xwe wasîta bî serketîné dîzanîn. Lî gor insana, kî zanîbe zîmané wa xeber bîde, ew insan jî nijadeke bîjarteye. İnsané go nîzanîbîne wî zîmanî jî ew kémtré insanane. Çewa gu Cîhu'ya iro bî xwe jî go insanén jî ğeynî xwe jî xwe bîçuktr dîbî-nî u yégo jîwanbîn jî jî temamá insanîyeté mestîr dîbî-nî. Yé go nîzanîbe, wé béje qey insan tev ne jî Âdem u Hewwa ne. Heryek jî nijadé insana jî malbatne cîhé welîdîne. Jibo vé fîrq u meyli dînavbera insana de heye. Lé belé bî ittîfaqa temamá dina(ola) insan jî Adem u Hewwa ne. Xweda 'ezze we celle dî derheqé cîhébuna nijad u zîmana da gotîye: "**Ey insana, bîrasti me we jî mé u néreki çékîr u jibo wun hevdu nasbîkîn me we jî millet u 'eşîra çékîr. Bé goman lî cem xweda yé en bîlîndé we yégo teqwa wî en bîpêşdeye ewe. Bé goman xweda yé zana u xeberawî jî her tîştî heye.**" (**Hucurat 13**) Jî ayeté hate fa'mé go zîman ne navgîna serkeftînéye. Eger ew zîman bîbe navgîn jibo bîlîndîya teqwa me bî gîmete. Yan na zîman jibo go zîmane ne bî qîmete. Weke vé dî kainaté da her tîşt, eger xîzmeta da'wa xweda bîkîn bî qîmetîn. Lazîme em her tîşté xwe dî oğîra da'wa xweda de bîkar bîkîn, bî şuğulînîn. Da go bî qîmet bîbîn. Eger em wuha bîkîn, emé bîlîndî ehsene-t teqwîm é bîbîn. Eger eme nekin emé bî gîndîrne esfelu-s safîlîn é xweda bîparéze. Her weki xweda 'ezze we celle dî Qur'an a Kerim de gotîye go kesé go jî mezhebé imamé Şafî'î be go ew jî dî seré her liméja xweda dî xwîne go xweda gotîye: "**Béje: liméja min, 'evditiya min, heyat u mirina min jibo wi xwedayé go Rebbé 'alemé ye**" (En'am, 162) Dîseré ayeté da xweda dîbéje béjîn. Ha ya rebbi va em jî dîbéjîn, her tîşté me, mal u cané me, ewlad u malbat u ezbaté me heyat u mirîna me jibo te feda be ya Reb.

Heta jîmareka dîn em bîhev-rebîn bîmînîn dî xweşiyé da. Emanetî xweda bîn, héviya dî'a dîkîn jî we.



SURETÊ FATÎHÊ

Suretê Fatihê heft ayetî li Mekke daketi ye.

Ez hifza xwe bi xweda dikim ji wi şeytanê qewirandi.

- 1- *Bî navê xweda yê Reḥman u Reḥim*
- 2- *Temamê ḥemd u pesîndana ji xweda re ne; ewê ku rebbê tamamê ‘alema ye.*
- 3- *Ewê ku Reḥman u Reḥim e.*
- 4- *Hükümdarê roja cezayê ye.*
- 5- *Em ji te tenê re ‘ibadetê dikin u em her ji te alikariyê dixwazin.*
- 6- *Riya rast bi bermexe.*
- 7- *Riya wan ê te ni’met li wan kirî ye, ne wanê ḡezeb li wan hatiye kirin (go yahudi ne) u wanê ketîne riya şaş (go file ne) Âmin...*

Evina Péxember
M. Xalid Bağdu

EM EVÎNDARÊ TE U EVÎNDARÊ SUNNETA TE NE

*Ezdemi subhe ezel ta beqiyami areset
Berser u payé dilarayé Muḥemmed salâwat.
Şikenedtixe zebanem hemedem şaxe nebat.
Badiber kameti renayi Muḥemmed salâwat.
Fardu aynestmi bekuyem ta wekte memat
Dembedem berkuli ruxsare Muḥemmed salâwat*

Emé lı ser çêbun u wiladeta serweré cihané bınvisin. Roja wiladeta resulullah (s.a.w) roja xelasiya bın-desta ji desté kedxwara, roja azadiya 'evdé békes jıdesté koledara, roja serbestiya feqiré qels ji desté mal-dara, roja rızgariya gella u kéfxweşiya insaniyeté ye.

Piroz u sed mubarek be ev roj, piroz u sed mubarek be ev xelasi, piroz u sed mubarek be ev azadi, piroz u sed mubarek be ev serbesti u rızgari, piroz u sed mubarek be ev tav u heyva çarda... Piroz u sed mubarek be ev ronayi u nur, piroz u sed mubarek be ev evin u yar, piroz u sed mubarek be ev rézan u serok u pêşivan lı gellé cihane ḥemi...

Ey keti u bındesté cihané! Thava destegir u xelaskiroxé we daye ruyé zemin. Rabin xwe bıdın ber vé thavé. Kéf u şahiya xwe bı selat u selama lı asimané cihané neqışkın. U lıser ḥesabé temamá zirūḥ u cema-data bı tercümaniyeki ji wan re béjin: **"Tı bixér hati! Bı ser çav u sera re hati. Ey muxetabé wema erselnake illa rehmetellil'alemin."**

Rebbé 'alemé çewa ku dı kalamé xwe de ji beyan kırıye: **"Este'izu billah, zeherel fesadu filbeḥri welber-ri bima kesebet eydinnas"** 1450 sal beré ji disa cihan weka iro dı taritiyé debu. Dı beḥr u bejayide fesadi u gellaci zéde bubu, bı desté zalım u taḡuta. İnsaniyet dıhate xenıqandın, fitne u fesadi, qetl u qütül, ḥerb u işğal erd u 'esmané cihané tije kırıbu. Cihan u ehle xwe wé demé jıher demé zaftır u pırtır muḥtacé bı bal des-tegir u pêşivaneki bun.

Meha rebı'ulewwel é, sibeha dıwazda, berdesté

*Piré 'eşqé muşehfa 'eşqé pır xweşık ders da cihan
Pır 'Eli u Qeylanı u Nursı u Ḥuseyna da deré
Mesleka pır xweş meşandın heryekı bu saqıyek
Şerbeta 'eşqé didın ji ḥemde wı yé kewseré*



sıbé evi destegir u rézani ji mala 'Ebdulmüttellıb desté xwe diréji keti u bındesta kır, bı thav u nura xwe cihané ḥeméz kır, da ber dilé xwe, azadi u aşiti ani, dı imané de temamá insana kire bira ji hevdure.

Dı peywire warisé wi, telebe u feqiyé mekteb u medresa wi, doza wi meşandın... Riya wi bı insana dane zanin, bune da'wetvan u mubelliğé da'wa wiya piroz. Bı nobet yek lı pey yeki ev leşkeré ronayiyé lı hember çahşé şev u tharitiyé berxwedan u tekoşın dan. Ew ava ḥeyaté ku jıyana dūnya u axreté pé ye bı bıhaa jıyana xwe u xwina xwe bı insana dane vexwarın hetta ana.

Jı lewma é ku ji vé şerbeté vexwarine bı mılyona lı



her aliyé cihané bune evindar u leşkeré Péxember u ji boy da'w u doza wi, ji boy bilindkırın u hıldana ala wi, lı ber tağut, zalım u leşkeré tharitiyê seri hıldane, şehadet buye evina dilé wan.

Razibuna Xwedé lébe u Xweda wi u hevalé wiyé mescun xelas bıke, şa'iré 'esra bisti, ewladresul, dı şı'ra xwe de véyané çıkas xweş aniyê zıman:

**Piré 'eşqé mushêfa 'eşqé pır xweşık ders da cihan
Pır 'Eli u Geylani u Nursi u Huseyna da deré
Mesleka pır xweş meşandin heryeki bu saqiyek
Şerbeta 'eşqe didın ji hewde wi yé kewseré**

Me şerbeta 'eşqé ji desté 'Eli u Geylaniya vexwariye. Em liber çoké Nursi u Şéx Se'id u Huseyna mezin bune, me icaza şehadeté ji medresa Yusufi sitendiye. Ji lewma me seri rakiriye liber tharitiyê. Ji lewma em seri nathewinin ji koledar u maldara re. Ji lewma em doza heqqé mezlum u bindesta dıkin lı kedxwara. Ji loma bune Ebu Basir lı gund u bajara. Ji loma bune şér u 'egidé Hizbullahi lı Libnané, mücahid u betlé Hemasé lı Filistiné, bı mérxasi me navdaye lı Çeçenya, Irak u Efganistané. Bune ümid u hévi lı temamá cihané.

Piré 'eşqé dı hediseka xwe de wuha keremkiriye: **"La yu'minu ehedukum, hetta ekune ehebbe ileyhi min weledihi, we walidihi, wennasi ecme'in."**

Ey Piré 'eşqé!.. Dé u bavé xwe, zoruk u kılfe'té xwe, mal u serweta xwe dıki'ne qurban u gori ji te re. Ev ne dılxweşiyeka bıdeve. Qeyd u zincir, heps u zindan, eziyet u işkenca, şehid u şehadet şahidi rastiya mene.

Pışti çuna te bı sed sala çavé ümmeta te lı riya te maye. Lı héviya roja ku disa tı bı ser cihané de vedi u cihané heméz ki bı germayiya xwe. Em ji hersal lı gırıké 'Eqebé cihané desté bey'eté ma'nen diréji te dıkin, 'ehd u bext didın ku emé da'w u doza te bimeşinin, u çawa ku em mal u cané xwe zaruk u kılfe'té xwe ji ériş u taluka dı parézın ku emé wé ji muhêfeze bıkin. Emé lı sunneta te xweyi derkevın u de'wa te ji me re miras hiştiye biparézın...

Lı bajaré Medina cihané, millet Kurd u Tırk, 'Ereb u Faris, bitevi zarok u pirek u zılama, xort u kala, zavayé dest bı hınne, buké ser bı xéli hersal xwe berdidine meydana dı desté me de gül u kulilk u sosın hene. Me nezera xwe derxistiye serbané 'eqlé xwe, evina me dı qesra dilé me de xwe xemilandiye lı héviya bang u delaleki ye ku mizginiya derketina te yi ji pışt gırıké Weda'é bıde. U em bı temami bazdın, bı reqqısın, werın péşiya te, helbesta tele'el bedru bıxwinin béhêmd!.. Bıbine gori u qurbana hatına te. U sağıkırina sunneta te...

Eger tı weri em 'ehd didın bı tere ku tı behrê nişi me di emé xwe bavijéné. Em soz didın ku emé ji gırıké tirevana yé ku sunneta te mihêfeze dıkin, héla nebin u nebine sebebé şehadeta dırané teyi mübarek. Lewra 'Eliya u Xalida leşkeré xwe kom kırina, ala reş hıldane, şur ji kalan kışandine Ebu Basira nefes lı nyaré te çıkan-dine. Hawirdoré Mekkeha cihané girtine, fermané **"Nesrun minellahi we fethun qerib"** merşa leşkeré wane. Were bıkeve péşiya leşkeré xwe, careke di fetha Mekkeha cihané bıke. Bira 'erd u esmané Mekkeha cihané carki di biné lingé te yi mübarek maç bıke...

HEMD JI TE RE BE

Hemd u şükr u pesından bî şeklek kamil ji Xalîqé âlemér xwedi u xalîqé 'erd u ezman, ji Xwedé Te'ala celle cellaluhu re bî. Selat u selam lî ser ser bilindé âlemé, lî ser tamamkırna nebi u peyxember u resulé tarixé, lî ser imamé qasída şandinye jîba Xweda, Mūhemmed Mustafa bî. Him selam u reh̄met u bereketa Xwedayén 'Eziz u Reh̄man u Reh̄im lî ser tamamé ümmeté bî.

Geli ummeta efdelê mexluqat! Ummeta Mūhemmed! Ewladé islamé yi vé heyamé! Bawerbuna me yi bî Yezdané âlemé u kitéba go jimer hatiye şandin Qur'an-a Kerim ger diher demé u liher terefé gerduné jimer meşale u ronayi bî.

Jiyan u sunneta Qasidé Xweda u kitéba bî şahnaz ji jiyana her ferdé mısıلمان u ferdé cema'eta islamé re jiberi nihan hezar u pênset sali u heta roja axreté réber u rézane. Ji geyri van tî daraz u şer' u qanuné beşeri u zori u zordesti u ağa u milletan nîkaré lî ser 'erda islamé ci bîsténe u ger nesténe. Belé iro bîdilek şewat bî huznek dujwar heq ki go em bî zıman binin heyé, dil u qelbe me birindare; lewra iro darazé Qur'an-é dî nav nîga de yé u delalé ewladé ummeta islamé liher deveré gerduné dibinê heps u girtixana dé dibin zulma daraz u saziye keriki dinalin.

Evan ewlad u kezeb u cigeré serhildana binavé Xweda, jibon şer' u doza kelima yekbuna Xweda, bî can u mal u bî tevi imkân u firsendé xwe, xwe ji islamér kirne mal u xwe divé riya muqeddes dî qurban u fida dane.

İro ko em lî cihané bimeyzénin, lî Filistin'é, lî Cezayir'é, lî Keşmir'é, lî Efganistan'é, lî Çeçenistan'é, lî Filipin'é, lî Lübnan'é, lî Tacikistan'é, lî Pakistan'é, lî Endonezya, lî Somali, lî Azerbeycan, lî Dağıstan'é, lî Suri, lî Iraq'é, lî Mısré u lî herderi cihané mısıلمان bî hêsek mezin, jibona azadiya İslam u Qur'an-é u azadiya xelqé mezlum hem belengaz, bî jin u kal u xworté xwe xebatdarin. Carnan dî peşikadi, dibinê zindanadi, lî bajar u gunda, lî mekteb u sũka dî, lî sikak u mehella u hem bî şahnazik delal mizgeft u mescida u heta seré çiya bî her imkanetê xwe doza xwe pêş de dibin u naseknin. Carnan ji soz u 'ehda ko bî Xwedayé xwer dane bî citinin u şerbeta şahadeté vedixwin. Hem doza ko dané bî xwina xwe vé tescildikin u bî xwina xwe jivé de'wé re dibin

şahid, "Xweda wé mertéba mezin bî nasibé me ji ké u me ji xér u bereketa şehida meh̄rum neke inşaal-lah."

Mızginiya Rebbé 'âlem jivan mijuldar u xebatkaré İslamére ye. Pişti van teva gerek xworté mısıلمان u şer u cengawer diher hawayi de, lî her deri, dî her demi, bî kéf u xweşi ji cihada muqeddesi nemine u bî zıman u jiyana xwe ger bî 'ilm u xwendin u çek xwe bijdine.

Ger em zanıbin go de'wa azadiya İslam a piroz u Qur'an-é, de'wa ko pır gran u lewra ev karé nebi u resula ye. Jiber wilo lihember zordest u zalım u kafir u temame rejim u saziyé keriki, lî hember neyarén heqqiyé, artéşa tuğyan u tağut u put u senema her wext u an ger em hazırbın hem dil azad u şiyarbin.

İyro gelek birayé me yi delal jinav me bal Yezdané xwe bîbin rewın u şerbeta şahadeté vedixwin. Eger birayén me réberén de'wa u seroké me ji bin, ji disa ger em sist nebin u neseknin lewra pişti rézana seré xwe da maqey paş ketna dî de'wa Xweda ji ewladé islamé re ne 'eyb u şermé, bes şiyarbin bî giyret bin ey geli xelqe keti u belengaz!

De' wa darazé Xweda, baré tevi ümmeté ye, neyaré we diné bî çî şekl u bî çî rengibın gäye u meqseda wan çıbı disa ji dujmin u neyare tevi ümmeté ne, hemd ji Xweda ra ki dujminé islamé bî em ji heta em sağ bın emé neyaré wan bın, bé hed u bé hesab hemd ji ter ya Rebb! Ko divé 'esra reş u tari ko te ev baweri, dayé me.

Kezéba mın şewitiye, dilémın dagirtiye ji kûl u derda, belé em zanın ko Xweda yé Te'ala lî pišta mu'mina yé, bé şek her tışté ko dibe bî teqdıra Xweda ye.

Hemd ji ter ya Rebb, em bawerın ko é rojek bé, é kafir nuxumbext bîbin hım İslam bî nesra te é serfêraz bibe, pişti çen sal yan ji pişti hezar şehid u hezar dagirtina girtixana ji bî.

Kemalti u bé kusuri layıqi Rebbé alemé ye, ez gërib u 'acız u feqırım, té ümid kırım ev xızmet u ev xebat bibe vesila qencyé, Rebbé âlem bî niyazi ji me qebl bıki.


Sparti Xweda bın, Xweda yar u alikaryé me teva be, we axiru de'wana enilhemdulillahi rebbil âlemin.

MERSELA FÎLA

Berya buyina Resulé
xuda dewleta
Hebeşistan érişî
Yemen é diki u wé
feth diki.
Qumandaré
Hebeşiya
Ebrehe b.
Sabbal el
Eşrem wali yé
Yemené dukujî
u ew dikevi şuna
wi. Çend heyv
derbas dibe Ebrehe
azadiya xwe ji ilan
dike. Xelqé Yemen é
fileh bun her sal diçun hecé.

Ebrehe çağa ku dibine xelq jiboy
hecé haziriya çuna Hicaz é dîkin féhm dike
ku qudsiyet a Ka'bé insana dîkşîni Mekké u bi vé ew
kiryî ciyê cîvin u merkeza insana. Çav nebariyek mezin
wi dîgrî, u difikire.

Bî armanca qudsiyet u héjayî ya Ka'bé bi bal
Yemené vi bişemîtîni u bi vi awayî di babété dini aborî,
siyasi u ticarî di dewleta Yemené jiboy cîvîna insana
bîke merkez, li paytexté wé Sen'aa dérek modern u bi
xemlu neqş ava diki. Jiboy piştîriyêk berfreh qezenc
bîke nameyeki jî Qralé Bizansér dişîne u alikariyê jê
duxwaze. Qral xwesteka Ebrehe di cih de dibine.
Malzemé lazîm u qesrebendeki zana jê re dişîne.
Ebrehe li Sen'ayé dérek pîr modern bi navé Quleys ava
dike. Jiboy balkişandîna insana bi zér u ziv dineqîşîni u
bi misk u enberé didî bihn kîrîn. Piştî di Erebistanéd
gelek pesnker pesné vé déré didîn. Bé guman armanca
Ebrehe qudsiyet a Ka'bé betal bîki u bi navé din
Yemené bîki ciyê cîvin u ticareté. Bes déra wi di nava
insanad rêgbet nedit u qudsiyeta Ka'be dewam kîr. Jî
xwe koma 'Ereba bi çêbuna vé déra li hember Ka'be
hatîbu ava kîrîn pîr acîz dîbîn. Jî ber vé rojeké kerwane-
ki 'Ereba di Sen'ar derbas dîbîn, jî nava wan zîlameki bi
navé Ken'an di tarîtiya şevédi diçe hundîr déra Ebrehe
pis dike. Sibehé çağa Ebrehe déra xwe vedike pîr acîz



dibe; dipîrsî çağa ku jê ra té
gotîn evaré kerwaneki
'Ereba di Sen'a rî
buhurîn heyî tunî
wan wuha kîrye
dîqaherî u dibé:
"bî sund bî heta
ku az Ka'ba
'Ereba xîrane-
kim idi ez
naruném."

Pîştî Ebrehe
ordiyek xurtî jî 60
hezar nefer dîde ser-
hev u bi sîlehîni modern
jî Yemené bi ré dikevin
jiboy xîrabuna Ka'bé beré xwe
dîdîne Mekké. Jîbo herb u siyarbuné

di nava ordiyé di 10 fil jî hebun u fileki bi navé
Mamut peşivandîya ordiyé dîkîr. Li Cîzîra 'Erebîstan
ordiyék bi héz tunebu jî ber vi qasî ordiya zulmé bé tîrs
u xof u bi rîhîti dimeşîya. Dîgel vi gasî hinek qebîlé
'Erebayî bi navé Zenefer, keza Şerhan u Nahîs dertén
pêşya ordiya Ebrehe u şer dîkîn. Belé ordiya bi héz,
hîjmar u techizaté xwe yi zéde zora wan dîbîn.
Qîsmeki dukujîni u qîsmeki hêsîr dîgrîni u bé tîrs rîya
xwe dewam dîkîn. Çaxa dîghejîni Taîfé qebîla Seqîyîfiya
diçûn ba Ebrehe u jêra dibén: "Ey hükümdar! Heger hun
tékîli pute mé Lat nebin emé jî hevaltiya we bîkîn u çol
bîr we bîghînin Mekké." Ebrehe xwesteka wan qebul
diki. Li ser vé xelqé taîfé rébereki xweyi bi navé Ebu
Regel teslimî Ebrehe diki. Ebu Regel ordiya zulmé bi
rojava rî çolbîr dîphîni newalek nézî Mekkeyî bi navé
Muxessem. Ordi şeva xwe li vé newalé derbas diki.
Erbehe bi armanca halé Mekké u wezyeta xelqé féhm
bîki qolek leşker jîbo seh kîrîné dişîni dora bajér.
Leşkeré Ebrehe wezyeta bajér qontrol dîkîn u malé
xelqé yi dikevi zevta wan talan dîkîn. 100 devé A.
Muttalîb jî li çolé dîgrîni u dibîn. Abdulmuttalîb jîbo
berdana deva diçî ba Ebrehe xwe didî naskîrîn u piştî rî
reca berdana deva jê dike. Ebrehe hurmeta meziné
Mekké Abdulmuttalîb dîgrîni u je ra wuha dîbeji: "Ey

Abdumuttalib! Min zen dikir ku tu jibo reca nexera kirina Ka'be hatiy; bes Ka'be ne di bala te deye. Tu ketiy heyra devé xwe" Lı ser van gotiné Ebrehe Abdumuttalib jé ra wuha dibéji: *"Ey hükümdar! Ez rebbé deva me u jiboy berdana wan hatımı ba te. Rebbé Ka'be ji xuda yı, heger karıbi wé beyta xwe ji şeré ordiya te mehféze bıki u na nıkarıbe, ji xwe huné wé xıra bıkin u vegeřın welaté xwe"* Pıřtı rı Ebrehe devé Abdumuttalib didyé u wi bı ré dike.

Xelqé Mekké çağa dıbinin ordiya zulmé hatiyı xwe sıpartiyı Mekke ji tırsa mal u cané xwe terka xwedi derketına lı Ka'bé dıkin u tevlı zaré xwe şeva xwe lı çol u çıya derbas dıkin.

Ordiya zulmé bu hewlé sıbérı radıbın hazıriyé xwe yi dawı dıkin u bı ré dıkevın Filé bı navé Mamudi péřıvantiya ordiyé dikır nameşı u mexel té. Bı qursé hesın léđıxın disa namaşı. Çağa beré wi didın surı u Yemené fil dıbezı, ku beré wi didın Mekké quđumé wi nařuxulu. Lı ser wi awayı ordı bé fil bı ser Ka'bé dı dimeşı.

Dıgheji newaleki bı nave Muheşeb (Ev newal dı nabéna Mina u Muzdelifé de bu) Xudayé Teala teyrikni dı mazun buna heçhecikad dıřını ser wan. Ev teyriké ji héla behra reş dhatın heta wé rojé lı tu deveré 'Erebistan é nehatıbun dıtın. Bı her teyrekır sé zuxuré ji heba nıské bıcuktır u ji noké mastır hebu yı lı gori riwayeta ev zuxuré cehneméyi bırařtı bun. Her teyrekı du zucur dı nava nařpé xwe de u yek ji dı nava nıkilé xwe de hıldıgırtın.

Ev teyrik her zuxureki ji jor da bı ser neferki Ebrehe de berdıdan. Ev zuxuré ku weke buruské lı neferé zulmé diketın laşe wan dıhelıřand, çarpäre dıbu, u ew dı cih da dukuřtıın. Bı vi awayı řařmıbun, qurf u tıřsek mezın diket nava ordiya Ebrehe u rehé wani méranıyé ji bınid qut dıbu. Her çıqas péřıvané zordesta emré vegeřé didı ordiya xwe ji; bes teyrik péřıya wan bernadıın. U zuxura bı ser Ebrehe u neferé wi de berdıdan. Heta ku wé ordiya debdebe bı çareki ji qam dıxın. Bé guman bobelatek mezın u tıřsehéz ketıbu nava ordiya zülmé. Serzemin bı tevé frehbuna xwe lı wan teng bubu, nıfaa revé nema-bu, ré u réç tev lı wan hatıbun gırtın. Bı teřbihé léxıřtına buruské, laşe nefera perçe pari dıbun, gořtı u hesti dıřızın, xuna wan weke avé dıherki. Sénga péřıvané zordesta bıbu du qet u bı řıkleki feci can dabu. Péřıvané zordesta u ordiya xwe bı çareki ji hev belabun u bı heqırtı mırtın. Hew filé bı navé Mamudi ku hevaltıya zordesta nekırıbu bı sılametı fılıtıbu.

Xelqé Mekkéyi lı seré çıyan lı vé mucıza mezın temaşe dikırın; heyret, toqın, řařmıbun u kéf u řahi bı hevra dıjıyının.

Sınoré heremé tıji laşe nefera bıbu. Beraté wan béhna geni bela dikır. Lı bajaré Mekké hınek nexweřıyé bı navé soruk u mıkotok xuya bu. Gyaké taal u pırceleb řınbu. Xudayé Te'ala jibo beyta xwe bı çaréki ji qréja zalım u zordesta paqıj bıke barané dıbarını lehiyek mezın radıbi u ev lehi bermayé zalıma didı berxwe dı bařra reş de werdıke.

Xudayé Te'ala mersela Ebrehe u neferé wi dı Qur'an'a mubin da wuha beyan dikı:

Bı navé xudayé Rehman u Reħım

1- Ma te nedıt! Rebbé te çıkır ji xwedýé fıla

2- Ma wi, ħılé wan vala dernexist

3- Wi ref bı ref teyr řand ser wan

4- Jı axa bırařtı zuğur davéıtın wan

5- U ew kırtın weki wé gıhaka ku ji ber xwaruna heywana mayı.

(Sureté Fil)

Resulé xuda dı hedıseke xwe dı wuha dibéji; *"Muzdelife ciyé seknéyi bes newala Muasıb ciyé bezdané yı"*

Jı xwe ji eshabé péxember Cabır b. Ebdullah dibéje: *"Resulé xuda çağa ku ji Muzdelife dıçu Mina dı newala Muasıb dı bı bazdan derbas dıbu"*

İmamé Newewı dibéj: *"Resulé xuda bı bazdan té da derbas bıyı. Dıvé ku hecacıyé dıçın hecé ji dı vé newalé dı bı bazdan derbasbın."*

Xwedýé beyté, beyta xwe jiboy hikmetek mezın ji řerré zalıma mehféze kırtıbu. Çunki péçoka tewhidé bajaré Mekké u merkeza wi bajarı Beytullah bu. Hem zarokeki newelıdı dı zıkké dıya xwe dı lı bajaré Mekké bu. Dé u bavé vi zarokı dı nava xelqé Mekké dabun. Dıvé ku bıyına vi zarokı bı selametıba ji ber vé yeké bı sebep vi zarokı bı teřbihé qewmé Luti ku kevr bı ser wan da barıya bu ordiya Ebrehe ji helak kırtıbu.

Muheqeq tevé quwetén 'erd u asimana her dı dest xuda de yı. Quwetek ku tevé quweta jéra ser u bernı. Quweta xuda... Quweté jé u bı řında heni tév maxluqén ku wi ew çékırını. Bı domahıya tarıxér zordest zen dıkin ku xwedýé quwet u xurtayé her ewın. Bes pır béhiřın, nezanın, ehmeqın, bodelını, nızanın ku zaman avıřé çıyı. Nafıkırın... Jı tarıxa meħukırına zulum-kara ibret nagrın ku rojeki wé héz u quweta wan tarumar bıbı u texté wani zulme ji bındı wergerı. Jı ordiyé xuda yı veřartı bé xeberın. Jı xenıqandına Fir'evni dı behré da ji kuřtına Nemrudı bı kelméřa her çı hikmetı dersa nagrın. Nızanın ku xuda gelek zalım u taxuté bı mal, mülk, quwwet, iqtıdar u pıranıyé meğrur dıbun ew sernuxum kırtını.



BI MUNASEBETA

MEWLUD A MUHEMMED (s.'e.w)



“Ê ku jiboy li ser temamê ré u dina bilind bibe pexemberê xwe bi rasti u hidayet u dinê heq şandiye Ellah e. Şahîd Ellah e u ew bes e. Muḥemmed qasîd é Ellah e... heta dawiyê” (Sureté Feth, 28,29)

Risîpiyeki ji Yahudiya di meclisa ku mezinên Mekke té de runiştine, dîpirse: “Gelo îşev zarok ji kesi re çêbune? Zarokê ki ji we hatiye dunyayê?” mezinên Mekke gohtin: “Em nizanin.” Mirovê Cihu goht: “Baş li min guhdari bikin ey civaka Qureyşiya! Îşev pexemberê dawin Ehmed hate dinê.” Kesên li wê civatê, ketin heyretê, şaş man u belav bun çune malê xwe. Dî wê şevê de laweki ‘Ebdullahê kurê ‘Ebdulmuttalîb hate dinê. Navê wi MUHEMMED danin. U ev xeber li temamê Mekke belav bu. (*İbn-i Sad, Tabakat 1.162-163*)

Duwazdehê Rebi’ulewwelê bu. Kâinat bi çêbun u ji dayikbuna Muḥemmed kéfxweş bu. Lewra ew nur u roja kainatê bu. (a.g.e, 1.102)

Dî mewluda Muḥemmed de senemên di Ka’bê, bi ser seri de ketin xwarê. Çardeh situnê qesra Kîsrayê Îranê şikestin, gola sawayê çikiya, agirê agirperestayi ku hezar sali péketibu thefiya... Van buyer u hedisa dîda nişandan ku ewê Muḥemmed hêmu tiştên batil u şaş hilîne, li çiyê wan dinê xweda Îslamê deyne... (*Mektubat, ondokuzuncu mektup*)

KÎ HATE DINYAYÊ?

Hêbibê Xweda Muḥemmed Mustafa aleyhisselatu vessalam... Üstad Bediüzzeman dibêje (r.a) : “Belê ji Xalîq u Sen’etkarê vé kainata xweşik, xemilandî u lihevani re, çawa tirêj u rohnî ji thavê re lazîm be Resul u pexember lazîm e. Lewra çawa bê rohnî u tirêj thav nabe,

Uluhiyeta xweda yi ku temamê ‘alem di bin quwwet u qudreta wi dene u lazîm e ita’et u ‘ibadeta wi bê kîrîn, bê şandina pexember u qasida nabe.” (*onuncu söz, ikinci işaret*) Aha Muḥemmed é ku di vé şeva mubarek de wêldiye miroveki whaye ku; kemal u cemala Ellah teala yi bê hêd u bê hisab nişan dide, te’rif dike, ji sen’etê xweda re dibê dellal, ji selt-heneta xweda re dibê meb’us, ji nav u esmayên xweda re dibê ‘eynik, (bi evditiya xwe, xwe-b Ellah dide hiskirin, bi qasidtiya xwe Ellah bi mexluqata dide hiskirin.)

Muḥemmed keseki wuhaye ku; van hersê pîrs u sualê bersiv u ciwaba wan insana meşğul dike dide: “Tu ji ki derê hatiye? Té heri kur? Tu kiye?” ev sual bi wi zatê mubarek ciwaba xwe dibinin. (*onuncu söz*)

Ew (s.a.v), heger kâinat insanek be ruhê wi insani, heger qelemek buya murekkeba wê qelemê, heger qesrak buya qendila wê qesrê ye. Bi hürmeta wi her tişt hatiye wucudê u bi hürmeta wi hé hene. Bedi’üzzeman dibêje: “Heger ji kainatê nura pexemberiya Muḥemmed derkeve, ewê kainat bîmre. Heger Qur’an derkeve-here, ewê kâinat din bibe, heşê xwe hunda bike.” (*onuncu sözün zeyli*)

Muḥemmed (s.a.v) miroveki wiha-ye ku wexta ji zarokeki bêzîman u lal re dibê “Ez kime?” zarok té zîman u dibê: “Ente Resulullah” yani “Tu qasidê Ellah e” Hêzreti ‘İsa (a.s) jiboy wi gohtiye: “Reisê ‘alemê té” bi vé peyvê mîzgîniya wi daye, Incil di behsa wi de dibêje “Xwedîyê şur”

Hukumdaré Hebeşiya Necaşi gohtiye: **“Xwezi dı bedel vé hukumdariyé de ez xızmetkaré wi ba ma.”**, ‘egid u qehremané mezin Hezreti İmamé ‘Eli(r.a) gohtiye: **“wexta herb germ dibu me xwe disparte Resulullah”**, Şa’iré meşhur Cahız dibé: **“Neyaré wi bı fikrén xwe nıkarıbnú, dest avétine şur u zoré”**.

Dı her dewré de bı Feyza vé roja hidayet u heqiyé kesén weke Ebu Hanife, İmam-é Şafii, Bayezid-é Bistami, Şah-é Geylani, Şah-é Neqşebend, İmam-é Ğezali, İmam-é Rebbani derketine...

ELLAH (c.c) PÊ RA (s.a.v) PEYIVİ

Madem yé çekiriye dizane elbet ewé bipeyva. Madem Allah e é ku bipeyve ewé bı kesén xwey ‘eql u şu’r re bı peyve. Bé şek yén xweyi ‘eql u şu’r, zaré Adem insan e. Madem Allah(cc) é bı insan re bipeyve, elbet ewé bı insané mukemmel re bipeyve. Madem dı nav insaniyeté de yé en mukemmel, xweyi qabiliyetén mezin, xweyi exlaqeki bilind, yé karıbe serekıti u rehbertiyé bıke, pére é Allah bipeyve bı tifaqa herkesi ev şexsiyet Hezreti Muhammed aleyhisselam e u Allah pé re peyiviye u ji xwe re kırıye qasíd. (Mu’cizat-ı Ahmediye) é di jé re ji vé şerefe mezinıtır qey heye! Allah pé ra peyivi, xeber da, qal kır, şiteğili! Allahu Ekber!

Lı gor hatiye riwayet kırın: “Xalid é kuré Welid (r.a) dı sefereké de lı bal ‘eşireteké mevan dimine. Reisé ‘eşireté jé dıpirse:

“Gelo tu kare hıneki behsa hezreti Muhammed aleyhisselat u vesselamı bıke?”

Xalidé kuré Welid (r.a) goht:

“Qeweta mın ji wan xweşkayıyé Resulullahi ebedi re tune. Ez diréj nıkarım behs bıkıım.”

Reis goht:

“Bı qederé tu karıbe behs bıke. Bı kurtehi ji mer te’rif bıke!”, wexta ev pırs kır Hezreti Xalid wuha cewab da:

“Erresulü ‘ela qedril mürsel; yani é hatiye şandın bı qedré é şandiye ye!... (é Hezreti Muhammed şandiye Xalıqé Kainaté ye. Édi qedré wi tu hisab bıke.) (Münavi, Kastalani)

LI SER MEWLUD Ê

Roja wiladet u jıdayıkbuna seyidé me Hezreti Muhammed dı nav Musulmana de bı navé “Şeva Mewludé” té zanin. Mewlud bı me’na zemané çebuné u ciyé çebuné ye. Dı duwazdehé Rebi’ulewwelé de kéfxweşiya mewludé dı ‘esré 7’é Hicri de dest pé kırıye. Lı gor İmam-é Qestalani dı wé şeva mubarek de ziyareta mala ku Resulullah lı Mekké lé hatiye diné bubu ‘adet. Pıştı liméja muğurb lı Ke’bé bı cema’et dıhate edakırın, musulman dıhatına mala ku resulullah léh atıye diné. Dı wan tarıxa de ew mal mescid buye. Musulmana wé şevé liméja xwey ‘eşa lı wir eda dıkırın. Kesé cırané wé mala mubarek, malé xwe paqız dıkırın, dı xemilandın, hevdu tebrik dıkırın,

şekır u helaw lı mévané xwe belav dıkırın. Xelqé Medina Munewwer ji şeva xwe lı Mescid a Nebewi derbas dıkırın, lı ber sıbehé ji, lı ber deriya Babünnisa pénc mewludxana pıştı mewlud dıxwendın, şerbet lı millet dıhate belav kırın. (A. Köksal, İslam Tarihi, 2.24-25)

İmamé Suyuti, jıboy xwendına Qur’an é u dana xwarıné dı pışt mewludé de bid’eteke hesene, xweşik ditiye. (Hüsn’ül Maksid, s.41) Dıgel wi, ‘alimé mezin é fıqhé İbn-i Hacer dı heqé cıvin u xwendına mewludé de ev Hedisa péxemberé me dema hicreti Mediné kır dı ku Cıhu dı roja ‘Eşuré de roji dıgrın. Wexta sebebé vé rojiyé pırsı Cıhuwa wılo cewab dan: ‘İro rojeke mezin e. Lewra Xweda dı vé rojé de Musa u qewmi wi xılas kırıye. U Fir’ewn u qewmı wi ji dı behré de xenıqandıye. Hezreti Musa ji jıboy şıkré Allah dı vé rojé de roji gırt. Em ji vé rojiyé dıgrın.’ Lı ser vé gohtiné seyidé me Hezret-i Muhammed goht: ‘Madem wılo ye em ji wé zédetır néziki Musa ne’ pıştı wé rojé hem Resulullah roji gırt hem ji tewsiya musulmana bıbal gırtına rojiya ‘eşuré kır. (Müslim, sıyam:127) Lı ser vé Hedisé İbn-i Hecer dibéje: “Jı vé hedisé té fa’mé ku şukré şeva mewludé dı cıh deye.” (El-Havi Fi’l Feteva, 1.190)

Seydayé mezin u mucahıd Üstad Bediüzzaman Said Nursi ji xwendına mewludé xweş u baş ditiye belé hınék lefzén ku dibé iro şaş béne fémé gohtiye lazım e teshih, rastkırın u te’wil lı wan bé kırın. Dı heqé xwendına Mewludé de wuha gohtiye: “Xwendına Mewlud-a Nebewi u behsa mi’racé tışteki pır bı féde u ‘adetekı xweşiki islamé ye. Belki dı heyata musulmana de wesıleyeke xweş e jıboy suhbet é. Belki jıboy biranına heqıqeté imané dersek eşérin u xweş e. Belki wasıteyeye ji boy nuré imané, hıskırına Allah u ‘eşqa resulullah bine hereketé u tesir bıstının... Xweda vi ‘adeti heta ebedé bı domine... Âmın.” (Mektubat)

Hatiye gohtın: “Yeki weke Ebu Leheb ku bı dijımtiıya péxemberé me hatiye zanin ji ber bı wiladet u çebuna Resulullah kéfxweş buye xweda ‘ezebé wi dı wé şevé de sıvık dıke. Çewa wé xweda lutf u kerema xwe bı ser musulmané ku qedr u hurmeta vé rojé bıgrın ne barine...” (İbn-i Cezeri)

Dı dawiyé xeberdané xwe de em dıxwazın bıne zıman ku lazım e em ji vi zemané mubarek bı şukr u zıkré derbas bıkıın, jıboy nezıkbuna xweda u resulé wi ğıret bıkıın u jıboy zédébuna iman u muhebbeta Resulullah fırsét bıbınnın. Dı vé roj u şeva mubarek de em u brayén xwey musulman bıcvın, werın bal hev, behs u qala Resulullah u de’wa wi bıkıın u qıméta vé roj u şevé bızanıbın. Mewlud lı ummeta Muhammed, lı guhdaré mey ‘eziz u lı de’wetvané islamé u lı réwiyén riya Hezret-i Muhammed pıroz u bımbarek be.

Ey Rebbé mın salat u selamén xwe lı roja asımané péxembertiyé u lı eshabén wi yé weke sıtékké hidayeté ne bıke. U kesén lı pey wan dıçın bıghıjıne meqşeda wan u me u wan teva muweffeq u muzeffer bıke. Âmın.

Çil (40) mîrcanê dî guhê me da bibe guhar

Ji Hedisên pêxember çil(40)
Hedisê neqane.

Bî hêviya istifade kirin u tetbîq
kirina dî heyatê de.

- 1- Afetê 'ilmê, ji birkirine.
- 2- Paqiji névyê imanê ye.
- 3- Devê girêde u tewekkulê bike.
- 4- Roji bigrî şîhetê bîbin.
- 5- Nîmêj stuna din e.
- 6- Beza li pey helal cihad e.
- 7- Gotinê xweş sedeqe ye.
- 8- Cennet di bin siya şura de ye.
- 9- Gotinê dî meclîsê de emanet e.
- 10- Yê dibne sersebebê xerê weke yê dîke.
- 11- Cennet diyarê comerda ye.
- 12- Roji nivê sebrê ye.
- 13- Sebrî nivê imanê ye.
- 14- Mîzîcandî sedeqe ye.
- 15- Sebrî mîfte a serfiraziyê ye.
- 16- Sebrî, dî destpêka musîbetê de ye.
- 17- Qencê 'îbadeta yan daimî ye.
- 18- Qur'an sîrf derman e.
- 19- Yê li zîmanê xwe xwedî

derê xilas bu ye.

- 20- Serê hîkmetê tîrsa xweda ye.
- 21- Tîştê bê wâ'dkirinê divê ku bê dan.
- 22- Du'a sîlehâ mü'mîna ye.
- 23- Musamehê bike da ku tu ji bîbine.
- 24- Nîmêj nura mü'mîna ye.
- 25- Poşmani tobe ye.
- 26- Mescid mâlâ parêzkara ye.
- 27- Din nesîhet e.
- 28- Du'a 'îbadet e.
- 29- Cum'e hecca feqîra ye.
- 30- Pîrsê qenc, nivê ilm e.
- 31- 'Ewîl selam, pîşt re kelam.
- 32- Kennê pîr qelb dîmrîn e.
- 34- Roji mertal e.
- 35- Xewa sîbehê,manî'ê rîzq e.
- 36- 'Eraq, diya tevê xîrabiya ye.
- 37- Zîna çava, nerîn e.
- 38- Qene'et sermîyanekî bê dawî ye.
- 39- Heya ji imanê ye.
- 40- İnsan li ser dinê hevalê xwe ye.

Ehmedê Xanî Kiye?

Ehmedê Xanî yek ji wan Seyda u mezinên kevintirine ku dinav Kurdistan de té zanin u kitêbên wi bî sed sala di medresên Kurdistanê de hatine xwendin. Weke Nubihara Bîçukan u "Eqida imanê" ku di medrese u nav xelkê meyi musulman de bî sed salan hatine xwendin u gelê me dinê xwe ji van kitêba hin buye, 'elîmiye. Baweriya bî Rebbe 'alemê, baweri u naskirina rehber u serekê heq Resulê Xweda Hezreti Muhammed-Silavên Xweda lê bîn-, Kitêba hidayet, exlaqê baş u reçeta xelasiyê Qur'an, Lîmêj, roji, Hecc u zîka ji kitêbên Mela Ehmedê Xanî hatine naskirin.

Lî bal kitêbên wi, Em navê Seyda Ehmedê Xanî ji ciyêki dîn dibhizin. Ew ji Seydayê mezin, Mucahidê 'eziz, fidaiyê Îslamê Seyda Bedî'üzzeman Se'îdê Kurdi ye. Lî gor di Tarixçe-i Heyata Seyda Bedî'üzzeman de derbas dibe "Bedî'üzzeman weqta sézde-çarde saliye, di quba Ehmedê Xanî de maye. Mela Ehmedê Xanî yek ji wan edib u dahiyên Kurda ye ku Bedî'üzzeman di quba wi de maye. Carna bî şevan maye. Ew quba Ehmedê Xanî ku xelkê ditirsiya di rojê de bîkevê. Jîber vé xelkê ji Seyda Bedî'üzzeman re digotin: 'mezheri feyza Ehmedê Xanî buye' U ev kerametek diditin." (Bediüzzeman, Tarixçe-i Heyat)

Lî gor di Lahiqa Emirdağê de ji derbas dibe "Seyda Bedî'üzzeman lî wilayeta Agiri (Qerekilis) xwe di turbe Şêx Ehmedê Xanî de asê kiriyê."

Belê ev mirovê ku kitêbên wi bî sed salan di medresên me de hatine xwendin u Bedî'üzzeman di turbeha wi de bî 'ibadetê meşğul buye kiye? Ciyê wi di nav gelê me de çiyê u çî xîzmet ji îslamê re kiriyê?

Di vé sohbeta xwe de emê lî ser vi zati xeber bîdîn, bî peyvîn.

HEYAT U JİYANA WÎ

JIDAYIKBUNA WÎ

"Xettê teye sernuwuşt u sermeşq

Si sala xetê xeta diket meşq

Lewra ku dema ji geybê fek bu

Tarixê hezar u şêst u yek bu"

Di heqê jidayikbuna Ehmedê Xanî di destê me de agahi u me'lumateke qet'i tune. Lê hinek kesên di heqê wi de nivisandine ji van gohtinê wi, dibêjin tarixê jidayikbuna wi lî gor teqwîma hicri 1061'e ku ev beranberê 1650 weya 1651'ê ye lî gor tarixê miladi.

'EŞÎR U 'ESLÊ WÎ

Dibêjin navê bavê wi îlyasê kurê Rostem Beg e, navê

diya wi Nurê ye u ji 'eşîra Xanî ye. Nézi bajarê Hekari gundek bî navê "Bayê" heyê ku hemu malbatên wi gundi ji 'eşîra Xanî ne. Wekidi, kesên ji vé 'eşîretê lî der u dorê Xoşabê, Wanê, şemdinan, şîrnex, Gever, Cızir, Zaxo u hin ciyên dînî lî Kurdistanê Başur hene. Bî ihtimal Mela Ehmedê Xanî ji aliyên Hekari(Colemergê) ye. Bavê wi ji vir çuyê Bazidê u vé malbatê jiyana xwe lî wir domandine. Lî wir di medresan de ders dane u bî cih bune.

Disa lîgor dirokvan qeyd dîkin "Xanî" navê yek ji 'eşîrên Kurda ye ku di wê dewrê de 180'ê malbatên wan hebune. Wek 'eşîra Ertoşî u Pinyaşîyan, Xanî ji 'eşîreke xwe bî xwe ye.

Hinek dibêjin Mela Ehmedê Xanî lî Bazidê, hinek dibêjin lî gundê Xanî yê Hekari hinek ji dibêjin lî Xana Sé-gundan -ku girêdayî bî Hekari ve ye- hatiye dinê.

XWENDIN U TEHSÎLA WÎ

Di dewra ku Ehmedê Xanî jiyana xwe téde borandiye tehsil u xwendin lî ser naskirina Rebbê temamê 'alem u milletan hatibu avakirin. İnsan berya her tîştî rebbê xwe yani ew zatê ku ew çêkirinê u lazîme insan lî gor emr u nehyê wi heyata xwe bîborin, nas dikirin u meqsêda hebuna xwe u hatina dinyayê hin dibun. Mela Ehmedê Xanî ji lî ser vi exlaqî xwendiyê u perwerde buye.

Lî gor dinav xelkê me de bî devki hatiye riwayet kirin Mela Ehmedê Xanî lî Bazidê lî medresa Muradiyye dest bî xwendinê kiriyê. Pişt re lî Camiyên Bazidê xwendina xwe domandiye.

Di tedrisata medresan de muderris sabit e belê feqê dîgerin. Mela Ehmed ji, jîboy 'ilmê, diçe Exlat, Bîdlis, 'Urfa u Cızira Botan. Ev bajar di wan dewran de merkezên 'ilmê bun.

Ehmedê Xanî jîboy 'ilmê, naçe van bajarên bî tenê; belki diçe Suriya, Mîsr u Stenbolê ji. Piştî tehsil u 'ilmê xwe diqedine, xilas dîke dizivire Bazidê. Dest bî dersdayinê dîke u medresê vedîke, teleba ji kisi xwe xwedi dîke, feqîya radîke. Lîbal dersdayinê Xanî, kitêbên xwe ji dînivsine. Lewra kesekî dinav xîzmet u xebatan de be îhiyaca dibîne u lîgor ihtiyaca lî çareserîya dîgere. Mela Ehmed ji ihtimal jîboy perwerdehiya feqê u xelkê wi rehet bibe kitêbên xwe yi bî qîmet nivsandine.

DEMA KU XANÎ TÊ DE HEYATA XWE DERBAS KIRIYE

Xanî dinav bera qerna 16 u 17'an de heyata xwe derbas kiriyê u di wê dewrê de lî Kurdistanê mir u beg hakîm bun belê dibî idara dewleta 'Usmanî de bun. 'Usmanîyan

dî wê dewrê de lî Kurdistanê bî Sefewiyan re herb dîkir.

Jiber van herb u mucadelan, gelê Kurd é Musluman dî haleki perişan de bun, jî ber vé Ehmedé Xani dî Mem u Zin'a xwe de lî ser ehwalé milleté xwe hîneki nîvîsandiye. U xwestiye ku idareyeke şerî'eté bî heqî tetbîq bike derkeve. Weke dibêje:

Lew pêk ve her tîmî bê ittîfaq in

Daim bî temerrud u şîqaq in

Ger dé hebûya me ittîfaqek

Vék ra bîkîra me inqîyadek

...

Tekmîlî dîkir me dîn u dewlet

Tehsilî dîkir me 'îlm u hikmet

KITÊB U FIKRÊN WÎ

Ehmedé Xani bî zîmané 'Erebi, Kurmanci, Farîsî u Tirkî zanîbuve u bî van zîmanan şî'rên xwe nîvîsandîne.

Dî çardeh salîya xwe de dest bî nîvîsandîné dîke. Dî 33'ê salîya xwe de Nubîharé, dî 44 salîya xwe de jî Mem u Zin'ê dîvîsîne.

Lî gor gîhîştîye desté me pénc kitêbén Mela Ehmedî Xani hene. Mem u Zin, Diwan, Nubîhara Bîçukan, Eqîda îslamé, Eqîda Îmané navé kitêbén wî ne. Dîbêjî Seyda Ehmedé Xani kitêbék lî ser tebi'eté nîvîsandiye belé ew kitêb dî desté me de tuneye.

Mem u Zin'a Ehmedé Xani wek Leyla u Mecnun'ê behsa eşq u evîna heqîqî, behsa eşqa xweda dîke. Gohtîné xwe bî cilé tîştén însan jî wan hez dîke u bîwan té xapandî cil dîke, dîde nişandî ku hîzur u rîheta dî naskîrîna u hîzkîrîna Ellah Te'ala de ye. Mem u Zin kitêbeke tesewwufî ye.

Nubîhar ferhengeke Kurdi u erebi ye ku bî helbestkî hatîye nîvîsandî.

Dî **Eqîda îmané** de behsa şertén îmane dîke. Dî **Eqîda îslamé** de jî lî ser şertén îslamé dîpeyve u qesda hînkîrîna îslamîyeté dîke.

Diwana wî jî, jî şî'rên lî ser Allah teala u lî ser Hezreti Muhemmed hatîne nîvîsandî çêbuve. Dî diwana wî de, şî'rên lî ser şehîdê Kerbela, lî ser terîqa Neqşebendî u şî'rek jî lî ser Muhemmed Beg é Bazîdê heye.

Dî kitêbén xwe de behsa Melayé Cîzîrî, Feqîyê Teyran u 'Eliyê Herîrî dîke belé behsa nîvîskaré mewluda Kurmanci Melayé Batéyî nake. Belkî wî çağî mewlud ne gîhîştîbu desté wî.

Kitêbén Mela Ehmedé Xani kevn nebune. Belkî dî 'esra me de jî jî wan pîr té istifade kîrî, féde jî wan té ditî. Kesén weke Seyda Mela Ehmed Hîlmî el-Koğî lî ser kitêbén wî, jî wan bîzîran, dar u bexçe şîn kîrîne, şerh nîvîsandîne. Weke **"Gulzara hemukan"** şerheke pîr bî qîymete ku lî ser **Nubîhara Bîçukan** hatîye nîvîsandî u ne jîboy bîçukan tenéye, belkî jîboy cîwan u yextîyara, jî boy me hemukan e.

Disa **"Rehberé Sani şerha Diwana Ehmedé Xani"** jî yek jî van xebatén Seyda ye. Mela Ehmedé Hîlmî el Koğî seyda meyi mucahîd buye, ku jîyana xwe lî Bîsmîl derbas kîriye u dî wextekî néz de çuye rehmeta Xweda. Înşallah dî bernameyén pêş de behsa wî é bibe nesîb.

Dî dewra Mela Ehmedé Xani de jiber te'erruzeke bî desté dewletan lî ser diné îslamé tunebu musluman bî tesewwuf u terbiya nefsé béhtîr meşğûl dibun u jîboy bîbne însané kamîl dîxebîtin. Ehmedé Xani jî dî vé rîyê de çuye. Lî gor jî eserén wî té féhmé Seyda mensubekî terîqa Neqşebendî buye. Jé re şêx jî dibêjî; belé ne dî heqé xîlafeta wî, ne jî dî heqé icazeta wî dî desté me de agahîyek tuneye.

Seyda Ehmedé Xani dî kitêb u jîyana xwe de daye nişandî ku ehlé xwedaye. Wî behsa Xweda u diné xweda kîriye. Wîna zanîbu ku xelasi u hîzura temamé gela u gelé Kurd ne bî îslamîyet u guhdariya Qur'ané be nabe. Jî ber vé îslamîyet bî zîmané gelé xwe nîvîsandiye u tebliğ kîriye.

Neku behsa 'esabîyeta cahîlî, îrkçîti, nijadîperesti, dujmîniya hînek milletan, xwedénevasî u înkara axreté kîriye. Bes em bî huzun dîbinî ku kesén dîbén em lî mirasa Mela Ehmedé Xani xwedî derdîkevî, mirasa wî tevlihev dîkî u weke zarekî bé féhm mirasa bav u bapîrê xwe telef dîkî u bîrastî xwedî lé dernakevî. Ev jî dîde nişandî ku warîsén vé mirasé ne kesén bî zîmané Ehmedé Xani xeber bîdî, belkî warîsén wî evî ku: bawerîya wan bî Xweda u Resulê wî heye u ittîba'a Qur'an-a pîroz dîkî xwe jî heramî u neqenciya dur dîkî, dîparézî. Seyda Ehmedé Xani ne mirovekî nijadîperest, heramxur, tarîksalat, dujminé Şerî'eté bu. Ne jîyana wî dî van halan de derbas buye, ne jî dî kitêbén xwe yî bî qîmet de ev tîştén muxalîfé şerî'eté nîvîsandîne. Wî 'emrê xwe jî zarokî heta wefata xwe dî camî u medresan de dî cîvatén 'îlm u sohbeté de, dî behsa Xweda u Pêğemberé wî, dî lîmêj, rojî u mîhafezekîrîna jî herama de derbas kîriye.

Xweda me teva lî ser exlaqé îslamé jî réya van Seyda u meşayîxén me dur neke. Âmin.

WEFATA WÎ

Lî ser wefata Mela Ehmedé Xani dî desté me de me'lumateke qet'î tuneye. Lî gor Seccadî dî kitêba xwe yî bî navé "El Edeb'ül Kurdi" de nîvîsandiye, wî jî melayekî yextîyar 'elîmiye ku, dî kitêbeke bî navé **Samadiyya** de, tarixa wefata Ehmedé Xani bî hesabé ebcedé hatîye nîvîsandî. Ku dî wîr de "Xani fîriyaye bal rebbé xwe" hatîye nîvîsandî u ev jî beranbera sala 1706'an weya 1707'an e. Lî gor em féhm dîkî Mela Ehmedé Xani 57 sala jîyaye u gîhîştîye Rebbé xwe. Lî Bazîdê wefat kîriye u mezelé wî jî lî wîr lî roj-hîlata kelha Îshaq Paşa ziyaretgaha xelké ye. Lî bal gora wî mîzgeftêk bî navé Mela Ehmedé Xani heye. Xweda Rehma xwe lé bike u me jî jî xîzmet u xebata îslamîyeté merhum neke. Vé bernameya me bike wesîla hîşyarîya gelé me u xweyî derketîna lî mezinén qenc...

Lı Ser Diroké

Bi mîslé kesén ji bavé me Adem heta iro hatine, em hemd u sena ji Rebbé Alemé re dîkin. Bî mîslé ‘eded é insana, ‘eded é peyvén wan u nefesén wan em Hemdé ji Allah te’ala re dîkin u sîlavén ji dîl ji Resulê Xweda-peşkeş u serdaré xwe- Hz. Muḥammed re dîşinin.

Xwendevanén heja! Bî vé nîvisa xwe em dest bî peyv u gohtina Diroké u bî taybet diroka gelé xwe, gelé Kurd dîkin.

Bé şek zanina diroké tîşteki gîranbîha ye. Lewra her weki İbn’ül Esir é Cıziri ji, nîvisandiye u anîye zîman feydeyê zanina diroké dî du nuqteya de xwe nişan dîde.

Feydeya pêşî féde a dînyewi ye ku dî dunyayé de xwe dîde nişandan. **Feydeya duduya** ji feydeya Uxrewi ye. Ev feyde ji dîrsa karkirina heyata axreté bî insan dîde fahmkîrin.

Lı gor İbn’ül Esir é Cıziri dî “*El-Kamil Fit-Tarix*” a xwe de dîbéje **feydeyek ji feydeyê zanina dirokéyi dînyewi eve**: “Tarix her gav bî teref u aliyén xwe yi baş u xîrab tekrar dîke u bîvi rengé xwe, dîbe derseke bî ‘îbret. Kesé ji vé dersé féde bîbine ‘eql u fehma wi quwwet distine. Ev mîrov dîbe keseki ku karibe rast u çep, baş u xerab ji hevdu veqetine u heqîqetê nas bike.”

Feydeyêke dîn a dînyewi dî zanina dirok u tarîxê de eve: “Weqta mîrov dî civateké de runé, bî zîmaneki xweş behsa buyer u weq’eyek ji buyiné diroké bike u bî rexén baş u xerab bîde nişandan ewé kesén lı wé civatê guh bîdné u qelbén wan ji bikeve heyecané u bîxwazî dîwîya wé buyeré zanîbîn. Ewé rasti u başiyé dî wé buyera diroki de qebl bîkîn, xerabi u nexweşîya ji red bîkîn.”

Feydeyén zanina diroké yê uxrewi ji pîr in. “Weqta mîrovek kitabêke lı ser diroké bîde deste xwe u bîxweyne u té de bîfikre ewé bîbine ku dunya bî naverokén xwe her gav dîheje u lîhev dîkeve. Ewé féhm bike bé ka insan lı dunya é çî dîkşînin, çî bela u musîbetan dîbinîn. Wé insan féhm bike ku dunya her weki aşeki insana bî mal u mîlkén wan re dîhére, paqîz dîke, bîçuk u mezîna hunda dîke. Wé bîbine u féhm bike ku kesén dewlemend u feqîr, zahîd u ‘asî temâm lı vé dînya namînin u hunda dîbîn.

Jîber vé yeké wé insan ji van lewha yê ‘îbret é

dîrs bîstine u dî rîya axreté de xwe bî ‘îş u karén lazîm u bî féde meşğul bîke u zad u zewadeyeki ji xwe re hazîr bîke. Wé jîboy mala hîzur u ferahîyê bîxebîté ne jîboy hepsa poşmanîyê lı axreté. İnsané ji diroké dersan bîstine wé ji ğeyrî Qur’an é tu xelaskar a nebîne u xwe her bî Qur’an a Rabb’ul ‘alemin bîgre u lı pey hukmé wé here.

Feydeyêke zanina diroké dîné ku lı axreté dîne-re ewe ku insan dîrsa hînbuna sebr u tehemmul distine. Dî’elîme u hîndîbe ku sebr u tehemmul exlaqén insanîyetéyi herî lı pêş u gîring e.

Xwendevanén heja! Mîrovén lı diroké dînére dîbine ku serkeftî her bî rasti u sebata lı ser heqîyê ye. Dîsa dîbine ku heqperestén berya wi pur bedel dane u sebr kîrîne. Weki dî diroké de kesén heqperest u da’wetvané heqî u rastîyê dîbine u şahîdî dawîya ‘emré wan dîbe u exlaqé wan nas dîke her usa kesén xain u revok ji nas dîke, hîfza xwe ji wan dîke. Féhm dîke ku khurt dîrsa diroké eve ku Rebbé ‘alema Allah dî suretê Fatîhé de gohtîye:

“Sîratallezîne en’mtê ‘eylehim, ğeyrîl meğdubî ‘eylehim wele-d dallîn” yanî “*Ey Rebbé mîni Rebbé temamé ‘aleman! Ey Rebbé mîni Rehman u Rehim! Ey Rebbé mîni malîké roja hisabé! Ez ji te tené re seré xwe dîthewînim u ‘ebdîtiyê dîkîm u ji te dîxwazîm: Tu mîn bî fedl u kerema xwe ji rastan bînvîsîne u bîgerîne. Jî wan kesén ku tu ji wan razî buye u nî’metén xwe lı wan kîrîne, ne ji wan kesén ku dî heyat u diroka xwe de qehr u ğezeba te kîşandîne ser xwe u ketîne dalalet u çepîyê u xwe ji Rehm a te dur kîrîne.*

Bes kurtehiya diroké eve. Emé lı dirok u serpehatiya gelé xwe ji bî vi rengî bînerîn u ji boy xwendevanén heja bînvîsînîn. Ne ku emé lékolîneke aqademîk lı ser diroka Kurdan bîkîn.

Em Kurdén Musulman in u nérîné me nerîné Rebb’ul ‘alemin, Qur’an a wi ya pîroz u Resul é wi yê Emin in. Lewra me xwe bî boyaga Allah boyag kîriye u em bî wi rengî dîbinîn. Ne bî rengé sufli, nefsi u ‘esebî em dînerîn.

Em ji rebbé xwe hévidar in ku vé xebata me jîboy razîbuna xwe bîgerîne, qebl bike u me her gav lı ser rasti, heqî u xweşîyê muwefeq bike. Bîmînin dî xér u xweşîyê de u emanet é Xweda bîn.

PEYVÊN MEZINA

- 'Edaleta xwe nespére quweta 'acız. Quweta xwe nespére 'edaleta zalım.

(Hz. Ebu bekr)

- Piştevané ilmé gotına 'ez nızanım' e.

(İmam malık)

- Dinya u axret weke du hewiya ne. Yeké tu çıqas dılxweş bike ya dın té hewqas biğeyidine.

(Mewlana)

- 'İlim ne tışté ku té hıfz kırım. Qezenca ji hıfzkırına hatiye kırım.

(İmam şafii)

- Şiteğali, aqıl u bılınbuna insan nişan dide.

(Hz. Ebu bekr)

- Menfi'eté dinyé dışıbihe beraté mırara, égo dibe talibé wé divé ku xwe ji şerré beraza re hazır bike.

(Hz. Ali)

- Jıbo ku hun insana rast bıkn, divé ku ewıl hun xwe ıslah bıkn.

(Hz. Umer)



SERPÊHATIYA FEQE SUHEYB

Bî navê xwedayê

Rehman u Rehim

Hemdê bê hed, şûkr u senayê bê aded, minnet u nimetê bê hesab ji Xweda re be, heta bî ebed. Rehmet u bereketa Xweda liser enbiya u resul u weliyan be. U liser aşîq u da'wetvanê heqqiye be.

Ev nivisa me liser heyat u jiyana feqqiki bî navê Suheyb navdar e. Feqi Suheyb, lî bajarê Mérdin é, ji malbatek şéx, 'esil u dewlemend bu. 'Umrê Feqi Suheyb çarde bu, diket pazda. Yani dighajt sala biluğê. Hé beri wi lî heyata dinya a fani dînihérti. Lê belê ew çağ Feqi Suheyb heyat u jiyana xwe dimeyzêneki rast de ne diditi.

Jî ber we yekê gelek cara feqi Suheyb hezin u xemgin dîbu. Lewra jî Feqi Suheyb ra heyat u jiyaneke manevi u bî huzur lazîm bu, da ku karibe ya jiyana xweyî dînyai jî rast bixê riyê. Dî wê hengamê, dî gelek cara bî xebera dé u bavê xwe der diket u diçû welatna, lî gelek bajara dî gerya. Lê belê Feqi nîzanibu bê lî çî dî gerya. Dî wê hengamê de Feqi kur dîfikiri u gelek duşunce u xeyala wi meşgul dîkir. Bî wi hewayî Feqi veqerîya hate mal, cem dé u bavê xwe. Dî wê nav berê de Feqi çend sal derbaskîr. Carna Feqi şîvanti dîkir, carna jî nehewî u şumîti yê wi çê dî bu. Jî ber ku Feqi bî hereket u tevger bu.

Rojekê jî roja Feqi carekî dî serê xwe hilani u derketi der u çû bajare Rîha ye. Ew şev tesadufî lî yurdê dergahê nebi İbrahim (as) bu mihaman u bî talibê 'ilmê re runîştî u sohbeteki xweş kir. Feqi



Suheyb wê şevê lî cem talibê 'ilmê bî xeyala xweyî kur ketî xwe xweş.

Feqi Suheyb serê sibehê bî ezana şefeqê re hişyarbu u destmêjek girt u bî cemaatê limêja xwe eda kir. Ew jî 'elametek bu jîbo Feqi Suheyb ku wê hîno hîno nêzîki armanca xwe bîbuya. Ew 'elametek dida nişandan ku wê deryê qesra cewhera manewiyatê lé vebuya. Dî wê hengamê de xoca ki mesulê dergahê lî Feqiyê jiyandar hînek nesihet kir u jê re got: "Jî xwe re 'ilmê bîxwîni" Ev çax nesihet jî Feqi Suheyb re gelekî xweş hat, lé belê Feqi nîzanibu bî rîya 'ilmê de biçuya. Ew çax jê re qîlawîzekî maddî weya me'newî lazîm bu. Dî wê hengamê de Feqi Suheyb bê pere u bê xerci mabu. Ew çağ Feqi lî ser tunebun u kemasiya heyata dîne dîfikiri u jîxwe re ders u 'îbret tanîn der. U dî pişt re veqerîya hate mal cem dé u bavê xwe. Lê bele Feqi

Suheyb ne rehet bu jibona ku here 'ilmé bixwine dı xeyala xwe de hınek program çé dıkir. U bı vi hewayi lı cem dé u bavé xwe çend sal derbas kir, dıwé hengamé de gelek xewné xweş u bi xér dıditi, xewné Feqi Suheyb geleki xweş u mani dar bun. Geh bı firandın geh lı ser av u çema geh bı çuna Hecc u Beytullah é.

Heta sala hezar u nehşed u not u neha(1999) ew hal dom kır. Bı wi hewayi şeveki ji şeva Feqi bı xıyaleki kur ketı xeweki xweş u dı xewna xwe de odaki pur şefaf u dı hundur wi ode de gelek kitab u Qur'an tev lı nur u ronahiyé dıditi u du hundur wé odé de hınık zaté 'alim u nurani runıştıbun. Ewan zata denge xwe lı Feqi Suheyb dıkirin u ew de'weti cem xwe dıkirin u Feqi Suheyb ji icabeti de'weta wan zata dıkir u dıçu lı cem wan rudınışt. Jı wan feyz distend. Dı wé navberé de Feqi Suheyb hin bétir eşq u şewqa wi zédetr dibu.

Bı wi rengi careki dın Feqi Suheyb dı xewna xwe de dibine. Zateki ma'newi jé re rehbertiyé dike u medresaki 'ilmé lı bajareki welaté Mérdin é nişani wi dıde. Dı wi haleti de Suheyb hışyar dıbe u xewna wi bıbira wi té u pur muferreh dıbe. Pıştı wé xewna xweş Suheyb xewnek dini bétir bı qımet di. Dıdıt go şeveke ji şeva Feqi radıkevi u dı xewna xwe de Resullullah (sav) dibine. Suheyb dı xewné dit go xwe lı ser çoka lı huzura Resulé Xweda dıbini.

Feqi dı wé heyecané deyi, dı nihéri gu resullullah (as) desté xwe yé mubarek vedıki bıber asimana de. U ji Feqi ima ek çédıbe. Bı wi hewayi Suheyb devé xwe daxılı çengıka Resullullah (sav) dike u Suheyb ji kumlu ka ronahiya çava tişteki weki şır u avé vedıxwé u idi nabini gu dewéxwe tıné der. Bı wé heyecané Suheyb hışyar dıbe u ji kéfére idi nema hewıya wi té. Suheyb ji xewna xwe bawer kır u qerara xwe da gu wé bixwini.

Rojeki ji roja iné. Feqi hazırıya xwe kır u pıştı liméja cumu'é keté réçıka medrese é gu dı xewna xwe de dibu. İdi Suheyb géhaştıbu medresé u lı cem feqiya runıştıbu suhbet dıkirı. Dı wé hengamé de

seydayé medresé hati u suala halé Suheyb kır goté "derdé te çıye?" Suheyb cewab da, got: "Seyda ez hatime 'ilmé bixwinım." Seyda bı vé cewabé kéfxweş bu. Seyda cıhé Suheyb dı medresé de çékır u tewsiya Suheyb lı feqiya kırı jıbo alıkarıyé.

İdi Suheyb bibu feqi u dest bı dersa 'ilmé kırıbu. Dı wé hengamé de dé u bavé Suheyb jé béxeber bun. Lıçlı lıçlı suala Suheyb dıkirin u geleki xemgin dıbun. Jı ber gu Suheyb lı ber dilé dé u bavé xwe şérin bu bı fıraqa wi geleki hezın dıbun. Jıber wé yeké zeman zeman Suheyb behsa xwendina 'ilmé dıkir. Lé belé izna wi ne dıdan. Suheyb ji dılda é dé u bavé xwe bu. Lé belé çarawi nemabu. Lewra 'eşqa 'ilmé lı seré wi dabu. Ew qaideki ye; daima eşqa me'suqé, bı aşıqéxwe re muxalefeta 'adeté kırıye. Nihayet bı pırsyan rojeké bavé Suheyb edresa wi sehdi u bı kéfeki té zıyareta wi. Jıber ku bavé Suheyb mü'mın bu. Bı xwendina wi 'ilmé pır kéfxweş bu u jéri alıkarı kır.

İdi Suheyb dı riya 'ilmé de domkır. Lewra Suheyb gıhıştıbu armanca xwe. Bı vi hewayi aşıq bı me'suqé xwe re roj bı roj dıfırıya.

Geli xwendevanén héja, dı nivisame-de miheqqeq wé kémasi hebın. Em hévidarın ku huné bı niyeta xweş lé bınihérin.

Geli xwendevanén 'ezız! Ev bı hevrebuna me bı xér u pıroz be. Heta bı hevrebunek dın dı xweşiyé de bıminın. Emaneti Xweda bı.

**Feqi
Suheyb seré
sıbehe bı ezana
şefeqé re hışyarbu
u destméjek gırt u bı
cemaaté liméja xwe
eda kır. Ew ji 'elametek
bu jıbo Feqi Suheyb ku
wé hıno hıno néziki
armanca xwe bıbuya.
Ew 'elamet dıda nişan-
dan ku wé deryé
qesra cewhera
manewıyaté lé
vebuya.**

Jî Cewşenê

Xwedayê mezin ev navên xwe di herba Uhdê de bi wasita Cebrail jî pêxemberê me Hz. Muhemmed (s.a.w) re şandiye. Resulê Xweda çağa ev nav jî cebrail girtin; zirxê xwe dani u xwend.

Ev jî dide rēdan ku di demu dewrê tengi u zehmetiyê de xwendina van nava sebebê fereca xêrê u xelasiyê ye. Kesê musluman rojê çend nava jî vana buxune u daxwaziya hidayet u ixlasiyê jî xuda bike, muheqeq xuda wê daxwaza wi pêk bine.

Ustadê me Bediuzzeman pîr cewşen xwendiyê u xwendina wê teşwîq kiriye. Xêr u bereketa wê pîr salih u muteqqi ghandiyê. Jî Cewşenê hinek qisim:

QISMÊ EWIL:

YA REBBÎ! **Ez bi heqê navê te jî te duxwazim:**

- 1- Ey ewê rebê her tîştîye.
- 2- Ey ewê ku rehmani li her tîştîye.
- 3- Ey ewê ku rehmani wi li dostê wîy
- 4- Ey ewê ku bi her tîştî dizane.
- 5- Ey ewê ku şefqetawî pîre.
- 6- Ey ewê ku meznaya wi pîre.
- 7- Ey ewê ku her tîştê wi bi hikmete.
- 8- Ey ewê ku hebuna wi bê pêşîye.
- 9- Ey ewê ku hebuna wi bê dawîye.
- 10- Ey ewê ku ikrama wi pîre.

Tu jî tevê kemasîya pak u paqîje. Jî bil te ve tu ilah tunene. Emanê bide me. Em emanê duxwazîn. Me jî cehennemê azad bike...

QISMÊ: 2

- 1- Ey mazinê tevê mazina.
- 2- Ey ewê ku cewaba dia dide.
- 3- Ey xwedîyê temamê qenciya.
- 4- Ey ewê ku derenca bilind dîke.
- 5- Ey ewê ku bereketa mazin dîke.
- 6- Ey ewê ku guneha efu dîke.
- 7- Ey ewê ku belaya defîi dîke.
- 8- Ey ewê ku denga hîs dîke.
- 9- Ey ewê ku xwesteka dide.
- 10- Ey ewê ku bi tîştê veşartî zane.

Tu jî tevê kemasîya pak u paqîje. Jî geyri te ve tu ilah tunene. Emanê bide me. Em emanê duxwazîn. Me jî cehennemê azad bike...



Ya Rebbi!

Ya Rebbi! Me idraq u bawer kir ku jî bil tev çî tîştê heye fani ye. Temamê quwet u qudreta fani ye. Ku ew buxwazî kesek manî'ê wi tune. 'Umreki di rîya te de neyê xerç kîrîn beyhudeye.

Ya Rebbi! Tu me bîde hin kîrîn ku yê hēyat u mîrînê dide hew tu ye. Jî bil te tu kesek nîkarî sax bike u bîrîne. Bê tîrsa mîrînê kîrîna cîhadê bike nesîbê me.

Ya Rebbi! Em baş dîzanîn yê dî'a qebul dîki her tu ye. Jî bil te tu ilah tune. Jî ber vê yekê qanunê asîman u 'erdê her di destê qudreta te de ye. Hēq em jî te bi tenê duxwazîn u em xwe davê jin dergahê te.

Ya Rebbi! Jî te pêve dost u muhîbê me tune ye. Hew tu xwedîyê me ye. Jî ber vî qasî li hember van neyarê pîr em jî te bi tenê alîkarîyê duxwazîn.

Ya Rebbi! Dî her babetê hēyatê de em hew îlahtîya te bi tenê qebul dîkî. Jîyana xwe li gori hukm u qanunê te ras dîki. Jî bo 'edîlandîna suc, guneh, kemasî u qusurê xwe, xwe davêjin dergahê te. Dî vê 'esra fisq u fucur u neqenci bela buye, tu lingê me li ser rîya dînê xwe sabîb bigre. Tu hêz u quwetek ku me neşemîtîne bike nesîbê me. Tu me jî şîrkê, jî kufrê, jî nîfaqê u jî qre'ja cehaletê bîparêze.

Ya Rebbi! Tu qenc bî me bîde zanîn ku dînya zevîya axretê ye. U rojekê muheqeq em ê hesabê emelê xwe yî dînyê bîdne rebbê xwe. 'Emelê qenc u salih bike nesîbê me. Dî vê imtîhanê dînyê de me bîgerîne jî ewanê ku pêxember, ewliya, enbiya u şex u 'alîmê qenc jî xwe re kîrîne serok u rēzan u li pêy rîya wan dîmeşîn...

Ya Rebbi! Me daxilî cenneta xwe bike. U 'emelê ku me bîghîne cennetê bike nesîbê me. Me jî 'ezabê cehennemê u jî 'emelê ku insan dajo cehennemê mîhāfeze bike. U rîya çuna cennetê yî ku bî sîrî u dîrîyî şanî me bîde.

Ya Rebbi! Em xwe dispêrîn te, tu me bê alîkarî nehêlî... Âmin



PELEK JI TARIXA İSLAM Ê

Hz. Umer di heyama Xelifetiya xwe de, bi 'edaleta xwe nam dabu. Ev qis-set dide rédan ku wi çaxa waliyé xwe dineqandin rojeyén xwe çiqas bi hendezati bi kar diani.

H. Umer nameyké ji seroké Himisiyan dşini u ji wan navniş'a feqir u mihtacé bajér duxazî. Eşrafé Himis é navniş'a feqiré Himis, Şam u gundé dor wan hazir dîkin u ji xelifere bi ré dîkin. H. Umer listé vedike u dinere ku navé waliyé ku wi şandibu di seré listéde hatiye nivisandin. Gazi qasidé navniş anibu kir u pirsawaliyé Himis é Sa'd b. Amr jé kir.

Qasid gote xelifê: "Ya emirül mü'minin! Bî rasti waliyé me pir feqire. Xilaté ji xelqé té qebul nake u di cihde li feqir u muhtac é bajér bela dîke."

Peyvén qasid li xweşiya xelifê hat u disa jé pîrsi: "Tu qusurê waliyi bi xweşiya we naçî heyî?"

Qasid go: "Belé çend qusur u kémasiyé wi heni." Umer go: "Çine ev qusurê wi?"

Qasid go: "Çar qusurê waliyé me hene u xelqé Himis é tev ji wan qusurê wi gazina dîkin.

Waliyé me divé ku her sbeh pişti nîmêjê were qonaxa xwe, feqet dereng té. (wexté taştiya té qonaxa xwe)

Waliyé me tu şeva ne té civata me u ne ji mévana li mala xwe qebul dîke. Ji meğrib de deriyé xwe ziqate dîki. Munasebeté xweyi bi xelqêri ji bini qut dîki.

Ji hefté rojekî ji mala xwe dernayé u keseki li mala xwe na hewine.

Car car ji nişkavî ji hiş xwe vi diçî u sebebé wê ji keseki rî nabêje.

Xelifé hetani paşi guhdariya wan dîki. Piştî da ku ji wali re dibin hinek erzaq u libas dide wan. U jibona sebebé qusurê wi nas biké dişini péy wi.

Mişwerek derbas dibe Sâ'd b. Amir té Mediné u derdikevî huzura xelifê.

Sâ'd dibêje: "Ya emirul mü'minin! Wallahi mî nedxwest sebebé van qusurê xwe ji keseki ra bibêjim. Feqet ji ber ku tu amiré minî ez mecburîm sebebé wan ji tere bibêjim.

Ji ber 'iyala mî nexweşe u 'iş u karé hundiré malé ez dîkim ez hineki dereng diçime gonaxa xwe.

Bi rojé ez xîzmeta xelqé xwe dîkim u bi iş u karé wan dadîkevîm. Évara ez hem muhaseba iş u karé xweyi rojé dîkim u piştî hetani mişwerek ji şevé dubhîri ji rebé xwe re ibadeté dîkim.

Ji ğeyri cilé li ser mî tu cilé minî dîn tuneyî. Ji hefté rojeké ez wan derdixim u dişom. Hetani zuha dibî yén piraké xwe li xwe dîkim. jibo weré ez nîkarim mévanaji qebul bikim.

Çaxa wexté şehidbuna Hubeyb, li Mekké té bira mî ez ji hiş xwe vi diçim. Çunki muşriké Mekké çaxa Hubeyb şeniqandin ez ji li ba wan bum. Ax ku ev menzere té pêş çavé min ez ji mesuliyetê ditirsim u ji hiş xwe vi diçim.

Li hember van gotinê Sâ'd, H. Umer ji hêsiré çavê xwe rî nebu berbest u gote Sâ'd: "Tirsa Xweda çiqas meqamê te li dinya u axretê bilind kiriye Ey Sa'd..."



HER KESÎ JI BO XWE, AN EMÊ JIBO KÊ BIGRÎN?

Lî bajaré Besra yé merveki xwey ta'et u 'ibadet hebu. 'abideki birbir u bi feraset bu. Xewf u tîrsa wi ya ji xweda ew westandibu, béhal u bé mecal xistibu. Hema her tim bi giri bu. Ewqas ku, girin u héstirén çavén wi, ew xistibu nava cîha u birasti ew nexweş xistibu.

Édi me'lume, zeman weki avé derbas dibe u diçe... Roj roja dîqelîbînî, meh u sal li hev u din sîwar dîbîn u weki pél u mewcén behra didin pey hevudîn...

Dî vé navé de nexweşi li 'abîd gran dibe. Hîno hîno wi bi ali ecelé wi yén muqedder ve dîkîşîne. Belé mîrîne ev! Kesé ku bibêje ez yé jé xîlas bîbîm nin e. Buyerek bi vi hawayî nehatiye qewmandîn dî navbera ruhbera de. Ku 'abîdé me yé bi rumet u delal ji xelas bibe.

Na! Nin e tîştîki wîsan! Jî ber vé, dî dawiy de wexta mîrîna wi ji wé bé. Wek ya herkesî...

B e l é
nexweşiyé
mîrîn lî


'abîd 'îyan kîr. Çawa ku bi navé xwe dîzanîbu, weki wîya u birasti belki ji, jé bi yeqîntîr, édi zanîbu ku wé bîmre. Ango çawa em li rojé dinérîn u em wé eşkera dîbînîn, 'abîd ji, weki vé buyéré mîrîna xwe di wextek nézik de u bi çavén seré xwe dîdît.

Jîber vé yeké malbata 'abîdéyi bi rumet, zar u zécén wi yé ku perîşan bune hatîn, civîyan ser hevudîn, kom bun u xwe dane doré. Lewra cîhé bun, cuda bun u ji hevudîn qetandîn zor e, nerîhe-tîye. Ya hîn bi şewattîr, an ew firqeta han bédawî be!? An wîha be!?

...

Ha bi van fikir u şayîşa lî dora 'abîd çûn u hatîn... Birasti qelîqîn, nesekînin u keliyan dî hundiré xwe de. Jîber ku rewşa 'abîd gran bu u wan ji ev féhm kîrîn, rabun dest bi giri kîrîn u hawariya ku bi deng danîn.

Dî vé navé de der u cîran ji bi guh bun; wan ji nexweşîya 'abîd bîhistîn. Bêqeyd neman... Jî bo serdana 'abîd hatîn u çûn. Birasti serdana cîrana, ya eqreba u birasti ya nexweşa tîştîki siruştîye dî navbera mîlleté me yé Müslüman de. Lewra exla-



keki İslami ye. Fermana yezdan u ya qasid é wi ye hebib aleyhisselatuweselam e...

...

İcar 'abid her çikas nexweşeki girane ji belé heşé wi li seré wi ye. Hay u bala wi ji der u doré wi heye.

Dî nava çihé xwe de u dî 'alema xwe ya hundi-ri de bî kurahi difikiri...

Qaseki bî wi awayi lî griyé malbata xwe, lî hawariya zar u zécén xwe kul î ser wi daxistinî u lî çuyun u hatîna der u ciranén xwe temaşe kir. Lî ser halé ku ew bî xwe té de u lîser

rewşa ku malbata wi ketiyé hîneki difikiri... Paşiké dî wé rewşa xwe ya giran de gazi malbata xwe u zar u zécén xwe kir:

"Ka werin!" go, "Werin lî tenîştî mîn runén..."

Hatîn. Xwe nézi çihé wi k i r r i n . Destnişan dan hevudî ku bîla bédengi çé bibe. Wîsa kîrîn... Dî piştî re guhén xwe danén ku ka wé çî bîbéje.

'abid beri péşî beré xwe da bavé xwe u çavé xwe bî ali wi va zivîrand. Gote:

"O bavo! Ma tu jîbo çî dîgri? Tîşté kut e dîde grîn çî ye?"

Bavé wi bersiv dayé:

"Bexé mîn... Kuré mîn! Bî vé nexweşiya te ez fîkîrim ku ez yé te hunda bîkîm... Tu yé jî mîn hunda bibe u dî piştî çuyîna te jî ez yé bî tené bîmînim. Lî ser van dîponijîm u jîbo vé yeka ha dîgîrim..." Dure zivîri bî aliyé dayîka

xwe ve, icar jî wé pîrs kir:

"Yâdâ mîn! Ma tu jîbo çî dîgri?" Gote:

"Jîbo éşa ku ez yé te wînda bîkîm kuré mîn!..."

Paşî beré xwe da bî ali pîreka xwe ve u goht:

"Belé, hurmet! Gîrîyén te jîbo çî ye?" Wé jî jî hêla xwe de lî meselé nêrin u wîsa gote:

"Té çéyi u qenci dîkîr... Tu lî me xwedi derdîket... Tu her tîşté me bu... Lé belé a nîka tu lîber mîrîné ye... İcar té me terk bîkî u here... Lî pey te kî heye kul î me méze bîkî? Ké lîvan zar u zécân bînéhîrî? Ha, vana tîşté ku mîn bî gîrî dîkîn..." İcar beré xwe da zarokén xwe:

"Ka bîbéjîn jî mîn ra sebeba gîrîn u hawariya we jîbo çî ye?" Gotîn:

"Piştî çuyîna te emé séwi bîmînî... Em bî ber viya dîkevîn..."

Wé çagê lîwan méze kir u lîser bersivén wan fîkîrî u wî jî dest bî gîrî kir. İcar malbata wi, zar u zécén wî jé pîrs kîrîn:

"Baş e, lé belé tu jîbo çî dîgri?" Bersiva ku wî da mala xwe ev e:

"Mîn dit ku jî we her yek, ne jîbona mîn, bîtené jîbona xwe dîgri. Ma gelo dînav we de, kesé ku jîbo réwîtiya mîn ya dîrêj ya bé dawî dîgri heye? Hesabeki giran, 'aqibetek xerab u mehkemek lî iltimas u hewedariyé naniherî lî bende mîn e. Ku dî wé de 'edaletek xas hakîm e... Ango, jî we kesé ku, jîbo 'aqibeta mîn dîgri heye? Çî lî péşîya mîni u ezé leqayi çî bîbîm, jî we kesé ku jîbo vé yeka ha dîqelîqînin heye!? Wé mîn lî hîzura Rebbé 'alemé bîdîn sekinandîn... A jîbo viya, kesi dî nava we de dîgri heye?..."

Bî du re seri wî ket ber u weché wî qelîbî... Nêrin ku wefat kîriye.

**"Mîn dit
ku jî we her yek, ne
jîbona mîn, bîtené jîbona xwe
dîgri. Ma gelo dînav we de, kesé ku jîbo
réwîtiya mîn ya dîrêj ya bé dawî dîgri heye?
Hesabeki giran, 'aqibetek xerab u mehkemek lî
iltimas u hewedariyé naniherî lî bende mîn e. Ku
dî wé de 'edaletek xas hakîm e... Ango, jî we kesé
ku, jîbo 'aqibeta mîn dîgri heye? Çî lî péşîya mîni
u ezé leqayi çî bîbîm, jî we kesé ku jîbo vé yeka
ha dîqelîqînin heye!?** Wé mîn lî **hîzura
Rebbé 'alemé bîdîn sekinandîn... A
jîbo viya, kesi dî nava we de
dîgri heye?...**"





D'ewetvan
Muhsin Canan



*"Hemd û sena û şukranî
Ji bo wî xaliqê rehmanî."*



EXLAQÊ XEBATÊ

Ziman u Zimanê De'wetkarê Îslamê

Wek her dem, bi heskirin u zimanek xweş

Milletê jar u bîndest, ê bîbin dilgeş

Bînavê Xweda yê Rehman u Rehîm

Hemd u pesîndan bîkamîltî jî Xwedayê alemare bî. Selat u selam lîser mezinê me Muhammed Mustafa bî. Him selat u selam lîser al u eshabê wî be. Him selat u selam heta roja dawî lîser dozdvane Îslam a pîroz be.

Gelî dozdvana u de'wetkarên heja u delal!

Mîjar u behsa me lîser exlaqê xebatê u dî exlaqê xebatê jî lîser zîman u zîmanê de'wetkarê Îslamê ye.

Zîman nî'metek jî nî'meta ye. Zîman camekân u raxîsteka dîle. Mîrov tîştê dî dîlexwe bî zîmanêxwe derdîxe derve u bî kesar lîhev par dîke. Çî tehl u çî şêrin; çî pak u çî qîrêj, dost u neyartî bî zîman tê fehmîkirin. Belkî jî ev gotîne peşîya jîber ve hatîbe gotîna: "Zîman hem dost e, hem dijmin e." Dî vé gotîne de didu me'ne féhm dîbe.

A yekê go zîman dost e, jî ber çî

doste? Dost e lewra wexta zîman qenci u rastiye bêje, xwe u xwediyê xwe dîke xwedi dost u rumet u hürmet; bîvé awayî dostaniyê dîke.

Hem dijmin e... Wexta em bîpîrsîn çîma dijmin u neyare? Ev jî wexta zîman neqenciye bêje xerabiyê bêje munkerê bêje, bîqehr u 'enîr bîbéje, ew çax xwe u xwediyê xwe dîke xwedi neyar u dijmin. Dî serê her tîştî u herkesî neyartiyê bîxwer dîke u neyara pîr dîke. Ev me'na go lî xwediyê zîman dînerî bu.

A diduwa jî go zîman jî é muxatab re bî çî şekl u zîmanî deng lé bîke dîbe dost u yan dîbe neyar. Yanê peyvîk u bêjê wî bîçî hatîbe avakîrîna bîçî hatîbe heyvankîrîna yan é dosta yan é neyara bîwelîdene. Bêşek heyvanê dost u neyartiyê dî dîlde péde dîbe. Lewra jîber wê me got, zîman camekan u raxîsteka dîle. Disa; péşî dîben zîman kîlîta dîlane, yanê wexta zîman bî galgal u bejbu, çî dî dîldebe ber ça'va dîbe. Jîber vé kesê zîmanê wî şîr u şekîr be, dîlé wî jî bî gumanek mezin yar u yarane.

Belê qesta zîman dî zahîr de çîqes perçek goşt be jî, dî eslé xwe de bîzî-

man anin u fesahet u beyane. Em tev zanin kesé lal ji zimané wi heye, belé fesahet u beyan pé re tine. Jiber wé Şéx Ehmed é Xani gotiye:

**“Hemd û sena û şukranî
Ji bo wî xaliqé rehmanî.**

**Ku fesahet û beyan daye lîsanî
Lîsan daye însanî.” (1)**

Xweda jé razi be. Şéx Ehmed é Xani ji behsa zimané bifesahet u beyan dike. Béle beri her tîştî geli heval u birayé heja u delal! Bî heqîqet zimané bî fesahat u beyan çî nî’metek mezîne, kéli u hineké bîfîkrîn bézîmantîye, çîqas zehmet u zor e. Kûl u derdê te, dîlşahi u xweziyê te tev dî dilde mehpus bîmine. Çavê te ji zora tîje dibe. Dilê te dîkele u difure belê, belê zîman nagere. Dest u tîlyê te dîkin hewar, hestîrê çavê te dîkin carwar. Béle disa zîman nagere. Hesreta bêjeki dî dilde agîrek şewate ew çağ!..

Eré ger hun bîxwe karîbîn rojekê tené, bîzîmané xwe bîgrîn u ji rojhîlat heta rojava tu qet nepeyîvîn. Weke Meryem a pak u paqîj bêjîn em bî rojîne. Belê tu qet nepeyîvîn. Ji bêje u peyvîkar dilê xwe bîkîn heps u gîrtîxan. Yan dîlşahi u heskîrnê xwer; kul u kesera xwer bîkîn gîrtîxan. Bîkîn bê çîqas zore bézîmantî, ew çağ, é bê zanîn qîymeta zîman u fesahet u beyan.

Béle geli birayé heja u delal! Sehl é kuré Sa’d dîbêje, Xweda jé razîbe, “Resulullah (s.a.v) gotiye: “Her kî wé zîmané xwe u ‘ewreta dînav du şeqê xwe ji şerrê bîparéze, muhefeze bîke, ezé ji wî kesîre bîhîştê sewgîrand bîkîm u bîcî bîkîm.” (2) Resulé Xweda rast gotiye.

Nexwe gîhajtîna nivê bîhîştê bî zîmane, parastîna zîman ji şer u neqenci u xerabîye nivê bîhîştêye. Mîrov karî bêje fesîdantîna zîman yan emelkîrna zîmanî bî şer u neqenciye nivê dojeheyî ji. Dîbên tîştê go mîrov dike qerfok zîmane.(3) Ew çax beri herkesî lazîme ko dozdvân u de’wetvân qîmeta zîman zanîbîn u zîmané xwe bîparézîn ji mûnkerê. Him beri herkesî ew zîmané xwe bîkîn ‘abîdek u atî’ek nekîn ‘asîyek. Zîmané xwe bîkîn şîr u şekîr u weke çewa moz gül bî gül dîgerî u hîngîvê ji lûbba wan gula çédîke. Ger kesê de’wetvân ji wusa ji nav peyvîk u beja lubba wan bîde hev dî dilê xwe bîke

hîngîv, pîşra dî camekan u raxîsteka dilde wan raxéne.

Péşîya lîser bandora zîman gelek bêje gotîne, jîwan çend heba dîxwazîn bî wer em parbîkîn.

- Zîman ji şûr tûj tir e.

- Bêje heye qut dike herba, bêje heye jédîke sera

- Bêjeyê tenîk ji şur tuj tîre, mertalê te tunebe jé durbe (4)

Eré madem zîman sebeb u sedema herba u haşîtiyê ye u madem bêje ji şur tuj tîre ew çağ çewa me beri wêjî got gerek bêja me lûbba bêja bîn. Tu mîrov ji bêje xweşîk u rînd ne acîzîn, Fîrdewsî dî vé babetê wusa dîbêje: “Kesê bêjê xweşîk bêje, bêjê nexweşîk nahîsêne”

Disa hatiye gotîn: “Wek her dem, bî heskîrîn u zîmanek xweş/Mîlletê jar u bîndest, é bîbîn dîlgeş”

Yané fetha dîla bî zîmanek şerîn u şekîr e, temamá mîrova hember peyva ji dilê safî mat dîbîn. Bes go peyvê te nermîk u xweşîk bîn. Madem wîlo ew çağ pîvana bêja xweş u zîmané şîr u şekîr çîye? Hezretî Ebu Bekîr, Xweda jé razîbe, dî vé meselê de wusa gotiye:

“Pîvana peyvandîna xweşîk, bî terkîrna peyvên bêhewce ye” U disa gotiye: “Ew gotînen ku ji bo Xweda nayn gotîn, tu xêr dî wan da tune!”

Yané birayé delal! Peyvê ji mer nehewce be em terkî bîkîn u ji wan bîqerîn, ger lazîmbî em bî peyvîvîn ew çağ ji bîla qe peyvême u peyvandîna me jîbo Xwedayê teala be. Ew çağ peyv u gotîné me şîr u şekîr be. Dîjane dev ji acîzbûna mîrova berd jiber go peyvête é hewcebîn, wé mîrov balte ve bîherîkîn. Him wexta mîrov jîbo Xweda bîpeyîve u bêje encex îblîs u hevalê wî jîwê peyvê ‘acîz bîn.

Xweda me bîke ji kesê zîmané wî şîr u şekîr, me bîparéze ji peyvê zêde u bêhewce.

Spartî Xweda bîn, Xwedayê teala yar u alîkaryê me teva be. Âmin...

1-Nubîhar a Şéx Ehmed é Xani

2-Kitab-ül istîzan-Sahîh-i Buxarî

3-Sadî

4-Mewlana Celaleddîn é Rûmî

HINEK HESBÎHAL

Bî navê xwedayê ku Rehman u Rehim e

Ĝeyret u fedekariya mü'mina her daim bî xêr u bî bereket e. Wexta ku ğeyret u fedekariya bî iklas bê, u ji bo rîza a ilahi bê u wexta ku armanç, 'izzeta islamê u ehkâmê xweda be, bê şûphe muvaffaqiyet muqedder e. Çewa kû üstadê me Se'id ê Nursi dî yek risale a xwe de gotiye: **"Ku iklas dî kufre da ji be, semere dide"**

Ev destpêka ha, me jiber çî got; Elhemdulillah idi em bî kurmanci karin dengê xwe bî gîhinin milletê meyi dindarê Kurmanc. Em zanin zîman ticari ne ğayene. Belki ji ğaya re wesilene. Bes jîboy ku insan karibin hevdu xweş fêhm bîkîn, merama dilê xwe bî heqî bî mîxatabê xwe bîdine fêhmîkîrîn şertîn. Wesile, ku xîzmetê ji islamê re bîkîn qîymetê wan heye. Wekîdî qîymetê wesila nine.

Ev imkaneki gelek xweş e ku em karibin hînari u jiyana dinê islamê, cewherê Qur'an a Furqan bigîhinin milletê meyi ti u birçî yê bîbal heqîyê ve. Jîber vê em hemd u şîkrê Rebbê xwe dikin. Bî izna wi emê **şukr u fedekariya xwe liser sunnet a sehîh** zêde bîkîn.

Wexta ku em li halê xwe u milletê xwe dî meyzênin em du tîştî dîbinin. **Yek jê**; xîrabuna millete ku ketine nav fîsq u fûcurê da. Ji ehkâmê xweda dur bune. Bîbal Xweda u dinê Xweda ve, u bî bal 'aqîbeta insan ku axirete, tî ğem, tî keder, tî tîrs, tî dert nemane. İblîsê le'in, dî singa me u kewmê me da xencera zewq u sefayê çikandîye. Bî vî çî'vî wexta ku em dî meyzênin, ümmeta islamê liber sekeratê ye. İnsanê mü'min u aşîqê heq u 'edaletê ji dînav ğem u kedera de ğerqî bune. İnsanê dîz, eşqîya, fîsqî u şehwetperest ji bune mir u wezir dî vê 'erda muqeddes da.

Tîştê diduwa ji; 'elamet u nişanê mîzgîniyê ji xwiya dikin. Çewa ku wexta şev tam dibe tari, küfr u zulüm qewî dibe. Sîterka sîbehê ji tavêje. Fecir nêzik dibe. Da'vetvanê islamê, kârwanê heqîyê **ji zu de bî ré** ketine. Şop u rêya wan aşîkar buye. Tu bî ki mîli ve dî meyzênê xebat u xîzmeta İslamê tê kîrîn. Qur'an tê xwendin. 'Eyni weke dewra se'adetê, bî ayet u hedîsê Resulullah(s.a.w) tê mu'amele kîrîn.

Wexta em li vê xebat u ta'lîma İslami dî meyzênin hinek wesîfne ku gelek kêfxweşiyê çêdîkîn tene xwiyakîrîn. Lewra ev xweyi derketîna li islamê tê kîrîn, ne 'alel'ade ye. Ne bî nezaniye. Bî hostayîke mezin tê **kîrîn**. Bî 'îlmeki kur,

bî feraset u bî basireti tê kîrîn. Tî dibê belki Resulê Xweda bî zatê xwe vê **xîzmetê** lev rast dîke. Ümid u hêviyekî gelekî mezin çêbuye ji bîndest u feqîra re.

Xwedayê Xalîk, dî ayetekê da dibêje: **"Bera cema'etek ji we hebun ku emrê bîbal qenci u başiyê ve bîkîn. U men'a ji nebaşi u münkera bîkîn. Yê ku bigîhin xelasya heqîqî ehlê vê cema'etê ne...."** (Al-i İmran, 104)

Em hemd u senayê Xweda dikin. İro ev emrê wi bî heqî bî cîh hatiye. Ev lutf u ihsana Xwedaye. Ĝeyret u xwedan a ğeyretkêşa ye. Sebr u tehemmûla ehlê zîdana ye.

Em tîşteki dî ji dîbinin ji vî halê xwera; em zanin lazîme em hê mesafeke dirêj bîstinin. Berê xîzmeta xwe fereh bîkîn. Da ku temamê millet, her derê heyata içtîma'î bîde ber xwe. Dîvê em destê xwe bavêjin her ferdê ji gund u bajarê xwe. Yani keyfîyet u xessa yê mücadela me gereke tam qaim bibe, wesîf bîstine, kok u şağ bîde. Çawa ku lazîme mü'min temamê deriyê güneh u münkerata liber xwe bigre, 'eyni bî vî şekli lazîme em temamê deriyê ifsada, menba'ê münkerata liber milletê xwe, genc u zarokê xwe bigrin, nesla nu ji niyetê xerab, ji exlaqê xerab mîhîafeze bîkîn. Dîvê yek rê nemînin ji bo ehlê fesadê.

Wexta em li tarîxa İslamê dî meyzênin, insanê da'wetvanê ku millet îslahî kîrîne, bî İslam 'izzet belav kîrîne, dî cîhê zulm u tarîtyê da 'edalet danine, dî wan insana de wesîfne aşîkar hene. **Wesfê ewil dî wan de**; her daim nêzîki Xweda bun. Zane bun. Qeweta xwe ne ji xwe, ji Rebbê xwe zanîbun. Bî vî şekli müsteheqqê ihsana Xweda bun. Du rojê wan ne weke hev bun. Her daim xwe nu dikîrîn. 'İlmê xwe, 'îbadetê xwe, xîzmet u fedakariyê xwe nu dikîrîn. Lîgor wan dawîya 'îlmê, dawîya kemalê, dawîya teqwayê nebu. Heta ku xwuda ji ew bî ğalîbiyet şeref kîrîn...

Dî tecrûba de hatiye dîtin, ihtîyaca me gelekî bî wî wesfê wan heye. Dîjîmînê meyi mezin, ne kafîr, ne münafîq, ne fîsqî u hevalê wanî. **Dîjîmînê meyi mezin**; ku em xwe nü nakîn. Ne du rojên me, belki salên me 'eyni derbas dîbîn. Belki em bî paş ve dîçîn. Ev ze'af u kêmayîkeke mezin. Dîvê em dî vê meselê da ğeyreta xwe zêde bîkîn. Em zanîbîn ku em xwe nü nekîn, tî cari em nabîne layîqê ihsana Xweda. Xweda alîkarê mütteqîya ye. Selama wî ji lî ser wan be...

Fexreddin
Şemrexi

Êzingên xwe hun bi xwe hur bikin,
wê mun du cara germ bibin



KIJA PIR ŞÊRIN E?

Geli şekir u şêrin perwera u xwendevana!
Deka bêjin kija pîr şêrine jî vana?
Gezzo u şekir yan dîms u bastêqa nav bedena
Diyarbakır,
Hingûv u helaw a Dihé, yan avnar u isota Rihé,
Qedayifa Bingola Çebeqçur, yan beqlewa Intaba lî başur,
Gilyas u nokşekir é Mèrdini, yan tiryé taifi u
Mezroni,
Mewij, gühij yan berru u şambelota liser agir diréj
Qitiw tiroziya werz u bistan yan posteçala zivistan
Şerbet u leymonata malé, yan beni u bihivé xelata
sersalé
Bilbızéka adaré, pivoka bîharé yan kerenga ber
girar u savaré
Ka çîma? Ma tîşté jivan şêrintir heye?
- Heye! Heye lé bi çî hawîye?
Gelo séva sori qeşarti yan hirmiyé gîhaştî, yan
xoxa qelaştî, yan jî bihoka biraştî
- Nej vanaye, nej vanaye...
Lé zebaşa sori kürr; yan petéxa zer u hur; yan jî
eşbabi u riçala mişmişa tîrş,
- Nej vanayé jî...
Qasi vana şêrin... Heye tüne muz u kiviya
Ekvatore, yan güza Hindistan, hijira Singapore
- Ez dibéjim nej vanaye jî...
- Ev çiyé? Ne tà'm tîrş u şor e, ne reng sor u mor e
- Ka lî kija bajar u dor e? Dewere lé bigere...

Dibéjin rojeki rebenek, dilé wi pîr diçe şêraniyê. Le
bî desté wi nakeve. Dil u cigarê wi liser şêraniyê
dişewite. Dî vi xwestinê de ewqas şerpeze u bêçare
dibe, nîzane ewé çî bîke. Hew debar dîke. Radibe
wesiyeta xwe dîke.

Dibêje: "Heger rojeki bîmrîm bîla ava mîni

şuştinê, dîmsa Mèrdini bè, sabuna mîn kesmê Erğani
be, kefenê mîn bastêqa farqini be, bendîka kefenê
mîn, benniye Nîsébini be...

Maşaallah! Rebeno jî şêraniyê ne pîr, bî 'ecêbki
pîr hîskiryê. Ewe ku xwe di teştâ kewda dîms u xwe
dî sîtila pelul u helilê danekiryê.

Bîla henek u derz livir be, lè şêraniya lî dinye u
pîştî qebrê hey pîr xweşe heger bîdest bîkeve. De ija
tîşté lî dinyê u lî axretê hem şêrin hem xweş ka çiyê?
Heye tüne we pè derxîst. Qey ne razibuna Ellah u
eşq u cirantiya Resulullah e?

Hey sîhheta we jî xweş be. Lé peyv u kelam, bî
selat u selam. Lî Muħemmed'ê rehberê dinê İslam
xweş dibe ciwan u zîlam.

Ne ser ava zozana, ne helbestê hozana, ne fistîğê
kîzwana weka Muħemmed (a.s) xweş u şêrin nabe.

De ka disa bêjin: Şekir xweş e, şêrani xweş e, lè
İslam u Qur'an ne xweştir e?

Helaw şêrin e, hingûv dihêlin e, mast dimehin e.
Le eşq u nura Muħemmed ma ne şêrinê şêrine, ma
ne mîzgine?

Dostu rehberé me Muħemmed e (a.s)...

Evin u azadiya me, bî da'wa Muħemmed e(a.s)...

Hêvi u armanca me jî xweda, azadi u zafera
ümmeta Muħemmed e(a.s)...

Deka em selawat binin lî hebîbê Muħemmed

Xweda mej hîskîrna wi qet neqetin bî ebed

Me bîghine rêya wi, rêya heqq u 'edalet

Çalîb u muzaffer be, ehle iman u ümmet

"Lé pîştî peyv, jîdev derkeve, êdi ew kes dibe
hêsirê peyva xwe." Xweda me jî rastiya rasta, me jî
iman u dostî neqetine. Dost xweda ye, xweda dostê
rasta ye. Dest u dostaniya rasta jî bo xweda, dîghijine
razibuna xweda.

QUIDRETA XWEDA

*Dı heyama civineké de ji Necip fazıl pırsine:
“Gelo xuda dikare Devê dı Qulika derziyê de derbas bike?”*

Necip Fazıl dibêje: “belê; dikare.”

Lı ser vé disa jê pırsine:

“Gelo xuda wê devê bı çuk bike yan wê qula derziyê mezin bike?”

Necip Fazıl lı ser qudreta xudayi bê dawı vé cewabê dıde:

“Xuda ne devê bı çuk dıke ne ji qulla derziyê mezin dıke. Çawa sitêrkê lı asimana dı bibıka çavê te de bı cih dıke; devê ji wê dı qulla derziyê re wuha derbas bike...”

ŞEYTAN WESWESÊ DIDE KÊ

Rojekê ji Resül é Xuda té pırsin:

“Ya Resülellah! Gelo şeytan weswesê dıde kê?”

Resülê xuda vé cabê dıde:

“Dız tücaran nakeve mala tışteş dı hundırê wê de tune be.”

ZAROKÊ BAZ DIDE CAMİYÊ

H.z ‘Umer (r.a) daim zu dıçu mızgeftê. Rojekê disa zu çu mızgeftê, dit ku zarokeki bıçuk bı bazdan té mızgeftê. H.z ‘Umer gote wi: “Kurê mın çıma tu wuha bı bazdan té mızgeftê?”

Zarok go: “Ez dıçıme nıméjê wextê nıméjê néz buye.”

H.z. ‘Umer: “Kurê mın tu hé bıçuke, nıméj lı ser te ferz nebuye.”

Zarok go: “Bıçuk u mezinbuna vi işi tuneye. Lewra doh zarokeki ji mın bıçuktur mır.

Gotinê vi zaroki pır tesir lı H.z. ‘Umer kır, wi da giri u piştire go: “Ya rebbi! Ev zarok çıqas jir u zana u bı aqıl bu.”



Hevpeyvîn: Necat ÖZDEMİR
Foto: Abdulbaqi ARSLAN

LI SER KURDISTAN A BAŞUR A IRAQ Ê Bı mamoste TEHSİN İBRAHİM DOSKÎ RE HEVPEYVINEK

Xwendevanên héja,

Me li ser rewşa Kurdistan a başur di heqê huner, ol u medresan de bi niviskar **Tehsin İbrahim Doskî** re hevpeyvînek lîdarxist. Em hevîdarîn go ev hevpeyvîn bibe wesîla hişyari, naskirîna birayên xwe yî li Kurdistan a başur u bratiyêke heqîqî li ser İslam a şerîn.

Brayê ezîz suala mey peşî, 'ewwul naskirîna we ye. Hun dikarin xwe bi me bîdne naskirîn?

Bismillahirreḥmanirreḥîm. Elḥamdülillah, wesselat u wesselam u 'ala resulillah we 'ala alihi we seḥbihi... Destpêkê ez sipasiya xwe biwe eşkere dikim li ser vê hevpeyvîna han. Xwedê xêra we binvisîne. Navê min **Tehsin İbrahim Doskî** ye. Ez li sala 1970'yî li bajarê Dihok'ê hatime dunyayê. Xwendina xwe yî destpêkê em dibêjin ibtidai-seretai- min li Dihok'ê xwendîye. Seretai ya İslami. Evya 6 sal e. destpêkê xwendina min ya dini buye. Mekteba ḥukûmî é resmi. Difda min her wisa sanewî ji. Ev ji 6 sal e. Jêra dibêjin "Sanewiyetîn

Diraset'îl İslamiye" Jî Pîştî min sanewî xilas kir ez çume Beğdayê. Li wê derê "Kulliyet-ül Şeri'e" heye. Li wê derê jê re dibêjin "ilahiyat" Li Beğda Kulliyet-ül Şeri'e di sala 1991'ê de min xilas kir. Pîştî xilasbuna Kulliyê min bi muderrîstî dest bi dersdayîne kir li bajarê Dihok'ê, li sanewîya, li ma'heda... Li vir "Lise" jêre dibêjin. Heta niha ez tedrisê dikim, ez muderrîs im. İxtîsasê min ji zîmanê Erebi ye u terbiyet'ül İslami ye.

Jî bîlî wê me medresek ji heye li Dihok é. Wekî medreseên berê ye. Medresa melatî yê. Dersên Mantîqê, Usulê, Neḥw é.

Li gor usulên medresan jî, wê 'ilmê xwe xilas kirîye?

Min liba hînek seydayan xwendîye. U icaza melatîyê ji wergirtîye. Min icaza xwe ji Mela Ḥemdi stendîye. Ev ji dîghîje Mela Eḥmedê Zaxoyî yê ku bi nav u deng e, meşhur e.

Hun dikarin di heqê kitêb u pirtukên xwe de xeber bîdîn? Me agahdar bikin...

Belê. Min kitêbên xwe bi zîmanê Kurdi u 'Erebi nivîsandîne. U Diwaneke minî şîrê bi kurdi heye. Bêhtir di canibê dini de ez dînvîsim. Yanî kitêbên dini bi zîmanê Kurdi. U herwisa di derbarê tarîxê de jî, min nivîsandîye. Hinêk kitêbên tarîxê min teḥqîq kirîne. Li ser zanayên

Kurd, Şa'ir u Ediban ez dînînsinim. Yani bêhtir di canibé Edebi, Dini u Tarixi de ez bî zîmané Kurdi u 'Erebi dînînsinim.

Hun dîkarin ji hînek kitêbên xwe numune bîdînin?

Yekemin kitêba minî hatiye teb'kirin di sala 1992'yê de bu. Navê wê kitêbê "Elhafiz'ül 'Iraqi we eseruhu fi 'ilmi-l Hedîs" Zeynuddin-ul 'Iraqi zanayeki Kurd é mezîn bu. Bî nav u deng e. Mamostayê İbn-i Hacer-ül 'Esqelani ye. Seydayê wî ye. Kitêba minî yekemin ev bu u lî Su'ûdi(Hicazé) hatîbu teb'kirin.

Lî ser tehqîqatê tarixî kitêba "Tarix-ul Mardin" ya muftiyê Mérdin'é Ebdusselam Mardini min tehqîq kirîye. "Tarix'el Ensab" ya Miré Şerwan Mir Salîh bu. Dî heqê tarîxa mirên Şerwan deye, me tehqîq kirîye. Herwisa "Divana Melayé Ciziri" min tehqîq kirî. Şerha Şex 'Ebdusselam é Ciziri lî ser Diwana Ciziri buye. U kitêbeke min bîxwe danaye lî ser şerha diwana Ehedé Xani ye. Navê wê "Cewahir'ül Me'ani" ye. Kitêba minî axir jî lî ser zanayên Kurd e. Sé cîld e. Ew lî Bêrud'é nu teb' buye. Çayeta me ewe ku em zanayên Kurd bî brayeki mey 'Ereb bîdîn nasin. Wekî tékiliyeké, hevdu nasineké. Lewra Xwedé emrê me bî "Te'arefu" dîke. Em jî dixwazîn wan zanayên xwe yî ku xîzmeta Dîni u İslamî kirîne her jî kevin heta niha bîdne naskirîn.

Mamoste ez dixwazim jî we bîpîrsim da hişyariya weyî İslamî jî kur té?

Em dînav malbateke dîndar da mezîn bune. Bapîrên min mela bu. Xalên min, mîrovên me pîr mela té de hebune. Jîber hîndî jî bîçukati lî mîzgeft u medresên dîni em rabun. Duri jî siyasetê u van mesailên dîn. Jî bîçukhati dî camî'êke dîni de em dijîyayîn. Dî zaroktiya xwe de jî em çune medresa, mel medresé dîni xwendîye. Heta axiré kulliyé 16 sala xwendîna dîni me wergîrtîye. Herwisa lî mîzgefta jî me ders lî ba Seyda u mela xwendîne. Lî Kurdistan a 'Iraqué zîmané 'Erebi belav bu. Me zîmani 'Erebi dixwend. Téklîya me her lî ser Erebi u Qur'an u Hedîsên bu. Masdariyeta meyî İslamî her lî ser zîmané 'Erebi buye. Jî sala 1992'a heta niha bernameyên minî dîni hene dî Radyoya de, Televîzyona de. Jîber vé elbet é tekîliya me dîgel şerî'et u dîn de hebiye.

Aniha jî bernameyên we dî radyo u televîzyona de hene?

Belé. Dî televîzyona mehellî a Dîhok'é de heye. Dîhok Tv. Bernameki heftane min heye. Bî navê "Bernama

baweriyé" ye. Ev bu 16-17 sala bernameyên min car dî radyoyan de carna jî dî televîzyonan de hene. Dî Radyo Dîhok de demêke dirêj min bernameyêke heftane teqdim kir. Dî radyo yekgîrto de bernameyên min çêbu. Qenaleke lî Beğdadé ku qîsmeké wê bî Kurdiye bernameyêke min té de heye.

Lî Kurdistan a Başur ciye 'ulema é islamé dînav mîllet de çîye? Hurmeta wan bî çî suretî heye?

Heta salên 1950'ya jî zana dewreke mezîn hebûye. Medrese hebun, ders dixwendin. Lî ser usula melatî yé. Heta sala 60'a jî medrese lî ser usula kevin hebun. Pîştî hîngî hukûmeté ev medrese nehéland. Hukûmeta 'Iraqué xwest mektebét resmi veket. Lew bîç bîça medrese kém bun. Jîbet î'tîbar bî şahîdu u icazeyên medresa nedîhate kirin. Tewzîf nedîbu. Jîber vé zarok çune medresên hukûmî. Bîç bîçan medrese kém bun. Her çende neku nemaye. Zana jî kém bun. Zanayên ku icaza bîdîn u melatîyeke mezîn bîkîn... Bes ne me'nawé nemayîne. Heta niha jî lî Kurdistan a me icaza dîdîn. Lî Dîhok, Erbil u Sîlêmaniyé medrese hene.

Belé hukûmeté medreseka dîni ya hukûmî vekir. İbtidaiyel islamîye, sanewiyel islamîye, Kulliyat-uş şerî'e... evê jî te'sîr lî ser medresên kevin kir. Wek ilahiyata véderêye belé ihtimama 'ilmé dîni bêhtir e. Ew jî jîber zîmané me 'Erebi ye.

Her jî şeşî yek medresa dîni dixwîne. Hemu 'îlim dixwendîn. Wexta dîçune kulliyé jî wan re dîgotîn mela. Wexta kulliyê xîlas dîkîrîn ew dîbune mela. Jîber vé icaze gelek khém bun.

Mamoste İhtîram u hurmeta mîllet jî ehlé 'ilmé re çawa ye?

Belé pîr heye. Cîvaka Kurda lî hemî cîha wîha ye. Lî başur, bakur, rojhîlat u rojava. Kevin da Kurda ihtîrameke zéde jîboy mela dîgîrt. Bî çavên teqdîsê beré xwe dîdane mela. Lew ev ihtîrama hané her maye. Kém buye belé disa ihtîrama mela u şerî'etê u 'ilmé dîni her maye. Ev nabéjim wekî beré.

Lî aliyé me dî sulha mîllet de cîheki 'ulema yî grîng heye. Lî wir çawaye?

Cîh heye. Dî sulhé de ché 'alîman heye. Heta ev ehzabên siyasi, ne é dîndar jî, heré jî wan lîcnayek heye ku jé ra dîbéjîn komalayatiya cîvaki, eger buyînek lîhevkeftînek çêbîbe wexta bîxwazîn sulhé bîkîn dixwazîn yek dudu heb mela té da bîn. Çîku hercar xelk bêhtir guhé



xwe didéte mela. Heger neyaretiyek, xwundariyek, tıştek çébibé, mela dikeve nav wan, tebi ihtirama mela ji ya her kesi béhtir e. Heta ehzabén nedini ji gelek cara mecburîn ku di sulhâ xwe de herne bal melayeki. Da millet guhdari liwan bike.

Teriqetén lî Kurdistané xebat dîkîn kine?

Du teriqetén mezin hene. Terîqa Qadiri u Neqşebendi.

Bî navén xweyi iro kijan hene? Siwané wan ev terîqet in belé navé wan é iro bî çî şiklî ye?

Lî nîk me tekya hebun. Mesela Tekya Berzan ku neqşebendi bu. Tekya Bamerné ji Neqşebendi ne. Tekya Teleban qadiri ne. Belé bî Qadiri u Neqşebenditiyé téne nasin. Bes pîr kém bune. Dî civaka me de kesén béjin em Neqşebendi yan Qadiri ne pîr kém bune.

Şéxén Berzenci ku lî devera Silémaniyé hene bî nav u deng in. Tekya Birifkan heye, Şéx Nureddin é Birifki. Tekyek lî Dihoké hebu bes niha nemaye.

Rewşa medresa lî Kurdistané çîye? Rewşa wani abori, ekonomik, nérinén rejim u serekatiya Kurdistané lî medresa?

Rewşa medresa ze'îfe gelek. Wek me behs kir. Sebeb ku hukumaté îtimat bî icazén wan nedîkir.

Pîştî 1988 heta neha ve, pîştî "Enfal" çébu, gundé me xerabun medrese pîr kém bun. Lewra beré lî her gundi medrese hebun. Pîştî Enfal é gund xera bun, millet hate bajaran medrese pîr kém bun.

Medrese vé gavé mewcud in bes ne bî şikleki ku mirov dixwaze. Jiber mektebén hukûmî yé dini hene kém bune. Ewqaf, Kulliya Şerî'eté dî nav millet de medrese kém kirne. Bî taybetî lî mîntîqa Dihoké herî herî kém in. Lî Erbil u Silémaniyé heta hedekî rewşa wan xweştir e.

Lî mektebén Kurdistané dersén dini hene?

Medresén taybet yé dini hene. Ji bili sanewiyén dini 3 kulliyaté şerî'eté lî Kurdistané hene. Lî Erbil, Kuwe u Silémani ne. Ji bili van du-sé "Eimme wel Xutaba" hene. Medresén dini yén hukûmî lî Dihok, Silémani u Zaxo hene.

Dî mekteban de dersek heye jér dîbéjin "Terbiyê islamiyye" Ew heftiyé du ders hene. Muderrisén wé dersé ji lazime ji Kulliya Şerî'eta xilas bikin. Dersén dini u zîmané 'Erebî lî mekteban heye. Berî hukûmeta Kurdistané ji ev tîşt hebuye. Anîha dewam dîke. Dî dema Seddam de kulliyetêke Şerî'eté bî tené lî 'Iraq hebu ew ji lî Beğdayé bu. Anîha lî Kurdistané bî tené sé kulliyê hene.

Dînav milletén go dîbîn dewlet nijadiperesti, 'esebiyeta milli zéde dibe u dewleta wani milli welew muarizé îslamé be ji té hebandin. Lî Kurdistané rewşa çawa ye? Dînav millet de nijadiperesti zéde buye?

Lî Kurdistané dî civaké de, kevînan de dujminatiyêke

dîni nehatiye kirin. Şeré lî hember Kurda hatiye kirin ne şerêki dîni buye. Jiber qewmê wan zulûm lî wan hatiye kirin. Jiber vé hereketén lî hember wan rabune, ne hereketén dîni ne. Mela Mustafayé Berzani çîkas mela bu ji hereketa wi hereketeke qewmî buye.

Dînav hukumaté de u dînav milleti de muta'assîb hene. Belé ez nîkarim béjim lî Kurdistané teyideke dîni heye weya dujminatiyêke heye. Tékel e. Hînda mirov hebîn ihtîmal mela bîn belé milliyetê xwe pêş xî. Bes bî rengêki gîştî 'am hukûmata me qewmîyeté peşve dixê. Dînav millet de ji qewmîyet béhtir buye.

Belé hemasa dîni lî Kurdistané ne lî başur bitenê, lî hemu ciha, zédetir e. Jîbov tu bîzani millet digel dîni ye ne digel qewmî ye ezé numûneke basit binim. Berî salekê jînek ézîdî 'elesas digotîn musulman bubu. Ézîdîya ew kuşt. Jîber musulman buye. Lé milleti tev da xwe ne razi kir. Heta ézîdî deréxistîn. Yanî hemaseka dîni mezin çébu. Negotîn Kurd in. Hemasa dîni dî hemu civakén Kurdan de berî ya millî ye.

Heta biradereki nuktek ji mî re got. Lî Stenbolé yekî Su'udî té pîrsyara genceki sebağ-yani kesé ku pêlava boyağ dîke- dîke dîbéje "Ma tu Turk î?" Genc dîbéje: "Na! Ez Şafî'î me." Negot ez Kurd im. Got ez Şafî'î me. Ya'ni bî me'na dîn pêştîri milliyeta wi ye. Dînav Kurdan de dîn her daim lî pêş e.

Belé meseleyêke me heye ew ji ev e ku zextêke qewmî lî ser me heye. Gelek kesan dixwazîn ku wucuda me nebit. Wucuda qewmî. Tu dîndar be ji madem tu Kurd î, ihtîmale dîndarê dîn bî çaveki dîn lî te dînére. Îcar dî vi haletî da té çî béjî? Té béjî madem dîndariya mînan ez negîhandime ku ew dîndar ihtirama mînan bigîrt ihtîmale bibe qewmîyetperestek. Muşkîla me ev heye. Gelek caran biraderén me yé Ereb évê dîndar zexté dîkîn lî ser me, çînkî em Kurd in.

Mamoste, yeqîniyêke me wîsa heye, weke Bedî'üzzeman îfade kirîye, heger Kurd nekevne nav 'îlleta 'esebiyeta milli ya cahîlî, nijadiperestiye nekin inşâallah ewé bibîn wesîla ittîhâd u yekbuna civak u milletén îslam é. Weke civaka 'Ereb, Turk u Faris. É bibne wesîla yekîti u biratiya van milletan... Lewra civakén ummeta îslamé yî herî mezin u zéde ev millet in. Yekîti u ittîhâda wan jî dibe ittîhâda ummeté.

Dînav van civakén mezin de civaka ku nebuye dewlet u bî 'esebiyeta milli ya cahîlî bî milletén dîn re herb nekîrye u zulûm nekîrye Kurd in. Her daim jî mezlum mane. Bî vé nasnama xwe heger heq qen lî îslamé xweyi derkevîn ewé serkeftîneke mezin lîdar-xîn. Hem kurd dî nav van civakén mezin u pîr de belav bune. Jîber vé inşâallah é bibne wesîla ittîhâd u yekîtiya wan...

Her dema ku Kurda xwe bî îslamé ve gîrtî wé bîserketî. Mesela numûna Selahaddîn. Dema Selahaddîn hati Kurd buye bes bî navé dîni kir, milleté dîn jî ketne bîn

desté wi. Vé gavé ji eger bî navé dini bî axîfîn, her milletek 'Ereb ji, weke Îmamé 'Umer é kuré Xettab dîbéje: "**Neñnu Qewmen e'ezzenellahu bil İslam**" ya'ni em qewmeke wisa ne ku lî xweyderketîna İslam é em 'eziz kîrîne. destberdîna islamé em zelil kîrîne. ev gotîna imam é 'Umer ne jiboy Ereba bî tené ye. Boy Kurda, Boy Turka ji wîsaye. Wexta em bînavé islamé bîaxîfîn dunya hemî dîbîn desté medeyî.

Dîbéjîn milleté Japon pîr xwendaye. Dî her hal u ehwalén xwe de xwe bî xwendîn u tîştêki bî feyde meşğûl dîkîm. Lî Kurdistan'é rewş çawa ye?

Lî nîk me ew nîn e. Kém e. Kitéb tène kîrîn belé ne bî şîkleki bî dilé me. Gelek meselén hene xelk ji xwendîné dur xîstîne. Mesela İnternet, fadaiyata qanatén 'ezmani(uydu) meşğûlbuna xelké bî meselén iqtîsadî u aborî ve, feqîrî, şer... Ev hemî xelké ji xwendîné dur dîxîn. Jîber hîndé xwendîn lî Kurdistan'é tîştêki neyî belav e wekî ciye dîtin. İhtîmale kém tu kesekî bîbîne lî ciyekî runîştîye u dîxweyne.

Pirtukxane u çapxane pîrîn?

Pirtukxane(kitapxane) nîha pîr bûne. Pîştî 2000'a védetîr. 1995'an de dest pékîrîn. Dî dema Seddam de çapxane lî Kurdistan'a nébun. Bes yek lî Erbil'é hebu ew ji ya hukûmî bu. Pîştî seddam nemayî lî Kurdistan'é çapxane dest pé kîrîn. Vé gavé lî Dîhok'é ihtîmale çapxane 3-4 behtîr hebîn. Her çenda Dîhok bajarekî bîçûke ji. Erbil'é gelek hene. Lî Silémaniyé hene. Çapxane zéde bûne. Kitéb zéde teb' dîbîn. Bî Kurdi, bî İngîlîzî, bî Turki, bî Erebi...

Pirtuxane tékel in. Yén dini ji hene yén ne dini ji. Anîha lî Kurdistan'é kutubén dini ji hemîyan béhtîr belav dîbîn. Xasseten eger bî Kurdi bî. Çînkî millet vé gavé idi ji Erebi dur ket. Lewra tu ji kesekî xwey kutupxane bîpîrse béje çî kutup ji hemîyan béhtîr sarf dîbe wé béje kutubén dini. Çî bî

Kurdi be u çî bî Erebi be.

Telifatén dini rewşa wan çîye?

Telifatén dini bî soranî zehf hene. Tène wergerandîn ji Erebi. İhtîmale vé gavé mekteba soranî, Kurdi u dini dewlemend bî.

Bes canîbé meyi Kîrmancî bejîm, Badîni(Behdîni) pîrt khém e. Yanî ez dîkarîm bêjîme te; du kesan keski heye tîştén dini bî Kurdi dînvîsîn.

Kitébén Üstad Bediüzzaman, Seyyid Kutub, Hesen-el Benna, İmam Humeynî, Mewdudî hatîne wêşandîn bî zîmané Kurdi?

Dî Soranî de hînek ji wan heyîn. É Bedî'üzzeman hene. É sey-yid Qutub ez nîzanîm. Mela Osman tefsîrek mîna-weke- Fizîl é çêkîrîbu ew heye. Kutubén Hesen el-Benna bî Soranî belkî hebîn, belé bî Kurmancî nîn in.

Bî Kurmancî Kitébeka Mela Se'îd mîn wergerandîye Kurmancî. Wekîdî bî Kurmancî tunîn.

Disa lî gor ez dîzanîm kutubén İmam Xumeynî nîn in. Tesîra wî nîn e.

Mamoste, Xweda ji we razî be. Em pîr memnun bun bî vé hevpeyvîné re. Axaftîna we yî dawîn çî ye?

Axaftîna mîn a dawîn ez dîxwazîm peyvendî u 'alaqat me gerek hebîn, dînav Kurdistan a Başur u Bakur. Çînkî hîndî mîrovén hevdu nas bîkîn mîheqqeq nuqtayan xîlafé ji wé khém bîbîn. Heger ez te nasnekîm hînek axaftîn lî ser te béne gotîn dîbe ez bawer bîkîm. Lî ser mîn béne gotîn tu bawer bîkî. Hema em bî hevra runén ewé xîlaf ji khém bîn. Lî Kurdsîtan'é em her dîxwazîn muçtema'ek meyi lî ser İslam'é hebe. Kurdiya bé islamiyetî tu feyda me té nîn e. Eger tu bî Kurdi nebe Dunya te dîçe, eger İslam tune be axret ji dîçe. Em dîxwazîn milleté me gîrédâyî be bî diné xwe ve. U héviya ewe ku Xweda tewfîqa jîbîy xîzmeta vî dîni u xîzmeta milleté me bîde.

Âmin. Xweda ji we razî be...

Her dema ku Kurda xwe bî islamé ve girtî wé bîserketî. Mesela numuna Selahaddin. Dema Selahaddin hati Kurd buye bes bî navé dini kîr, milleté dîn ji ketne bîn desté wi. Vé gavé ji eger bî navé dini bî axîfîn, her milletek 'Ereb ji, weke İmamé 'Umer é kuré Xettab dîbéje: "Neñnu Qewmen e'ezzenellahu bil İslam**" ya'ni em qewmeke wisa ne ku lî xweyderketîna İslam é em 'eziz kîrîne. destberdîna islamé em zelil kîrîne. ev gotîna imam é 'Umer ne jiboy Ereba bî tené ye. Boy Kurda, Boy Turka ji wîsaye. Wexta em bînavé islamé bîaxîfîn dunya hemî dîbîn desté medeyî.**



Ne bê êlîn ne bê olîn
Ne bê tarîx û bê şolîn
Ne bê esl u ne bê fest u
Ne bê çandîn ne jî kolîn
-Mela Mızgîn-

Îslamê

ZIMAN Ê ÇANDE Ê WÊJEYA KURDÎ BÎ ÎSLAMÊ HATÎYE PARASTÎN

Omer Nisêbinî

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

Hemd, jî Xweda ê ko însan jî tinêyî çêkir û şandî dînyayê û rîya heq şanî wan da ra be. Selat û silav li ser peyxemberê me Muħemmed Sallallahu aleyhi we sellem û malbat û eşhab û tevê misilmana ra be.

Îslam jî bo jîna mirova li dînyayê û li axretê bedew bike û dilgeşîya wan pêk bîne, jî alî Xweda ve hatîye şandin. Tu distûr û emr û nehyê wê, nedidîjê vî tiştî dane. Dî Îslamêde distûreke gelek girîng heye ku ew jî eve: Gelê ku Îslam qebl kirin, heke di nav adetê wan de tiştê dijê emr û nehyê wê nebin, wana narake. Dev jî rakirina wan berdin, jî bo ko bipêşve herin alikarîya wan dike û jî wan re dibe piştgir.

Ziman danek jî dana Xweda ye. Nebineqandina mirova ye. Meriv zimanê xwe naneqîne. Dê û bavê

yekî bi çî zimani bişteğîlin yek jî wek van bivî zimani dîşteğîle. Nemafe kesîye ku zimanê yekî bikin bin qeyd u zincîra, zordestîyê bikin û nehêlin bî zimanê xwe xeberdin. Lewra têkîlîya insana tenê biziman çêdibe. Hewceyê xwe bi ziman dibêje. Ziman têkîlîya mirovan bi mirovan re û têkîlîya mirovan bicivatê re pêk tîne. Ziman, diser ferdade sazîyeke komel e û temelê kîmlîka netewîyê ye. Zimanê meriva çibe, yek bi wî zimani têkîlîyê pêk tîne û hêdî hêdî bi wî zimani dikeve nava komela xwe û dibe perçeyek jê. Lewma, cîyê ziman di jînê de zaħf girîng e. Bê guman jî ber vê, nehiştina xeberdana zimanêkî zilmeke gelek mezin e û ezîyeteke zaħf dijwar e.

Dîne Îslamê ti carî qeyd ne danîne ser zimana. Kî bi çî zimani xeberdabin, piştî ku misilman bûne jî bi zimanê xwe xeberdan e. 'Adetê xweyî neğeyrî Îslamî dom kirin e. Şahidê me dîrok e. Ji roja Îslam hatî

heta weke iro, welatê ko hatine fetihkirin û gelê wayî ko misilman bunê heke werine lêkolîn ewê werê dîtin ko em rast dibêjin. Di gotinê me de xîlaf nîne. Ko Îslamê zordestî li gela bikirin e, diva bu îro sê behrê dinyayê bi zimanê 'Erebî yan jî jiber Osmanîya bi zimanê Tirkî xeberbidan e. Lê rewş ne wilo ye. Bi sed salan gelê ko dibin serwerîya Îslamê de mane, xwe bi her tiştê xwe parastin e. Ziman û çande û weje û tiştê wanî negeyrî Îslamî tevek li çîye xwe mane û sitirîn e. Kesî eleqa xwe ji wan neaniye. Evya jî jiber ko Îslam distûra vî tiştî nadêye ye.

Xweda jiber ziman û reng û qewm û tiştê wilo ferqi nexistiye nav maxluqê xwe de. Çimkî ji xwe tev milkê Wî ne. Jiber van tiştan hinek liser hineka bilind û mezin jî nekiri ye. Li cem Xweda miznaatî û bilindî tenê bi teqwayê ye, nebi tiştêkîdî ye. Ji ber vê, dinê ku şandi jî ti carî ferqî nexistiye neqeba gelan de.

Gelê Kurd, jî roja ku misilman buyî heta weke iro ta' deyî ji ti alîyê ji Îslamê nedîtî ye. 'Adet û kultur û çande û weje xwe di bin şemsîya Îslamê de meşandiye û pêşve birî ye. Bi rêzanîya Qur'an û Sinnetê ziman û çande û weje xwe zahf dewlemend kirî ye. Ev hezar û kîsûr sala gelê Kurdê misilman di bin ronayîya Qur'an û Sinnetê de ji her alîyê pêşketî ye û riya xwe şaş nekiri ye.

Bi sed salan di medresande 'ilim, bi zimanê Kurdî hatîye dayîn û xwendin. Di nav vî ilmî de wek serf û nehî û belagat û mantiq û kelam û tefsir û hadîs û fiqh û wek van ilmê Îslamî hebun û wek matematik û felfese û astronomî û fizik û hendese û tîp û wek van ilmê pozitif jî hebun. Mamosteyên van medresa teva ders û fêrê xwe bi zimanê Kurdî didan. Di nav xwendekarê van medresan de ji her gelî mirov hebun. Bi dana van ders û fêran zimanê Kurdî him dewlemend bu him jî

sitirî. Gelek pirtûk û kitêp bi zimanî Kurdî ji teref wan alimê Îslamêyî ko li medresan ders û fêr didan hatine nivîsandin. Di nav van pirtûkê hatine nivîsandin de ew 'ilmê ku me li jorê jimarî tevek hene û iro gelê Kurd ji van îstîfade dike.

Di nav van 'alim û mamosteyan de ê vek Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî û mele 'Elîyê Findikî û 'ellame mele Ehmedê Qoği û Feqîyê Teyran û Şex 'Ebdurrehmanê Aqtepewî û Mevlana Xalid hene. Di van medresan de

bi seda 'alim gihan e. Evê ko me navê wan jimartin yê ko dinav me de navdar bune.

Ji geyrî wan bi seda 'alim hene. Bi izna Xweda emê di pêşde jîna wan 'alima binivîsinin.

Bi xêra Îslam û van 'alimên Îslamê ziman û çande û weje Kurdî hatîye parastin û zimanî Kurdî di tevê 'ilmande hatîye bikaranîn. Bi seda pirtûk hatina nivîsandin. Ev pirtûkê 'ilmî ji alîyê gelek insana vê hatine xwendin. Dinav van xwendevana de 'alimê pir mezin jî hene. Gelek kes bi van pirtûka hînî 'ilim bun û ketine nav mamoste û 'alimê dinyayê. Disa bi xêra van 'alimê Îslamê weje Kurdî, dinav wejê gelê

dinyayên dîndê xwe nîşan da û cî girt. Pirtûkê van 'alimayî ko nivîsandine wek "Mem û Zîn" û wek "Dîwana Cizîrî" weje Kurdî dinav wejê dinyayê de nav û deng da ye.

Êdî heke îro ev mafê ko Îslamê dayî û van 'alimên hêja neyîne dîtin û xebata wan bê avêtin ji geyrî nankorîyê pêve netîstekî dî ye. **Ziman û çande û weje Kurdî bê Îslamê û bê 'alimê Îslamê wek dara bê ra ye. Disa wek mala bê temel e. 'Esil jêre nîne. Em vêya ti carî jibîr nekin; heke iro zimanê Kurmancî tê xebardan û tê nivîsandin evya bi wesila Îslamê û 'alimê Îslamê ye.** Dewlemendîya ziman û çande û weje me, bi xêra Qur'an û Sinnetê û bi xêra 'alimê Îslamê ye. Kî çî dibêje bera bibêje, a rast eve. Divê ti carî em vîya jibîr nekin.

Ez we dispêrime Xweda...

**Ziman û çande û weje
Kurdî bê Îslamê û bê 'alimê Îslamê
wek dara bê ra ye. Disa wek mala bê
temel e. 'Esil jêre nîne. Em vêya ti carî jibîr
nekin; heke iro zimanê Kurmancî tê
xebardan û tê nivîsandin evya bi wesila
Îslamê û 'alimê Îslamê**

MEDENİYETEK ME HEBU

“EZ MÜSLÜMANEKIM, HEVALÊ TAVA KEVNARE ME.
HER TIŞT MIN QEZENCKIR, PAŞÊ TEV JI DEST ÇUN...”

Medeniyetek me (şaristaniyek) hebu. Berya fetisandina di behra xwestekâ debu. Dî lehiya hewa u hewasa de weke qırş u qal u berya xuşina dehlizê şehwetê tari debu...

Berya teqlit kirinê u berya rexne kirina heq u heqîqetê bu. Berya tevlê kirina ava li şîr, berya şekirdana mēşabu, hê berya küfr û xirabi, zaninê gēsp bîkîn ah wê çagê..! Medeniyetek me hebu...

Pîr ji kevn de, insaniyet dî hengama wextê sebitiyê dijîyîni, zeman kher u wehşetê cirit davêt. Çaga ji Rebbê Aztek re salê 20 hezar sebiyên qizkî dihate gori kirin. Gudgudê Roma u Bizans jîbo disa goşt buxun bî pēçiyê xwe. Xwe dîversandî u disa li ser xwarinê diruniştin. Behra insaniyetê şolî bu, ujdân dî quncîkeki de pinisibun. Çaga Hindî 360 milyon Reb, Yunan jî teslîsa çirok dî hebandin, Medeniyetek me hebu...

Ewropa hê nîzanbu paqjî u teharete çiyî, xîrîcîra insanbuna pîrekê dhate kirin hê qîrara ku pîrek, insane yan ne insane ne hatîdan.

Wextê qonseyî Fransa yî dîni dîgot “pîrek insane ancağ jîbo gîzmeta zîlam hatiye xulq kirin.” Insaniyet wek qutubê buzê jî merhametê sar u jî kevir jî hişkîr bu. Bî ber lehiyek ku hetanî bî qâfîkê serê insan şerab veduxwarin ketibun. Medeniyetek me hebu...

Qîblame hê ne gērb, Kâ’be bu me jî hê nehatîbu şuştin, qelb reş nebubun, ujdana zeng negirtibun. Dî bî navê kurtajê sebiyên me hê nehatîbun qetîl kirin, canbazê fikra fîyaqe ne kiribun. Hê tarîx u fikra xwe xîlatî gawur nekîrîbu kheça wî li ser masa qumarê jê ne çubu... Medeniyetek me hebu...

Wextekê medeniyeta bê mim jî xwe re li mimekê dîgeriya, bê guman wê çagê em ‘ezîz u serbîlînd bun. Em derander bun, em hewesdar bun me dîxwend. Cehaletê li hêlkê bîhêlîn em jî bîlîndbuna berhemen xwe yî ramani şaş dîbun, belkî jî em jî wan dîrîsîyan. Ewropayî dî mektebê me de tehsil dîdîtin. Kitêbê ‘âlimê me hebun dî zanîngahê wan de. Bî xwendîna ilmê me cehaleta xwe radîkîrin. Şaristaniya Yunan u Helen dî tercumê me de dîxwendin. Kitêbê hêmi zanê wan hezar heb yan hebun yan tune bun. Jîbo kitêbê me yî bî milyona Seray dîkîrin kitabxane. Kitapxana ser ruyê erdê yî en mezin Beytulhîkme ‘ayidî me bu. Hun jî kîjan hêlê de mêze bîkîn mêze kîn. Medeniyetek me yî bî rewş hebu...

Em ne postevan bun. Bî gîhandîna behremê zanistiyê me dîghand wan karê me ned qediya. Ne bî xweş kirin, ew zanîna ezmunîyî ku pîr tē hefidandin u metodolojîya wê me dît me çêkîr. Ne ya wan, kitaba me bî emrê buxwîn despê dîkîr. Kitaba kafîrê xweyî kitab dî ser kafîrê bê kîtab dîgîrt li ba me hebu. Hem “bî bêjîyan ehlîl kitab “yên wan li jor dîgîrt jî em bun. Yênu ku dîjîmûnên xwe hêsir dîgîrt u li mîqabîl deh kesa bî’elîmîni xwendin u nîvisandîne paşê dîgo ezê we hûr bîkîm. Pêxemberê me yî “ûmmî” bê xwendin u qelem bu. Dîr u mîrcana cîhanê bajarê Kurtuba yî bî rewş yan mebu. Parzemîna Emrîqa groverbuna Dînyê me dît... Medeniyetek me hebu...

Berya em aşîqî esl u fêslê xwe bîbîn. Berya heq u heqîqet jî

me bîreviya, berya ser sîdîq u merdîtiyê bî destên herî bê seyan-dîn, berya jî bî balqona keç u xort jî dî neqeb u suka de Seyda hev bîkîn.. Medeniyetek me hebu...

Hê rîşme neketîbu serê me. Dî destkî me de Qur’an u dî yêdîni jî ‘eraq hê tunebu, ez nîzanîm çî bîbêjîm derewe bes heqîqeten Medeniyetek me hebu...

Roja mîrîna gawurê papaz Mateus ku me roja dîldaya pîroz kîr. Dî hengama dejekîrîna flehtiyê çaga gengeşîya jî ber wî mîşkê nanê muqades xwarîbu dihate gotîni gelo rîhê Îsa wê derbasi mîşk bube yan nebuye? Li şuna sîlavê dîgel em dîbînin dest u lîng radîbîn Medeniyetek me hebu...

Çaga dî herba xaçvanayî ‘ewîl de papa Fileh coş dîkîr. U dî got: “Bî xuna müslûmana xwe bîşon.” Xelqê jî dî got: “Reb vena dîxwaze u xuna mîqades teleb dîkîrin.”

Dîroknasê Frankî bî navê Rudolp çaga bavpîrê xwe yî bî qîrêjî dîpesînan dî dîrok dînîvisand dîgo: “Leşkerê me li mâara müslûmanê ghaştî tev dî sîtlê de kelandin, sebiyê wani bîçukjî i temami dî şîşa dî braştîni u goştê wan duxarin.” U dîroknasê ‘Ereba jî salîgê vê wahşetê dîdîni. Ewana wuhabun. Bes yênu me... Medeniyetek me hebu...

Hê li Ewropa tewzîni tunebu. Li Hindê şuştîni tunebu, li Emrîqa tarîti u wahşet hebu, mîj u duxan li ser ‘âlema küfrê hebu, ax! wê çagê Medeniyetek me hebu...

ÇIMA MEDENİYETA İSLAMÊ?

Jî bo xîlasiya wan nîfşê insana yî ku hîkmet u îrfan jî jîyana xwe qewitandîni u ramana wan ketîye sêkratê.

Jîbo malzemê dîrokêyî lekedarbuyî bîneqîne u jî nu vî bî can bîke. Jîbo nêtek baş u nerîneke qenc jîyanê bîke xîzmetkarê heq u heqîqetê. Jî malzemê mîrîyê dîrokê da ku bîde zîndîya.

Da ku nebe zalîm

Jî mezluma re bîbe yar

Dest bavêje ketîya

Heqîqetê veşartî

Hêviya mezin

Mejîyên tari

Da ku ronî bîke

Qeza ku dîbêje ez tēm bîbhîze

Heqîya ku dîbêje ez dîçîm bîzîvîrin

Hêlên geydok li hev bêne

Jî zanîna heyatê

U hîfzîkîrîna derbasokê wêdetîr

Da ku bîbe tasek av jîbo xelqê hatiye serserî kirin. Buye gēribê xwe, ‘acîz buye u hatiye acîz kirin. U jîbo jî destê müstek-bîra vê heyatê azad bîke jîbona van tîştî teva u jî vana zêdetîr em dîbêjîni medeniyeta İslamê.

İRO EZ DILZİZ BUME

Jro rewşên dilziziyek wuha lîmîn qewîmiyi, jîbo lehiyen dî hundir mîde tev radîbîn bêjêyên ez bîbêjîm peyda nakîm. Her wekî bêje jî gotîna hissê min acîz, peyvîk qîyma xwe pé ninîn. Ku ez bî şunda dizivîrîm u dînerîm jî umreki beyhude buhuriye pévi ez tîştekidî nabinîm.

Ev hâl jî min qahr u perişan dîki. Ez duxwazîm bigîrim belê girîyê min nayê. Hêsrê çavê min zuhabuye. Qelbê minî buye kevir nayê merhametê. Pîştî ev peyva Hz. Ebu Bekîr té bîra min. Ku çağa qîrşîkeki jî erdê hîltîne u dibêje: “Xwezi ez jî weka te bama, xwezi diya min qet min ne welidanda, ez nehatîbama dînyê u insana min tucari dî bîra xwe da nanya.” Çîqas heqlîbu çağa ev kelîme dîgot. Nuha ez çêtir féhm dîkîm. Xwe bî xwe ez dî bêjîm heger zateki wekî wî xweziya xwe bu buyîna qîrşîkeki tanî; hevalê péxember u sîddîkê ummetê ku ev tîşt duxest, dîvê ku gunehkareki weke min tîşteki hé jê kêmîtr buxwaze..

Feqet heyhat ku ev xwezi anîjî lî gunehkareki weke min féde nake. Xêr ençağ dî karîm van günaha pakîj bîkîn.

Ez jî dibêjîm xwezi lî vé serzeminê tu kesekî min tuneba ne diya min, ne bav, ne jin u ne jî zaro. U ne jî malekî ez jî hindîkbuna wê bîtrîsiyama u jîbo pîrbuna wê gîret bîkra u xwezi meqameki minî ku ez jî xîrakîrîna wê jî bîtrîsiyama tuneba. U xwezi min dîkarîba vî umrê xwe yî nehêja tamam dî oğîra vé dâwa pîroz de xerç bîkra. Xwezi min dîkarîba gîzmetnî wuha bîkra ku fîrsenda fîkara minî dînyê qet çêneba.

Tevê hem u gêm u derd u dermanê min dâwa min ba. Ez hew bî dâwa xwere rabuma u pére razama. Çî tîştê min lé méze bîkra hew min ew tenê bîdîta. Her gava min bavêta hew lî meslaheta wê tenê bî fikîryama.

Dî hengama talukê de nexasîm çağa ez jî jîyanê bé hévî dîbîm u lî ber mîrinê wekî aşîqê îslamêyî mezîm min dîkarîba bî gota ax dâwa min.. !Ax dawa min..

Belkî wê wextê min çavê xwe vekîra u ruhê xwe xweşik teslîmî Rebbê xwe bîkra. Bes nuha tevî van guneha ez dîtîrsîm jî mîrinê, ez heya dîkîm herîm huzura Rebbê xwe. Lé vé dînyê ku ez gunehu qusurê xwe veşêrîm gelo lî wê

dînyê halê min wê çawabî.

Lî vére şîkevte ez dî paşwande xwe veşêrîm, dî wanda bî héwîrîm hene, bes wê roja ku té gotîm “kella la wezer” jî ber gîzeba Xuda ezê bî kuda bazdîm..!

Péxemberê îslamê tîm u daim dî go “ummata min ummeta min” u bî ser ummeta xwe de dî hulhulî gelo wê roja mahşerê yî mezîm ezê çawa bîbêjîm “ez jî jî ummeta temî ya Resulellah..!” Wê rojê perçak erdî ku jî fedya ez tékevîm bîn wê jî qet tune yî.

Gîranbuna gunehê xweyî dî mîzanê de jî nuha de ez lî ser millê xwe his dîkîm. Bî seda bî milyona hesret u muxabîn jî mînrabe, ku ez nebum merkebekî jî vé dâwa pîroz re. Jî rahma wê yî bé dawî dilopek bî tenê jî nebu nesîbê min. Wekî ‘erda hîşkî baran lî ser dî bare, belkî ava min hate vexwarî bes jî Feyza wê min feyz ne gîrt.

Min got iro ez dî dilzîzbunek mazîm deme heta dengê min derê ez duxwazîm bigîrim.

Ez duxwazîm lewbandîné bîkîm lî ser vé dînya derewin. U lî ser wechêwêyî xapînok ! Min çukas du xwest wekî Hz. Alî ez bî bêjîm: “Ey dînya ! ma té min bî xapînî” Lé belê me’elesef wekî ava bahîrê ku mervî her veduxwe bêtrî tî dibe. Tibuna min qet naşkê. Dî gel ez dizanîm rojekê wê min bîmrîne disajî ez dî vexum.


Ya Rebbî ax berya roja qîyametê bé gotîm “Feâtêrefu” ez qusur u kemasîyê xwe îtiraf dîkîm. Vî qîtmîrî destvala jî ber derîyê xwe venegerîne ya Rebbî. Jî bîl te ma kî dîkare guneha veşêre.

Ey Rebbê minî şefqeta wî jî yan herkesî pîrtîr. Ev destê minî drêjî bî bal te vedîbe vala nezivîrîn. Tu dibêje jî rahma min bé hévî nebin. Dîgel péxemberê te yî ezîz jî îqaba te dî pelîkand, heybeta ezabê te muhîbê te qal dîkîr ezê çawa ne tîrsîm ya Rebbî..!

Weke mecnuneki gîrib jî bona Leyla xwe çavê wî bî gîryan, séngawî dî buryanéde dîhn u diwane bêriya ley-laxwe kîrye. U ez, ezê ku dibêjîm Rebbê xwe jî herkesî bêtrî hîz dîkîm. Ez, ezê ku jîbo metâê dînya bêman dîldarê herman terk kîrye. Ez çawa dîkarîm bîbêjîm ez jî Rebbê xwe hez dîkîm. U aşîqî wî me.

Mirze Nur

*Min zu kir ez di zivistanêde hatim,
Hunê di biharek wek cennetêde werin*



EY USTADÊ MIN!

Ey pir é fani! Ey qendila rîya min ronî dîke!

Ey rézané rîya minî derdnak! Ey rehberé rîya minî cefakâr!

Ey hamiyé mezluma rézané mustez'efa!

Zulma sala te hîlgirt lî ser piştâ xwe u tarîx nivîsand... Carnan bî mawzeré lî ser piştâ hespé, carnan bî şaşîka xwe dî qampé hêsîrad, carnan bî qelema xwe dî quncîké zîndanad. Carnan tevli qeydu zincîra lî mahkema, carnan bî gotîna xweyî lî hember zalîma u carnan jî bî dî'ayé xwe lî cîhé xalî... 80 sal jî jîyana te lomandîn, mucadele, nefî îşkence, heps, mahkeme, birçîbun, u kuştîn xwazî qet kém nebu. Tu dibêje:

"Min insanekî hew lî xwe bî tené dîfîkîrîn zen dîkîn. Feqet jîbo îmana komelê xîlas bîkîm min hem dînya xwe u hem jî axreta xwe fîda kirîye. Dî tevê jîyana xweyî ku 80 u tîstek sale bî navé kéf u şahiyé min tîstek ne ta'amand. Temamé umrê min dî zîndané esaretéd, dî grîtîgehê memleket de, dî qampé nefyéd u dî mahkemé bajarade derbas bu.

Cewr u cefa ku min nekşand, ezyet u îşkencé ku min neditîye, heqareté min nexwarîne nemaye. Dî diwané herb de weke canîyekî mu'amele bî min ra hate kirîn. Weke serserîyekî bajar bajar ez xîstîme rîya surgun u nefyê. Dî zîndané welat de bî meha ez jî hevdiñné hatme menî' kirîn. Bî zulm u heqareté pîr celeb re ez seranser mam. Bé jîmar ez hatme jahr kirîn...

Carnan zédeyî hezar carî jî min terciha mîrîné lî ser yan heyatê kir. Heger diné min men'a intîharé nekra belkî Se'îd îro dî bin axa sar de rîzîba u çûba."

Ustad é min! Lî pey xwe te jî mera hîşt da'wak pîroz u mesajek bî rewş. Mesajek wuha ku mirîzîndîya bî can dîke, bêhna bîhara 'esra saadeté lî ruyé erdê dîfurîne. Bes em pîr mehzun dibun bî qetandîna te yî jî vé Dînya bêman. Lé belê dîlşad be ey rézané rîya minî rîkî rast; Lewra jî cîhé te hîştîbu me dewam kir rîya te. Tuxumé te çandîbu nuha şîn hatiye. Bes me duxwest tengî u talîyé dîldayé te dîkşînnî jî tera bîbêjn bî tera par bîkî; da ku disa we me tesellî bîkra...



COTKAR, MAR U RÊVÎ

✍ M. Zülfü TAN

Çi hebu, çi tünebu, bé xılafé Xuda kes tünebu. Cotkarek hebu. Seré sibé zu rabu gayé xu girt çu ser 'erdé xu. Ku 'erd bajo. Xetta xu léxist çu seri. Mézekir ji durveda dengik té. Yek hewar u gaziye dike. Bı dengeki wer hewar dike ku dıl u gürcüké méra diheline. Mérik dev ji coté xu berdide u ber vi dengi deri. Deri méze dike ku waye prezekik dişewite. Kevirki mezin ji çiyé da gerbuye hatiye liser pişta marki sekiniye. Mar dibinida maye nika xu ji bini derxe. Are preze herçki té nézik dibe. Hema hema li ber şewitandiné ye. Jıber vi hali dike hewar u gazi. Günhé cotkar pé té. Hewariyé mar ji bixuwazi gerek bihewaréda herim dibe u mar ji vi hali xelas dike. Çawa mar xelas dike mar xu li hüstyé wi dıpiçikini u dibé: "Ezé bitebirém." Mérik dibé: "Eman hawar, çewa tiné bı mive deyni, mı tü ji çi hali xelas kiri, ne ji mı bıbana niha tüyé bı sağı şewitibuy." Mar dibé: "Eré hema ez marım limı çeyi nabi, xaini 'eslémın e. Ezé illa bitebirém."

Mérik méze dike çara vi 'işı tüneye. Dibé: "Hey tüye bımi biré, ka em herin cem sé kesa. Bira dinava meda bıbi qadi. Emé mesela xu jıwanra béjin. Heq dan ké sé emé gotina wan qebul bıkın. Mar dibé "Temam." Hingi derin méze dıkin kerik té. Derin peşiya keré, diben: "Birayé ker; hal u mesela me ava awabu mı van mara ji mırné xelaskir, ev ji dibé ezé bitebirém. Ma ev heq e." Ker dibe: "Biraye mar, pebire tev bermedı ev ben-i adem heyi ya hetta evaré bıme kar u 'işé xu dıki bare dünyayé li pişta me dike u serda evji lime sıwar dibe. Évaré alıf u ce ji nade me, me ti u birçi dihele. Tew 'efuneka vi bermede heyfa me ji jé bire."

Mériké cotkar dibé eywax yek çu made du. Hingi daha derin ija rasté ga ki tén. Mesele ji ga ji ra dibéjin. Ga ji weka keré dibé: "Hibe hetta evaré bı me cot u kar u 'iş dıkin u serda ji me birçi dihélin, bı ro ji çıma rınd naşuğılın dibén, bı zıxta lime dıxin. Eman eman tı bermedı. Heyfa me ji jé bire." Cotkar dibé eywax ma yek. Ezé çi bıkim. Méze dike ji wé da révik té. Çavé mérik li révi dikeve dibé tamam. Ek mı xelaské ancak révi ye. Xuda ji mı ra şand. Révi té cem wa, dibén: "Birayé revı ka were xéra xu mesela me hal bıke. Mesela mı u vi mara awa awa awabu. Ne jımin bana iro evé bı şewaté bımrana iro ji hatiye dibé ezé bitebirém. Ma qey ev heq e." Revi dibé: "Geli bıranı! Niha ez hetta ciyé mesele

u haléwe ne 'ewwılı nebinim nıkam tışki béjim. Jıbo 'edalet were ci em herin ciyé wenı 'ewwılı." Derin ciyé 'ewwılı. Revi li vi kevré ser mar méze dike u dibe: "Ev kevrıbu?" Mar dibé: "Eré." "Çava ketıbu ser te ev kevrı." "E dibém ev ne ev kevrı bu lewra ev kevrı piçuke." Mar dibé: "Na ev kevrıabu." Revi dibéje: "Vé çağé gerek em tecrübe bıkın ka ev kevrıabu ya ne ev kevrıabu." Yan ji we qerara me ne 'adılı be. Xu dirêşke ezé vi kevrı deynim ser te ancağ wé çağé ewé belli bıbe, ka tı çawa buy vi mériya tü çawa xelas kiri. Gerek ez gıştiki bı çavé xu bıbinim. Du ra qerarek 'adılı bıdim. Yan ji ewé qerara mı qerarek bé 'edalet be."

Mar bé çare xu diréj dike révi kevrı datını ser pişta wi. Dibé: "Ka xu bıhejine. Dıkarı ji bini derkevi." Mar xu dihejine çer dike nake nika xu ji bini derxine. Cotkari dibé: "Hah awabu, mıji wi hala xelas kır." Révi méze dike mar nika xu jıbiné kevrı bı rasti derxe. Wé çağé ji cotkari ra dibéje: "Léxe tü çi sekiniye." Hişé mérik nu té seré wi. Hemma dadıde kevrı u hücumé mar dike wi dıküje. Dibé: "Birayé révi te iro e ji mırné xelas kırım. Tü ji mı çi dıxuwazi bıxuwaze." R

Révi dibé: "E ji te tışki naxazım. Hemma ji ma çend mırişka bine besı." Mérik dibé: "Mırişk qurbana te bı sibé ezé ji te ra bınim." Deri mal meseli ji jına xura dibé u dibe sibe se-çar mırişka teki tur, ezı bıdim révi. Jına cotkar dibé: "Çım! tüne mırişké me bıdı révi. Çıma ez din bume mırişké xuni delal bıdim réviye pis. Sıbe tajiyé bıre herı bera révi bıde vi pebire postki buwi bıfroşe. Ji me ra hınık mırişke dı bıkirı." Mérik dıki nakı bı jına xu nıkanı. Jına wi dibéji: "Ya tü yé wek mı bıki ya ji ezé sibé herim mala bavé xu."

Cotkaré feqir tü çare nabını ji tırsa jına xu, seré sibé tajiyé dıki turé xu u deri cem révi. Révi ji durda da méze dike tur pır diheje. Dibé: "Welle ev ne işé mırişka ye, dı vi turi da tıştek heyé. Xu jé hemet dike." Mérik dibé: "Birayé révi werı ez mırişka te bıdem te." Révi dibé: "Tü berde ez dıkanım pé bırim." "Na na! Ez naxuwazım tü bıwesti, malé te ez teslimé te bıkim." Révi: "Tü malé mı berde ez dıkanım topkı." Mérik hem qısa dike hem ji ber wi révi dere. Révi ji tüm şunda dere. Mérik méze dike révi keti şüphé dere tur vedıke u tajiyé bera révi dıde. Révi direve u xu bızor davé çiyé. U dibé: "Nıg ne nıg bu nıg kertal bu, boç ne boç bu, boç palapıtık bu, ma ne ez bama kes xelasedbu ji ber vé tajiyé. Ax ben-i adem tü ji mar ji martırı."

EWWEL BIRIQI

Ewwel biriqi ji husné sermed
Nurek buye me'neya Muhemmed

Ew nur bi emre 'alim-ul ğeyb
Bu menşee feyze 'alema ğeyb

Erwah ji me'neya péxember
Çebun mesela nebat u şeker

Bu esle esil u cumle nefsan
Nefsa su'eda u nefse nehsan

...
Héja ne ev zemin ne ev sema bu
Ew serwer é cumle enbiya bu

Xelqa felekan ji bo wi ra bu
Secda melekan ji bo wi ra bu

Ew rehmet-i cumle 'alemin bu
Adem di meyan-ı ma u tin bu

Péxember é cemi'é cuz u kull bu
Adem bi xwe héj av u gil bu


Ew pencereya cemalé Bâri
Şemsa feleka dilé di thari

Gava kete sureté cihani
Péxemberé axiri-z zemani

Wi berzex é mumkinat u wacib
Wi padişahé li şıklé hacib

Mensuxi kırım wi din u millet
Me'lul-i kırım 'elil u 'illet

...
'İsa dema dıxwendî İncil
Behsa Wi dıkir bi wehy u tenzil



Şêx Ehmedê Xani

Go "Mujde didim Resul é Emced
Dé paşé mi bé bi navé Ehmed"

De'wa xwe dıkir bi dest u ezman
Desté Wi bi seyf u dev bi Qur'an

Xweşxilqet e, hem resul e hem mir
Pır hikmet e, hem kitab e, hem şir

...
Ey padişahé bılindepaye
Xurşid é felek nişin u saye

Ne'té te bi 'ilmé min muhal e
Meddah ji bo te zul celal e

Ez dé çi bibéjim ey şehinşah
Wessafé te ye kelimé é Ellah

Şaha, ji te ra xweş ism e Yasin
Taha, ji te ra tılısm e Tasin

Her eve bes e ey hebibé muxtar
Bari ji te ra bi ji te sond xwar

Sed car biji te ey keremkar
Ger dé me hebin guneh du sed bar

Sed mertebe gerçi em xirab in
Emma ji te na-umidi nabim

Sermed : Ebedi	Gil : <u>h</u> eri
'alim-ul <u>ğ</u> eyb : zanayé <u>ğ</u> eybé Ellah	Bâri : Nav é Ellah Te'ala
Menşe : jédêrk, kok	axiri-z zemani : zemané dawin, é paşi
Erwah : Ru <u>h</u> tamam	hacib : perde
Su'eda : bextewar u se'id	Mensux : bethal
Ne <u>h</u> san : Bényom, bébext	Xurşid : ro, thav
Sema : Asiman	Saye : si
Xelq : Afirandin, heyat dayin	Ne't : pesn
Ma : av	Meddah : pesndar
Tin : <u>h</u> eri	Emced : mezin
Cuz : Yek	Şir : Şur
Kull : Giş, <u>H</u> emu	Ezman : ziman



Melayé Cızirî

LI SER RESULULLAH (S.a.w)

*İro ji cemâlâ te dilê min bî birin e
Ellah çî hebîb i çî thebîb i vikewine*

*Ismê Te ye mektubi digel ismê Xwedayi
Çend muznîb u 'asî bî wî navi ğefirine*

*Mislê Te, ne Âdem we ne İbrahim u ne Nuh
Yusuf bî Te mehbub u lî Ye'qubî şîrin e*

*Fehmê mine qasîr we neşîm wesfê eda kim
Meddah jî Tu ra xalîq u hîndî melekîne*

*Ğeyrî te nehm der sedefê behrê wucudê
Lew lazîm e em qesdê bîkî rahê Medîne*

*Dam jî xiyala Te me sed nale dî dil da
Lew razî misala Te çu sorgul me nedîne*

*Gava ku tu hati buye rohnayî lî herca
İdî me nedî zulm u xerabî veşîriyî e*

*Zalîm (zulmet) veşîrî kufrê nema qet dî dinê da
Cennet bî wî remzê xemîlin hur u perî ne*

*Ger dê Tu nebuya nedîbu çerxê bî dair
Sergeşte jî şewqê Te tenê ne meleki ne*

*Şems u qemerê şu'le jî ruwê te vedabu
Ya mum jî te bu mum u şemalê jê ayîne*

*Carek Tu nezer ke minî miskinê ğerîb e
Berde me jî hebsê u jî zîdanê derîne*

*'Eksê jî rohni te şeb u rojan we dixwazîm
Hîndî ku hene xemleê mir-at u ayîne*

*Mî'racî digel kes nebuyî sadrê risalet
Qasîd jî Xwedê bo te ye Cîbrîlê Emin e*

*Carek Tu şefa'et ke binavê xwe jî bo min
Lewra ku Melê ğeyrî te imdadî çu nî e*

*Bobekr u 'Umer herdu jî hubba te dînalîm
Meqtul jî fîraqa te çî 'Usman u 'Elî ne*

Ya Reb Hewar

Ya Reb hewar sed car hewar
Perwan u qet nagrın qerar
Xweş muhbeti haviti nar
Ya Reb tu yi dermané mın


Sed car hewara thekemi
Ya ageh daré 'alemi
Derman bike vi eleme
Ya reb tu yi dermané mın

Vi eleme derman bike
Sırta ezel zahır bike
Dağa dila hasil bike
Ya Reb tu yi dermané mın

Elem çi ye? Muhibbet e
Derman sebr u sekinete
Ya reb bikey bı qısmete
Ya Reb tu yi dermané mın

Ya reb bikey tewbe nesib
Tecelliye husna hebib
Derman bikey dilé hebib
Ya reb tu yi dermané mın

Dilé ğeriban saĝ bike
Sırr u hala zahır bike
Dağa dilé mın saĝ bike
Ya reb tu yi dermané mın



Melayé Bateyi
(Niviskaré "Mewluda Nebi" a
Kurmanci ya meşhur)

Dilém kole bı xwoşine
Jber birina tiji xwune
Bı dermana hekim nine
Ya Reb tu yi dermané mın

Eger hekim 'İsa bitın
Luqman ji qebra rabıtın
Dağa dila sax nabıtın
Ya Reb tu yi dermané mın

Eger hekime Luqman e
Dawud digel Suleyman e
Nızanın mın çı kuan e
Ya Reb tu yi dermané mın

Kovana mın Muhammed e
Jı bo roja qiyamet e
Bo me biket şefa'et e
Ya Reb tu yi dermané mın

Şefa'eta wi héviye
Lber dergehé ilahiye
Bo Melayé Bateyi ye
Ya Reb tu yi dermané mın



Allah (c.c) çi zatek eh^usen e

Allah çi zatek eh^usen e
Zêde letif u qadir i
Mexluq hemi neqşê te ne
Vêk ra li hemyan fekiri
Hemd u sena layiq te ne
Yê 'erşê 'ezim çekiri

'Erşê 'ezim ê ekber e
Zinet u raza merkezi
Ew kursiyan heq li ser e
Bê şems u gerdun dibezi
Heq Wahid e Witr e fer e
Bê newm e bağvan ê rez i

Bağ ê ku bağvan bête ber
'Erdek heye ew lê nebi
Dara ku 'enqa bête ser
Belgek heye sih lê nebi
Kij ni'metê dê dit xeber
Ya Reb derê feyzê vebi

Ser çeşmeya feyzê çi ye?
Hate lisan ê 'arîfan
Ew nureki Rehmani ye



Feqiyê
Theyran

Darête qelb ê xaifan
Lê şem'eyek da Muksî ye
Lew bu nedim ê taifan

Bume nedim bume herim
Min 'eşqeka dijwar heye
Kêfê dikim serfa 'ezim
Min hêj meya pêrar heye
Minet ji Rehman ê Rehim
Min mireki Settar heye

Ew mir Kerim e Sâtir e
Xweş Hakim e dî barê xwe da
Xelqno! Ne dur e hazir e
Ew Wahid e u bê ibtida
Her çi bikit ew Qadir e
Ew xaliq ê bê bâb u dâ

Wahid yek e ne ji kes e
Ferxende ye nej erxeki
Ew yek ji 'amê re bes e
Muhtac nehın bâl ferxeki
Ustad ê aş ê ethles e
Neh çerx dî nava çerxeki

Bê te çime? Ez ne ez im
Ruh u rewana min tu yi
Ez hışkedâr im ne rez im
Xeml u ruhana min tu yi
Bey te neşem gavek bez im
Çun u sekana min tu yi

Bê te mîrar im meyyit im
Qelbê ji ser mîrate ye
Ez kuştîyê natebib im
Behra quluban te heye
Xelqno! Bî Qur'ana 'ezim
Her çî dibêjim her we ye.

Ma ez dibêm vê gotinê
Bê te zeban bê gotin e
Ew qal u qil e dî dinê
Zahir u bahtin sâkin e
Bun miqata mîrîn e
Ew-j bâl te ne ne-j bâl min e

Mî hewl nehîn quwet nehîn
Mî sewt u ezman bî te ye
Mî zehr u ezman qet nehîn
Dest ji te ye çeng ji te ye
Mî fikr u hem himet nehîn
Ruh bî te ye rah bî te ye

Hub rêti canê beşer e
Sewda ji mejyê wi firi
Goyîni nêv dâr u ber e
Bêsuc e qet nakit giri
'îşq u enina qemer e
Netq u lisanê jê biri

Deng ji defâ canê me tê
Kirdin nefir u nayeki
Sani' bî herfê pîf ket ê

Her zehreki-b awazeki
Subhan ji şah ê Qudret ê
Her caneki u ebdaneki

Hemd u senâ heqq e li me
Bê hedd u bê qiyas bikin
Zîkr u 'ibadet lazîm e
Cuhda therîqa rast bikin
Roja qiyamet qaim e
Ta'etek pîr esas bikin

Ta'et bike rêdur i tu
Her çî dî mektuba me de
B'kağez u kis u mori tu
Ya min bî da fî min bî da
Canê dî kûba sori tu
Rohniya sem' u beser da

Canê dî navê nefsi ye
Vekra hemî bu beşeri
Maka wicudan fani ye
Ew dê bîzani vi deri
Eslê ruha me baqi ye
Lew jê nedakîn xaweri

Dê bçîne nîva axekê
Perda turab ê thari ye
Feqi dê rakit rahekê
Bî mehdera wi Bâri ye
Bo çak u parîsa-b carekê
Lî cennet bikin serdariyê

Avek mehin im kemter im
Min cerg u dil bune birin
Sewda u din u ebter im
Pabendê vê nefsa le'in
Muksi yê jar u bedtir im
Ferhemni xeyre Rahîmin

TÊT

Dilê mehzun kefarete bit
Ki imşeb taze mehman têt

Bı mızgini bişaret bit
Ki mehman canê canan têt

Ki mehman canê canan e
Lı ser çehvê me mehman e

Bı mâlâ cumle é xan e
Ki şahé cumle é xan têt

Were ey şahid é şirin
Jı 'eşqa te dil ixyrin

Bıcan menzilgehê mirin
Telebkarê ki sultan têt

Telebkarın dil arayım
Medém yarın bı wi şayım

Lı bejna 'er'erin daim
Siyeh mar lê bı colan têt

Siyeh maran kire seyran
Lı cotê şubhetê ciran

Ku xas u 'am bibun heyran
Lı ciran 'enberêşan têt

Du zulfin 'enberêşan in
Du le'lin şekeristan in

'eqiq u durr u mercan in
Lı hewzan abê heywan têt

'Ecib bergeh merari tê
Jı mexmuran du aslan tê

Jı mexmuran tu mexmuri
Bı cihet 'eqreb a zori

Tewafa beyt-i me'muri
Lı burcan xun bı seyran têt

'Eqarib hat u bê hed hat
Lı wê burca zeberced hat

Vibala qewse eswed hat
Lithelbê mahê tâbân têt

Lıhıva kewçerın kamil
Vi ehlen ranehiştın dil

Wu cumle da sefên sunbul
Lı hında vê gulistan é (gulistan têt)

Gulistan a xweda rest e
Lı çar etraf dılan xweste

Binefş u nergızan mest e
Cinesri le'l u reyhan têt

Rayahin sosin u werd in
Lı Şêx 'Elyê ğerib ferd in

Werestê ehmer u zerd in
Hero sed car dı efğan têt

Jı efğanan nemayım têr
Du'a go yê tu ez bê vir

Bıbite şer du esleh dir
Heta vi qasidi can têt

Bıbine ro şemalin é
Were hında vê balin é

Jı dest âhân u nalin é
Çı reng feryad jı asman têt


Bı feryad u bı hawar e
Jı dest âhân mın ew kâr e

Mulazım bende é zar e
Jı seyyidi çı ferman têt

Seyyid é heq nezer vi ra
Dı iqliman 'elemğera

Qutara gewheran vi ra
Jı niv kana bedexşan têt

✍ 'Eli yê Herîrî



Siyehpûş

Elif Ellah La ilahe illa hu di me'na é
Beraet pur muşewweş tê ji xala nuqte a *Ba* é

Tebarek xwendi herfê *Ta* ji husna ehzen é dilber
Weki summestewa remzek qelem da nuqteên *Sa* é

Cemala *Cim* é wennecmé weki perwane ez sohtim
Welé *Ha* én di *Hamiman* heyata bé dilan da é

Xiyala *Xa* é la xewfun 'eleyhim ké diye iro
Ji remza *Dal* é ud'uni beyan ket ew bi inşa é

Ji *Zal* a uzkuruni gerçî dil sohtim qewi iro
Ji *Ra* é rehmetun minna heyata cawidan da é

Biné Zeyn é çî reng uzlifetulcennet be me'na da
Selamun qewlen ku *Sin* é di remza wi mu'emma é

Şu'a'a *Şin* é we şemsé weki perwane ez sohtim
Sedayé *Sad* wel Qur'an é çu heta bi cewza é

Çî xweş *Dad* é widubest im dide wé wedduha é da
Thehur bu dil bila şubhe bi herfê *Tha* é *Thaha* é

Zuhur kîr *Za* é we zahir mucellayé ser ewreqan
Ji 'Eyn é indeha ecrun ezim dani di tuğra é

NEZMEK LI SER TEMAMÊ HERFÊ HÊCA Ê

Ji *Çeyn* é gâsiq in iro eger çî dil bî azar im
Muferrehî tê dilê 'aşiq ji wi *Fa* é fetehna é

Ji *Qaf* é *Qulhuwellahu* ehed cana çî mektub e
Digel *Kaf* é di kullu men 'eleyha fan u imza é

Ji *Lam* é len tenalul birre hetta tunfiqu iro
Me can u milk u dil bexşin di riya wé semen *Sa* é

Ji bo diné me pîrsek kîr cewaba len terani da
Ji dil sohtim gulé yaran ji dest nurén şeker xa é


Biné Mim é di makane *Muhammed* da çî nişan kîr
Çî cah u mensebek çêbu nezer den ehzen esma é

'Eceb *Nun* wel qelem min di di remza qabé qewseyne
Ji *Waw* é welleylé iro şefeq da nur u rohna é

Ji *Ha* é ji huwelhoti nehennefsû be me'ne da
Ji *Lam-Elif* wela yuzi'u ecrel muhsinin dayé

Ji *Ya* yewme yekununnasu pur xewf u muşewweş tê
Siyehpûş xweş nezim ani tamam é herfê hêca é

Me xwar camek şeraba xweş be desté saqiyé mehweş
Weki min hişt Iran u beré xwe daye Beğda ye



Ehmed Yasin e

*Pîrê serhıldanê ruhê berxwedanê
Meş'ela zîndanê Şêx Ehmed Yasin e*

*Şêxê Filistîné seydayê hur jîné
Dozvanê Medîné Şêx Ehmed Yasin e*

*Şagîrdê Qur'anê insanê imanê
Mêrxasê cîhanê Şêx Ehmed Yasin e*

*Serdarê her merda mucahid u Seyda
Rêzanê me Kurda Şêx Ehmed Yasin e*

*Ê kû jî bo Aqsa azad bibe dîsa
Xebitî bî hîrsa Şêx Ehmed Yasin e*

*Sazgêrê Hemasê bethlê Ğazza asê
Tîmsala ixlasê şêx Ehmed Yasin e*

(H. Safer 2.1430/M. 28 Ocak 09)

Lı we pîroz Lı we pîroz

*Lı we pîroz lı we pîroz be nesret
Hezar carî lı we pîroz be 'izzet*

*Hemas u leşkerê Qessamî her dem
Bı we fuxrê dîkin em îro ûmmet*

*Lı ber hêzê tewên müstekbirînan
We dest hilda u şerkîr kîr cesaret*

*Dı bîm bomba u fuze jehr u ağır
Sabîr kîr berxweda red kîr esaret*

*Jı cîhanê re îsbat kîr we cardîn
Lı ser îmanê ğalîb nabe quwwet*

*We Yermuk u we Hittin anî bîrê
We fetha Qudsa pîroz kîr bişaret*

*Hezar car tehni u tebrîk dîkin em
Reîs u ceşş u gellê wey bî xîret*

*Jı Şeyx Yasin u Rantîsî u Reyyan
Henîyye, Meşalê şahîb fêraset*

*Lı ser vê ni'meta Rabbê Kerîm em
Divê Hemd u Şukîr kîn ta qiyamet*

*Salat u hem selamê bê jimarî
Lı ser Peyxamberê şur u adalet*

(28 Muharrem 1430 H. 25 Ocak 2009 M.)

Bê kes im yek kes heye min bergidana herkesi
Ew melaz u melce u me'wa ye bo her bê kesi

Wê ji me daim hebe hey hé nebun wi hey hebu
Ger ku em hey jê hebin ew bes jibo me ew besi

Ki bi rasti bigre wê ew ehlê ikram u necat
Ê ku jê gâfil be ya weylen lehu min muflisi

Rehmet u ihsan u lutfa wi tu car na é hisab
Tê de herkes gérq u mestin na é gotin qisse besi

Wi bigir imdad u ikram é ji wi daim bixwaz
Dé bibê mensur u gâlib rabê cenga her kesi

Ayeta heqqen aleyna we leyensurenne in
Quwwet u qut u gîda in ruh didim her bê kesi

Şeyx mela bizdok u tem'uki mebe, rabe cihad
Ka şeri'et kani dinê heq qey tu pê nahisi

Ki bu wan rakir hilani em çima gerxi tê bun
Ma ne bes idi ji bo vi cewr u zulli ma'kesi

Îrz u mal u din u namus é tamam yeğma kiri
Em çîqa keslan u tîrsin ew li ser me dewisi

Ehli ilhad u dalal xwey cem' u da'wa u xebat
Xoce qurba lal u ker yek yek di kuncê kerrisi

Îxtilaf u buğd u keşmakeş me tev berbad-kirin
Rabe ew tev tîrs u ezwaqin tu tê da millisi


Kani gîret ka hemiyyet ka xebat u se'y u cehd
Ew çî ra bun yek seri em bun tegel u sad perçesi

Aferin bo wan yekin, sed tuh li me em sed kerî
Bes li ser wi eski hali muncemid bu qerrisi

Bes bi vi dini me xwar heja dixwun lê bê xebat
Düjmanan rakir hilani kani gîret ne'resi

Yek bibin hez kin ji hev din hin bîkin pê-kîn 'amel
Ewwel iman u cihad şer'a mutehher bunyesi

Hê dibin em taze ehlê zîkr u ewrad é sahih
Dara sun'i tiryê naylon kê ku xwar pê fitisi



Mela 'Eliyê Zila



Mela Ebdullah
Dêrguli el Botî

Însan bila bawer bîkîn

*Ev cîsm e bê şek dewlet e, iman reis e ummet e
Lê nefş neyar e millet e, wi hîlebaz u xebesî*

*Însan bila bawer bîkîn, 'eqlê xwe îstî'mal bîkîn
Da vê heyatê fêhm bîkîn, ev imtîhana her kesî*

*Ev cîsm e ger çî beden e, lê şeş hezar ra tê de ne
Her parçe sêsed madde ne, ev 'alem e gor hendesî*

*Xweda du rê-j mer çekîrîn, ew xeyr u şer î'lan kîrîn
Bo herdwa başqan çekîrîn, ev seçîme-j bo her kesî*

*Şeytan divê vê dewlet e, meğlub bîkî bîn selthetê
Bî hîle u mel'enetê, nefş xwestebîr wê meclîsî*

*Ber derya herdem seçîm e, 'eqlê me jî xweş hakîm e
Lê nefsa me rê nadê me, ye-d xew da qet pê nahesî*

*Şeytan e mel'un her divêt, nefşê bixapîne bibêt
j-benda ewî xain bibêt, j-bo 'eql u cîsm u nefesî*

*Başqan e rêça heq bîzan, ew seyyîd e pêxemberan
De'wa wî sunnet u Qur'an, hun guh bîdîn wî muxlîsî*

*Wextê jî me xain hebîn, yê pê bîzani kes nebîn
Tehlike ye bê hed mezîm, mîslê cuzam u beresî*

*Şeytan e İblîs cahîl e, başqan e rêça bathîl e
De'wa wî dunya zail e, hun guh nedîn wî necîsî*

*Wextê ku nefş xain bibê, j-İblîs re ew teslim bibê
Rêçek jîbo wê vedîbê, 'aql bî wê zu nahîsî*



Wé rabe cehda xwe bikít, vi 'eskeri bo xwe bibít
Íman b1 wi meğlub dibít, bin saltheta wi necisi

Hey j-xwe hebe teslim nebe, bin emré rebbé xwe de be
Tu-j réça heq ğafil nebe, da tu xelas bi-j xebesi

Çemgir nebe-l ser vé diné, dunya ye nuqta mirin é
Rojki tuwé bimini-b tené, d1 qebra reş u tu bé kesi

Weqté ecel rasta te bé, xér u 'emel peyda nebi
Dunya h_{em}i malé te bi, cardí feqiri bé kesi

Keski ewi dunya bivé, ji 'eşqa diné qet nanivi
Rojké ewé d1 qebré kevi, wek yé d1 teqné te_hisi

Ev nef_s e tér nabe-j diné, ji 'ışqa pera-w komkiriné
Bira xwe neyni mirin é, hungi bibini fethisi

'Eqli bike h_{ak}im li ser, nefsa sefih eh_{me}q u kher
Da béte réça mu'teber, da ku temiz bé-j xebesi

Xweda ji Adem 'eniri, j-cenneté ew sergum khiri
Avite dunya, pur giri, ev bu bela bo herkesi

Weqté giri bang khir Xweda, nefsa m1 ev derbe-l m1 da
Min tobeye d1 emré te da, da nekevim wé qefesi

Xweda ji wi qe_{bu}l dikir, lé cih de ew şunde nebir
Ew imti_han kir nuka bir, bir dani rewda ethlesi

Dunya 'ecuz he_psa me ye, ew sergum a bav é me ye
Weqté me goht me tobe ye, xweda qe_{bu}l-dki-j her kesi

'Ebdé te ya reb tobe ye, teslimi wi emré te ye
Rıca wi her reh_{ma} te ye, 'efwé bide vi muflisi



Şêx Muşerref Xîniki

YA RESULELLAH

Ya resulallah tui meqsud ji hecca haciyan
Ya resulallah tui heq dergehê muhtaciyan

Her diket qesda te ye gunhê mezin bê hed kiri
Her tui ya seyyidê 'alem hewara 'asiyan

Herkesê gêmgin u mehzun dil khul u her dil tiji
Weqtê ku bigre rikaba te dighête şahiyân

Herkesê dinya fireh lê theng buyi bê hed eger
Ew biket qesda te de filhal xelas bê-j thengiyân

Ew feqirê deste vala bê delil u çare bê
De de'wa te hişk bigre ey tu behra qenciyan

Ye ku dil sohti ji tihnan de biket qesda te ew
Lew tui serkehni bê şubhe jibo serkehniyan

Nê ji nura te munewwer bune ev roj u heyv
Filheqiqet her tui ronahiya ronahiyan

Nê ji te mewcudi bune filheqiqet herdu kewn
Hem ji te behna xwe girtin misk u biskê horiyan

Hezreti Adem ji cennet derket u beçare bu
"Ya Muhammed" wi bilind go, heq gerande-j esfiyan

Hem bêmena te ji tofan Nuh bu xelas
Hem bi te-j agir xelas bu ew reisê enbiyan

Hezreti Yusuf ji te ew husna bê hed girtibu
Hezreti Musa ji te bu fexra İsrailiyan

Hezreti Eyyub bi te heq da ji bo wi 'afiyet
Hezreti İsa bi te ew bu Mesihêk bê ziyân

Hem Medina te ji bera xelqê dinê meqsudi bu
Dikirm qesda ewi Cibril u hem ruhaniyan

Sed weki Weys'ul Qarani ku li dergahê te ne
Busedarê wê derê ne Neqşi u Geylaniyan

Ger dinê cih bu li kizwan wê demê de çi bibê
Wesfê te-l gotin eya bènahiya bènahiyan

Piştî Rebb'ul 'alemin medhê te gotê der qidem
De çi bêjin hadisan ê bê zeban u bê beyan

Zuryeta te zuryetek pak u temiz u thahir e
Her bi wan rehîmê diket Xaliq li ins u cinniyan

Cumle ê eshabê te heq qen hudatê ummetin
Pur bi mal u ruh cihad kir wan şehid u gaziyan

Xasseten Siddiqê Ekber wê şehê sahib huner
Hezreti Faruq e fettah ê 'Iraq u Şamiyan

Cami'ê Qur'an Zinnureyn e pur fedl u heyâ
Hezreti Kerrar e wê ser'esker ê imaniyan

Hezreti 'Ebbas u Hemze hem Huseyn u hem Hesen
Ehlê bey'et, 'eskerê herba Uhud hem Bedriyan

Ey şehê "lewlake" min hacet di dilda bê hed in
Pur feqir im pur dixwazim ey reisê egniyan

Heq birêjni li ser te hem li ser al u sehab
Pur salat u pur selam her subh u her êvariyan



*Mela Hacı Abdulfettahê
Hezrowî*

HEYF U HEYF

*Mam di nêv 'ecz u melalê heyf u heyf
'Umrê ji berda zewalê heyf u heyf*

*Bê 'ezizan serfî bu 'umrê 'eziz
Tev di benda qil u qalê heyf u heyf*

*Serfî kir weqta me Serf u Nehwê meh
Subh u şam u mah u salê heyf u heyf*

*Roj u şev bê feyde borin nagihan
Tev di vé fikr u xeyalê heyf u heyf*

*Ah u hesret qet ji bo me dest neda
Sohbeta qenc u delalî heyf u heyf*

*Camê hicran min vexwari yek bi yek
Pê nedim cama wisalê heyf u heyf*

*Badê firqet qameta şubhê elif
Qewsi kir wek nun u dal ê heyf u heyf*

*Fethî yê bê çare maye ustuxwar
Hemdemi 'ecz u melalê heyf u heyf*



WERE

Recep Toprak

Jiboy roj hilê
Qey divê hê çiqas xwin birjê
Ma têr nebu ev şeva dilreş
Bese, bera Qur'an rızgar bibê...

Pıra sıratê ji derbas kir
Zor u zehmetiya vê şevê
Sitêrk ji ne xwiyane
Sebra min bi wan bê...

Qet naxwazim
Şevê bixme kefen
L1 xwe bi pêçim
Ger bi ça'va fecrê ne binim
B1 qelemma hesretê navê min
L1 ruwê rojê binvîsinin...

Ka li ku man cotkari
Bera werin
D1 dilê mi da wehyê biçênin
Ger ez nebinim ji vê sibehê
Yetimê şehid bibinin...

Qey muhacir
Tê hê çiqas bi rê herê
Çend menziledi ji welat derê
Ji dilê min dur kevê...

Pir zore hesreta te
Ça'v ziwa bu li reya te
Were, vegere
Tevli kelamek ji ezana sibehê...

İLÂHÎ

İlahî tu pîr mezîni Rehmanî tu Rebbé minî
Te çêkir cümle eşya tu xalîqé mexluqatî

Berîyî jî hamberîya ruhdâyé cané minî
Tunebun te kîr hebun jîndarî lî heyatî

Wehşîye lî seré çîya masîyé behr u geliya
Tev jî rehma te dixwîn rehma te ne qedîya

La mekan bêmekanî lî her derî xwîya yî
Nav xweşî tu Ellah î İlahî tu yektayî

Kesé bêkesa tuyî héviya qelsa tuyî
Sebur navekî teye dermané derda tuyî

Qehhari tu qehrê dîkî lî zalîm u kafîra
Zuntîqam î lî ser le'in u ehlé agîra

Wehhab î tu heskîroxé mü'mînayî
Mehbubé me müslümana tü Xudayî

Ez Cevdeté gunehkarîm tü Xeffarî
İlahî tu bî xefrîni vî gunehkarî

Veşerî tu eyb u 'aré me ya Settar
Lew me bêhed zedene 'eyb u 'arî

Ya Rehman u ya Rehim u ya Xeffar
Ya Wehhab u Tewwab u ya xeffar

 Cevdet Karaman

DU HÛCW

JÏ SALIH BEG Ê HÊNÏ

*Sed sali di çalan de ez bîminim
Hezar mar u tûpîşkan ez bîbinim
Zivîstana lî ser ava bîminim
Dî havîna pezkovî bîçerînim
Dî hevraza berê âşa bîkşînim
Ne wek carek yekî ehmeq bîbinim*

*Eger çekî jî bo ceşê kerê ra
Jî zêr afîr dî niv eywanê Kesra*

*Mu'ellîm bit jî bona wî Felatun
Mu'eddîb bit jî bo wî Ibn-u Sîna*

*Hemî imze bîkîn dîplemeya wî
Jî her sînfî, jî sînfê ehle e'la*

*Neke bawer ew ê sahibhuner bî
Ew ê dîsa wekî bavê xwe ker bî*

*Dema tu wî jî eywanê derîni
Huner naye jî çeynî wê zîrrîne*



Adem Gönül

NIMAC, CAN Û MALÊ ÎNSUNÎ XELESNENO

Seħbiyunra Ebû Mı'laq
bı ticaret karkerdêne.
Rocêke qey ticareti
kono reyır. Ay wextunid ser reyirunde
'eşqiya biy. 'Eşqiyayke yi vinderneno.
Tera vano:

- Serê tode çı esto çı çiniyo vece!
Ez to kişena!

Ebû Mı'laq, tera vano:
- Meqşedê to malose, malê mın
bigire. Wa malê mın torêbo.

Lakin dızd, wazeno rêçe xu vınike-
ro:

- Ez teni canê to wazena! Agavi
Ebû Mı'laq, vano:

- Müsa'de bide mın, ez nimac
bikerê. Dızd:

- Tı çıqas wazenê bike. Semed eni
Ebû Mı'laq, nimac kerd û ba'di nima-
ci ana dua' kerd:

" Ya Meh**h**ubê qelban! Ya wayirê
e'rşî e'lay! Ya Allah! Tı çı bıwazê
kenê. Qey hûrmetê îzzet û saltanat û
nurê xû, tı mın şerrê eni merdımira
bixelesnê. Ya Muın! Hêvi û rica kena,

tı bêre imdatê mın!

Ebû Mı'laq, ene du'a hirî(3) rey
tekrar kerd. Dua'y xu senin
qedêneno, nêşkevara esparêke yeno
û bı tîre xu dano dızdiro û yi kişeno.
Ebû Mı'laq, enê merdımira perseno:

- Tı kamê, çikesê? Allah, bito nusret
lîmın kerd. Merdımıo ğerib yira vano:

- Ez meleke qate çarney asumani-
ya. Wexta to du'ay 'ewiline kerd,
terek kewt berê asumani.

Wexta to du'ay diyine kerd, mın
feryadê ehlê asumani şınawıt. Qey xela-
siye to fiğan kerdêne. Wexta to dua'y
hirîne kerd, hame vatışê : "Tenêke ten-
gayide du'a keno."

Wexta mın du'ay to şınawıt, Mın
Allah'ıra waşt kû qey kıştışı dızdi, mın
bışırawo. Allah, waştışê mın qeubul
kerd û ez hamiya nusretê to.

Eni baş bızane, kam desmac bıgi-
ro û çar qami nimac bikero û ene
du'ay tu bikero; çı halde beno wa
bıbo, du'ay yi muħeqqeq qeubul
beno.

**Eni baş bızane,
kam desmac
bıgiro û çar
qami nimac
bıkero û ene
du'ay tu bikero;
çı halde beno
wa bıbo, du'ay
yi muħeqqeq
qeubul beno.**

Pé nome Homé, ma dest pékén qala xwu

 Öbrahim Çabakçuri


Homa azze we celle, her çi yo hikmet ser viraşt. Viraştış Homé, tim yo holi ser bya. Homa(c.c), inson hémmé ju binonra ard peya... Zon, qom, şemle yin nı onen je binonra. Homéma, Kuronéd yo ayetid von: “zonono rengon şıma nı oynén ji binonrase in séméd pilti Allehrawa(yan Allah her yo çi sér ayeton xwu, piti xwu, hikmeta xwu mejnon şımar a)” Yo ayeta binéd von: “Ma şıma hémmé qom, qabla ser ke cay. Pé şıma ji binoy nı bé şınasné, pé şıma beyn yo cay. Ce Allah, pilti sér teqva séra...”


Peyxmér ma Hz. Muhammed(silom Allah yı sérew), yo hadisê xu şeriféd von: “ ni aréb acemonra, ne acém arébonra berz. Ni sur siawra, ni siaw sura berz. Ce Homéd berzi pe teqwa bena.”


În qal méjnéna, ina dunya ce imtiona. Géra ma énay tim xu vir depéj. Pé emré Homé ser şayış her çıra ver yen. Qısdayış ma, gurey ma gera pi kurono sunnetiw. Ma çi vaxt bi emré İslom ké véşé Alléh nişına.


Zon, yo niméto pilo. Alléhma viraştış ma her şıra rınd viraşt. Ina rındira juk zon. Peyxmer ma(s.a.v) von: “ yo zon yo inson. Diy zon dehaw inson.” İnsón çénék zonon bizon énéq bén kıymetli. Din ma byé İslomra béyr nı verdon ma yo çi sér déwa bıq. Déwa ma, wırıştış ma géra zé bıslımontiv. Ayra déwa qom, qebla cahiltiwa. Temom! Géra inson şexs xu, eqrébon xu dépiş. İn dépeştış héq sérév bén. Cahilti sér dépeştış nıbén. Géra inson qebla xuyra hês bikor; lakin qebla xu sér déwa kérdsa, vérnin debeştsa éna véşé Allé nişına. Maz tim déwa xu, réya xu héq sér, caddé İslom sér bizonki va Allah mara véşiv, rızé yı ma sérdiv.

Ma tyara pé ayga zé mara yéna, géré eşkérdiş ma in péled zon ma zazaki sér bahs kéyn. Ina mésla sér vaté ma éwélin bahskérdiş qesê werênan.


 **Mérdım hol şayış xwuyra bélliwo**


 **A awe ki zéré qawid monéna, tomé xwu kéna vin**

 **Çoyra mé vaj holo, bajo hol nı véjon tı şérméyn**

 **Kerg aw wéna xu ra cor uynéna Homera.**


 **Éndéq nermıw, ayni ze pemév**

 **Mérdım zurker çımon xu ra belli bén**

 **Xaqé bıza quéł, bıza astorinra nı monena.**

 **Meker mevin.**

 **Tı çi bikér tı ay vinen.**

 **Eg tı zoni vaj, eg tı nézoni bıpers.**

 **Zéré kitabra von.**

 **Awe ki vındeno, êyra bitersê.**

 **Tij şewê, aşme sodır nêbeno.**

 **Béhs kutik bıq çé xwu hazırık.**

آشپزخانه دین اسلام

عَقِيدَا اِسْلَامِي آفَا حَيَاتِي يَه

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

بِنَافِ خُدَايِ رَحْمَانُ وَ رَحِیْمُ

تَمَامِي حَمْدُ وَ پَسِنْدَانَا ژِخَوْدِي وَ تَرِيْدَارِي عَالَمِي رَا بِنُ كُو نَافِ وَي اللّٰهُ . اَوْ خُدَايِي
كُو عَقِيدَا رَاسْتُ وَ اِيْمَانُ وَ اِسْلَامُ لِكِرِيَه پَارَا مَه ، مَه ژِعَقِيدَه وَ بَاوَرِيْن شَاشُ وَ بَاطِلُ پَارِيْزَتِيَه .
صَلَاتُ وَ سَلَامُ لِسَرِّ مَزْنِي مَه مُحَمَّدُ بَه كُو مَزْنِي تَمَامِي پِيْعَمْبَرَايَه ، دِيْنِي اِسْلَامِي عَقِيدَا
رَاسْتُ ژِمَه رَه آنيَه . اَوْ لِسَرِّ آلُ وَ اَصْحَابِيْن وَي بَه كُو اَوْ عَقِيدَه حَبَانْدَنَه وَ حَمَانْدَنَه . اَوْ لِسَرِّ
وَ اَنْ كَسَانُ بَه كُو لِيِي رِيْچَا وَ اَنْ مَشِيَانَه حَتَا رُوژَا قِيْمَتِي .

دِيْنِي اِسْلَامِي عَقِيدَه وَ شَرِيْعَتَه . عَقِيدَه اَوْ تَشْتِيْن كُو نَفْسُ وَ اَنْ تَصْدِيْقُ دِكَه وَ دِلُّ بُوَا
رِحْتَه اَوْ لِحْمُ خُدَايِي خَوَه يَقِيْنِي نَه ، شَكُّ وَ شُبُهَه دُوَاْنَدَه تُنَه . شَرِيْعَتُ ژِي اَوْ تَكْلِيْفِيْنُ كُو
خَوَه بَعْمَلُ قَه دِيْگَرْنُ كُو اِسْلَامُ دَعْوَتُ دِكَه بِيَالُ وَ اَنْفَه وَ كَه لِمِيْزُ وَ زَكَاتُ وَ رُوژِي وَ قَنْجِيَا ژِ
دِي وَ بَاقَانُ رَه وَ غِيْرُ وَ اَنْ .

اَمْ دِفِي نَفِيْسَانْدِنَا خَوَه دَه دِيْخَوَازِنُ ژِقَسْمِي عَقِيدِي بِيْتَقِنُ .

عَقِيدَه: دِلْعَتِي عَرَبِي دَه: اَوْ حُكْمِي كُو شُبُهَه تِيْدَه تُنَه لِيَا وَي كَسِي كُو پِي بَاوَرِي آنيَه
. ژِ كَلِمَا "عَقْد" هَاتِيَه گِرْتِنُ كُو: بَعْنَا گَرِيْدَانُ وَ قَوِيْنَكِرِنُ وَ تَابِتَكِرِنُ وَ پِي گِرْتَنَه .

عَقِيدَه دِيْنِي اِسْلَامِي دَه: اَوْ تَشْتِي كُو اِعْتِقَادُ وَ بَاوَرِي پِي تِي قَصْدُ كِرِنُ؛ وَ كَه عَقِيدَا
هُبُوْنَا خُدَا وَ شَانْدِنَا پِيْعَمْبَرَا وَ غِيْرُ وَ اَنْ . خُلَاصَه: اَوْ تَشْتِي كُو اِنْسَانُ دِلِي خَوَه بِيَقِيْنِي بِيْقَه
گَرِي دِدَه چَه حَقُّ بَه چَه بَاطِلُ بَه اَوْ عَقِيدَه يَه . ژِيْرَه تِي گُوْتِنُ عَقِيدَه لُوْرَا دِلُّ بِيْقَه تِي گَرِي
دَانُ .

عَقِيدَا إِسْلَامِي : بَا وِرِيَا بَرِاسْتِي يَه ، اِيْمَانَا قَطْعِي يَه بَرَبِّي تِيَا اللهُ تَعَالَى وَ الْهَيَا وَي ،
بِاسْمَاءُ وَ صِفَتَيْنِ وَي وَ بَمَلِكَيْنِ وَي وَ كِتِيبُ وَ رَسُولَيْنِ وَي وَ بَرُوژَا آخِرَتِي وَ بِيخِرُو شَرِي
قَدَرِي وَ بِيهْمِي تَشْتِينِ كُو اِسْلَامِي ژَوَانُ خَبَرُ دَايَه ژِ مَسْتَلِينِ غَيْبِي وَ بِيَسَاسِيْنِ دِيْنِي اِسْلَامِي وَ
بِيْتَشْتِينِ كُو سَلَفِينِ صَالِحِ لِسَرِي كَوْمُ بُونَه گوتنا وان بويه يك . او عَقِيدَه تَسْلِيمَا
بِتَمَامِي يَه ژِخُدِي تَعَالَى رَه دَامَرُو حُكْمُ وَ طَاعَتِي وَ پِيْرُوِيَا رَسُوْلِي وَي دَه
هَمُ عَقِيدَه نَاقِي وَي عِلْمِي يَه كُو بَحْثَا فَان تَشْتِينِ بِيْهْرِي دِكَه كُو اَسَاسِيْنِ اِسْلَامِي نَه .
ژَبَرُ فِي عِلْمِي عَقِيدِي ژِمَزْتِرُ وَ اَفْضَلِي عُلُوْمِيْنِ اِسْلَامِي يَه . لَوْرَا بِيْهِي عِلْمِي خَالِقِي كَانِنَاتِي
رَبِّي عَالَمِي خُدَا تَعَالَى وَ اَسْمَاءُ وَ صِفَتَيْنِ وَي تِيْنَه نَاسِكِرِنُ ، پِيْعَمْبِرِيْنِ وَي تِيْنَه نَاسِكِرِنُ اَوْ
آخِرَتُ وَ جَنَّةُ وَ جَهَنَّمُ وَ كَلَكُ تَشْتِينِ دِيْنِي مُهْمُ پِي تِيْنَه نَاسِكِرِنُ .
عَقِيدَا اِسْلَامِي وَ قَتَا تِي گوتن مقصدا مه بي عَقِيدَا اَهْلِي سُنَّةُ وَ جَمَاعَتِي يَه ، اَوْ عَقِيدَا
كُو خُدَا تَعَالَى پِي رَازِيَه ژِعْبَادِيْنِ خَوَه كُو خَوَه پِيْقَه بِيْگَرِنُ بِيْگَرِنُ رِي ژِ خَوَه رَه ، عَقِيدَا هَرَسِي
قَرْنِيْنِ قَنَجُ كُو قَرْنِي صَحَابَا وَ تَابِعِيْنَا وَ تَابِعِيْنُ وَ اَنَه .

اَهْمِيْتَا عَقِيدَا اِسْلَامِي :

بَرِاسْتِي ژِقَانُ تَشْتِينِ مَه گوتن تِي فِيمَكِرِنُ كُو عَقِيدَا اِسْلَامِي دِحِيَا تَا كَسِيْنُ مُسْلِمَانَدَه
كَلَكُ مُهْمُ وَ كَلَكُ بِيْهَيَه . بَلِي اَمُ دِيْخَوَازِنُ كُو هِنَكُ تَشْتِينِ دِي ژِي كُو اَهْمِيْتَا عَقِيدَا اِسْلَامِي
دِدِنَه خُوِيَا كِرِنُ بِيِيژِنُ :

1 - ژِهَرُ تَشْتِي بِيْهْتِرُ اِنْسَانُ مُحْتَاَجَه بِيَالُ عَقِيدَا اِسْلَامِي فَه . لَوْرَا سَعَادَةُ وَ خَوَشِي وَ
كِيْفَخَوَشِيَا دِلَا اَنْجَاغُ بِيْاِيْمَانِي وَ عِبَادَتِي رَبِّي عَالَمِي مُمَكِنُ دِيْه . دِدَسْتِيْكََا پِيْعَمْبِرِي دَه آيْتِيْنِ
كُو نَازِلُ بُونُ تَمَامِي وَ اَنُ دِيْبَحْثَا عَقِيدِي وَ بَاوَرِي دَه بُونُ . حَتَا دَه سَالَا اَفُ حَالِي هَا دَوْمُ
كِرُ . رَسُوْلِي خُدَا ژِي بَرِيَا هَرُ تَشْتِي ژُبُونَا بِيْجَه كِرِنُ وَ رُونَشْتَانْدِنَا فِي عَقِيدِي دِيْلِي اِنْسَانَا دَه
شُعْلِيَه وَ غِيْرَتُ كِرِيَه .

2 - عَقِيدَا إِسْلَامِي ژْتَمَامِي فَرْظَانُ وِ وَاَجِبَانُ مَزْنِتْرُو قَوِينْتِرَه وِ دِسْرِيَا تَمَامِي اَمْرَانُ دَه يَه . ژِبَرُ فِ بَرِيَا هَرُ تَشْتِي ژَانَسَانُ اَوْ تِي خَوْسْتِنُ ، دِقْبَرِي دَه ژِي بَرِي اَوْ تِي پِرْسُكِرْنُ . چَوَا كُو رَسُولِي خُدا كَرَمُ كَرِيَه : "اَزْ هَاتِمَه اَمِرُ كِرْنُ كُو بَانَسَانَا رَه حَرْبُ وِ شَرُّ بِكُمْ حَتَا كُو شَهَادَتُ بَيْنِنُ كُو ژَالله پِيَقَه تُو اِلَه تُونِنُ اَوْ مُحَمَّدُ ژِي رَسُولِي وِي يَه" . (بخاري و مسلم)

3 - اَمِينْتِي ، اسْتَقْرَارُ ، خَوْشِي وِ كَيْفِخَوْشِي بَتْنِي بَعْقِيدَا إِسْلَامِي تِينَه جِي . چَوَا كُو خُدا تَعَالَى فَرْمَانُ كَرِيَه : " بَلِي اَوْ كَسِي كُو بَرِي خَوَه بَدَه خُدا وِ قَنْجِي بَكَه مُكَافَاتَا وِي لِحْمُ رَبِّي وِي يَه وِ نَه تِرْسُ ژَوَانْرَه هِيَه وِ نَه ژِي مَحْزُونُ دِبْنُ " (بقره 112) . هَمُ عَافِيَةُ وِ فَرَهِي وِ بَرَكَتَةُ ژِي هَرُ بَعْقِيدَا إِسْلَامِي تِينَه مِيدَانِي . خُدايِ مَزْنُ وَا فَرْمَانُ كَرِيَه : "بِرَاسْتِي كُو اَهْلِي وَا نِ گُنْدَا بَاوَرِي آني بُونَانُ وِ ژِ خُدا تَرَسِيَا بُونَانُ بِي شَبَهه مِي دَرِي بَرَكْتِينِ اَسْمَانَا وِ اَرْضِي لَوَانُ فُكْرَانَا" . (اعراف 96)

4 - جِه كِرْتِنُ وِ سَكْنَا لِسَرُ رُوِي اَرْضِي بِحُظُورُ وِ رِحْتِي اَوْ چِيكِرْنَا دَوْلْتَا إِسْلَامِي بَعْقِيدَا إِسْلَامِي مُمَكِنُ دِبَه . خُدايِ تَعَالَى فَرْمَانُ كَرِيَه : "بِي شَهَه مَه دَبِي لَوْحُ الْمَحْفُوظِي دَه دِ وَا نِ كِتَابِينُ كُو مَه شَانْدِيَه دَه نَفِيسَانْدِيَه كُو عِبَادِي مِي صَالِحُ وِي دُنْيَايِ بُوِيرْتِينُ" . (انبيا 105)

بَلِي... مَعْلُومَه كُو اَمَ نِكَارِنُ مَزْنَاتِي وِ قَدْرِبَلَنْدِيَا عَقِيدَا إِسْلَامِي بِحَقِّي دِقَانُ چَنْدُ پَلْكَادَه بَجِي بَيْنِنُ ، بَلِي بَهَنْدِ كَايِي بَه ژِي تِي فِيمَكِرْنُ كُو عَقِيدَا إِسْلَامِي ژِ تَمَامِي اِنْسَانِيَتِي رَه وَكَه آفَا حَيَاتِي يَه . ژِبَرُ فِ دَفِي كُو اَمَ بَتَمَامِي قُوْتَا خَوَه ژُبُو جِهْ كِرْتِنُ وِ قَوِينَكِرْنَا عَقِيدَا إِسْلَامِيَا رَاسْتُ بَخِيْتِنُ ؛ دِدْلَانُ دَه وِ حَتَا دَتَمَامِي وِ لَاتَانُ دَه .

خَبَاتُ وِ غَيْرَةُ ژِمَه تُو فِيقُ ژِخُدايَه .

(7-گلان-2009)

يَارَبُ تُو مَه مُوَفَّقُ بَكِي!.. آمِينُ!..

(عَبْدُ الْقُدُوسُ حَلْمِي دِيَارَبَكِرِي)

Zaroka

bexçê

ŞİRET:

- Tîştê çu mede du
- 'Alım ji bir dike, qelem ji bir nake
- Kes bî sala nabe mela
 - Tîştê çu haho neke, tîştê hat héhé neke



Ji Risaleyên Nur:

- Bismillah serê hemu xêraye. Em ji bî Bismillah destpêdîkîn.

- Jiboy ni'metê daye me, xweda sé tîştê dîx-waze: Zîkir, fîkr, şîkr. Go tu dî seride béje Bismillah Zîkr e. Dî nivî de bîfîkre ku ew ni'met ji xweda ye Fîkr e. Dî dawiyên de béje Elhêmdülillah Şûkr e.

PEYV:

(Hevnaskirîn)

- Selamun 'aleykum
—'Aleykum selam
—Navê te çiye?
—Navê min Huseyn e. Yê te çiye?
—Navê min ji Hesên e.
—Huseyn tu ji kiderê ye?
—Ez ji Batmanê me. Tu?
—Ez ji Cizirê me.
—Baş e, ez bî naskirîna te kêfxweş bum.
—E ji. Heta carekêdî emanetê xweda be.
—Tu ji...

(Mamîk-Têderxistinok)

1. Qesreke spi bé derî?
2. Tîşteke dikeve avê şîl nabe?
3. Hîlîntir mîlîntir law ji bavê mezîntir?
4. Qesreki şîştî mîştî, du mîr té de runîştî?
5. Kanîka qîné qîné mir u belengaz dest didîné?

- a. Guz (guwîz)
- b. Poz (Bévil)
- c. Agîr u duman
- d. Héq
- e. Sih

1. d 4. a
2. e **Cewab** 5. b
3. c



ÇIROK:

RUVI TÈR BE


Ruvi tère, tiri tırşe gotiye
pèşiya
Lé gelo bırçıbe dıkeve çı dızı-
ya
Ne 'elok dihèle ne mırışk, bı
çavnebarıya
Kâre gündeki lıxwe bine hev,
tevi goziya
Ruvi ruviye, geh bı zeğeliyè
geh bı ehmeqiyè
Nav daye dı meselè çirok u
nèçiriye
Nabine dekk u feqqè berxwe
ji nankoriyè
Çav berdide bazdan u şikefté
hetta dawiyè

Ruvi ne dıçu qùla şikeftè ji
binide
Lè pejik ji bı terriya xwu re
xiste biserde
Ruviyé kendala digere li
newala heger seriberde
Heya tũ lé hayi dibe rez u
werz dihedime bihevde
Bı tuma gıha xwe vedşère
dıpışt deviya
Derdè wi ne xwarıne dıxwaze
lıhevxe heramiya

Rojeki şèr u, gür u ruvi
dıçın nèçiriye. Mèşinek,
bizinek u kivoşkek dikü-
jin. Dema bırçı dıbin, şèr
jiwan re dıbèje: "Em bırçı
bune. Birayè gür, ka lime
payèke." Gür dıbèje:
"Qıralé mın, méşin è teye,
bızın è mın e, kivoşk ji è
ruviye." Şèr dıbèje: "Te ne
'ediland." U pençeki lé dıxe.
Gür diküje. Pıştı gür dımre.
Laşé wi li 'erdé diréj dibe. Paşı
ji ruvi re dıbèje: "Birayè ruvi!
Ka tũ ji me re payèke." Ruvi li
gür dınhère u dıbèje: "Qıralé
mın, çı hewceyè payè
kırınèye. Mèşin taştéya te ye.
Bızın fıravına te ye. Kivoşk ji
şıva te ye." Şèr dıbèje: "Eferim.
Te ev 'edalet ji ké sıtend?"
Ruvi dıbèje: "Jı vi guré li 'erdé
diréjkırı"
Tũ güh nede ruviyè çarnık, ji
xwe dıçe heramiya
Balaxure baz bıde ruviyè du
ling u be teriya
Carna ji bı külav u gopala
dıxapine gündıya
Firehyè de xarınoke,
tengasiyè de xwe davèje be-
tiya.
Tũ misala bıxwaze, bınhèr li
kuçkèn Emriqiya
Xwe davèjin bı baské Emriqa
jıbo sıtariya.

(Cinavk:
Zamir)

- Ez: Ben
- Tu: Sen
- Ew: O
- Em: Biz
- Hun: Siz
- Ewana: Onlar



ELFABEYA DI KOVAR Ê DE TÊ BIKARANÏN

Latini	'Erebi	Misal (Minak)
A-a	ا	<i>Av, nav, dar, nan, baran</i>
B-b	ب	<i>Bilind, beybun</i>
C-c	ج	<i>Ci, cejn, cot</i>
Ç-ç	چ	<i>Çi, Çirok, Çiçik</i>
D-d	د	<i>Deng, desti, dadé</i>
E-e	ه	<i>Eré, ez, germ</i>
Ê-ê	ع	<i>Nér, mér, şér, tér</i>
	ع	<i>'ijir, br'iv, 'eyb, qet'</i>
F-f	ف	<i>Fedi, feyde, def</i>
G-g	گ	<i>Gazin, guhertin, guz, gezo</i>
Ğ-ğ	گ	<i>Ğar, ğezal, ğeydok, Ğela</i>
H-h	ه	<i>Hélin, dahol, hasin,</i>
H-h	ح	<i>Heram, heband, heb, heyiri, hal, hori</i>
I-ı		<i>Rınd, mın, dın, wın</i>
İ-i		<i>İn, şin</i>
J-j	ج	<i>Jor, Jér, lijo</i>
K-k	ک	<i>Kes, ki, ka</i>
L-l	ل	<i>Lam, lal, ling</i>
M-m	م	<i>Mın, mij, misin, mirov</i>
N-n	ن	<i>Nan, wan, neynik, nu</i>
O-o		<i>Ol, dor, jor, şor</i>
P-p	پ	<i>Pez, pır, pepuk, pel</i>
Q-q	ق	<i>Qaz, qal,</i>
R-r	ر	<i>Rewş, razan, reş, ru</i>
S-s	س	<i>Sé, sal, sedem, serma</i>
Ş-ş	ش	<i>Şiş, şal, şor, şeş</i>
T-t	ت	<i>Ta, tutik, teşt, tev,</i>
TH-th	ط	<i>Tha, ther, thav</i>
U-u		<i>Ulaq, kur, gur, gund</i>
Û-û		<i>Kûr, bûn, hebûn, çûn</i>
V-v	ف	<i>Va, vir, veqetandin</i>
W-w	و	<i>Wunda, wisa, wir, war, ew</i>
X-x	خ	<i>Xani, xort, xurt, xwarin, xebat</i>
XW-xw		<i>Xwarin, xwendin, Xweda, xweh, xwişk</i>
Y-y	ی	<i>Yadé, yabo, yé</i>
Z-z	ز	<i>Zozan, zer, ziv, zu</i>

FERHENGA JIMARÊ

Dilziz: Duygulanmak	Ehsen: Xweşik, rınd
Sazgér: yé ku derxistiye meydané	Belgek: pelikek, pelik
Derdnak: Yé bı derd u ğem	Daréte: davéte, avétın
Mustez'ef: Mezlum, Yén dı bin zulmé de	Xaif: yén dırsın, mutteqı
Lomandin: Şermezar kırın	Muksi: Feqiyé Theyran
Nefi: Surgun, koçberkırın	Quluban: qelb, dil
Rewş: Hal, weziyet	Cerg: ceger
Mézekırın: Nihértın	Ferhemni: Rehmé lı mın bike
Mérık: Zılam	Berxwedan: Direniş
Xelas: Filitandin	İsti'mal: Bıkarandin
Ga: Okuz	Başqan: serek
Boç: Duv	Séçım: Hilbijartın
Mızgeft: cami	Rêç: ré
Nıméj: Liméj, salat	Hendese: Geometri
Hemu: tev	'Enırandın: qehr, ğezeb
Belengaz: zawallı, feqır	Bergıdan: bedel
Kani: Çavkani, Kaynak	Bızdok: Tırsonek
Néçir: Av	Serkehni: Çavkani
Ferheng: Sozluk	Munewwer: bı nur, nurani
Elifba: Elfabe	Filheqıqet: Dı heqıqeté de
Xatırxwazi: Weda'	Busedar: yén maç dıkın, radmısın
Çerx: Çerq	Mexluqat: Hebun, Yén hatine çekırın
Veşriyin: Veşarti	Serf u Nehw: 'İlmé 'Erebi
Thebib: Doktor, Hekim	Subh: Şeveq, Roj
Herca: Her ci, her der	Şam: Êvar
Bobekr: Ebubekr (r.a)	Mah: Meh
Muznib: Gunehkar	Wisal: Gihaştın
Meddah: Pesınkar, yé pesna dıde	Bad: Ba
Meqtul: kuşti	Sár: Cemed, cemıdı
Mektubi: Nivisandi	Hétun: Ocaxa kevıra, Wolqan
Şems: Roj, Thav	Jir: Zeki, Yé bı qabiliyet
Qemer: Heyv, hiv	
Şeb: Şev	

Kovar: Dergi, Mecelle
 Çand: Kultur
 Huner: sen'et, sanat
 Bang: Da'wet, Davet
 Weşankar: Editor
 Beş: Pışk, qısım
 Berpırsiyar: Mesul, Sorumlu
 Çapxane: Matbaa
 Berhem: Eser
 Xefik: Daf, Dafık, Tuzak
 Kemin: Xefik
 Şiret: Nesihet
 Sermed: Ebedi
 'alim-ul ğeyb : zanayé ğeybé Ellah
 Menşe: jéderk, kok
 Erwah: Ruh, tamam
 Su'eda: bextewar u se'id
 Nehsan: Béyom, bébext
 Sema: Asiman
 Xelq: Afırandın, heyat dayın
 Ma: av
 Tin: heri
 Cuz: Yek
 Kull: Gış, Hemu
 Gil: heri
 Bâri: Nav é Ellah Te'ala

Axiri-z zemani: zemané dawın, é paşi
 Hacib: perde
 Mensux: bethal
 Xurşid: ro, thav
 Saye: si
 Ne't: pesn
 Meddah: pesndar
 Emced: mezin
 Şir: Şur
 Ezman: zıman
 Sinor: Tuxub, sınır
 Tevger: Hereket
 Lebat: Hereket
 Heyam: Çax, dönem
 Gerdun: Kainat, evren
 Hérs: Sinir, Qehr
 Yezdan: Xweda
 Qasid: Resul, Yé té şandin
 Rispi: Yextiyar, Yé ro diti
 Cıhu: Yahudi
 Senem: Put
 Tiréj: Ronahiya rojé
 Mızıcandin: Ken, kenandin
 Serfirazi: Ser bılındı, bı şeref
 Destpék: seri, dı seride
 Mertal: Kalkan

Kevıntrın: Heri kevn
 Malbat: Aile, Familia
 Civat: Cema'at,
 Serkeftın: Bı ser ketin, Muweffeqiyet
 Lékolin: Légerin, Araştırma
 Suflı: Tiştén pis, nızım
 Peyv: Gohtın, Xeber
 Serpéhati: Xatıra, Seruwen
 Feqi: Telebé 'İlmé İslami
 Seyda: Mezin, Xoce, 'Alım
 Navdar: Meşhur
 Armanç: Çaye
 Me'suq: Yé té heskırın
 'Abid: Yé 'ibadet dıke
 'Iyan: aşikâr, eşkere
 Ponijandin: Kur kur fikr
 Qelıbandın: Kırna du şeş, Ketna hundır
 Semere: Meywe
 Şop: Ré, Réç
 Hévi: Ümid
 Wéje: Edebiyat
 Parastın: Mıhfeze kırın
 Neqandin: Terçih
 Şarstani: Medeniyet
 Wergér: Tercüman
 Révi: Rovi, tilki



Îro Ez fikirim hinek

*Îro ez fikirim hinek
Ez ketim behra bé bini
Min didi 'ecébin gelek
É ku digrin é ku di kenin*

*Min diditin é ku dikenin
Hemu xwunxwar u 'asi bun
Min diditin é ku digrin
Hemu jar u tev tazi bun*

*Hingi kezebém şewitin
Dil u hé navém peritin
Xun u mijiyém lebitin
Min gazi kire ketiya*

*Geli te'zi u birçiya
Guh bîdîn min béjin çi ye
Ev çî-j 'evda re 'evditi ye
Ev xespa(ğesp) lî ser me çî ye*

*Ne layiqé meye ev hal
'işé me buye qil u qal
Bira emé heta çend sal
Bîndest bîn jî van tağuta ra*

Şehîd Òbrahim Xoce



Kelha Amed

Ez dirêj runiştım iro
Lı ser Kelha Amed
Kelha mêra
Xeyala ez girtım sar u germ
Dil bu hêtuna ğema
Êş u jan bune berri
Gelo ka ew mêrxwas?
Ka ew jir u zana?
Ka ew şurkêşê riya heq?
Qey neman?...

Hew kes tê,
Deng nayê ji qebra...
Ey Kelha Amed!
Qey Seîd neman?...

Qerejdağ reş girêda,
Gola Wanê çikiya,
Hew diherike Dicle u Ferat,
Berf nema tê li Şerefdin,
Herran cemidi,
Ağır hew dibe sorgül,
Av nema diherike,
Ci nema li Cudi...

Sukuta mêraniyê
Kelha Amed...
Dergevanê sîrrê tarixê
Kelha Amed...
Dîgiri u dibêje...

Kerwan hatın u çun
Qefile u qefile,
Ji dengê mezın şop u rêç man,
Sibeha, azanê bilind seh kır
Çiya kerr bu,

Bu çerqına sîmê hespa.
Ava rê dıda
Geli bê deng bu
Jı narê tekbira.
Dewran qulibi
Felek xain ket
Kelh bu warê kûnda...

Kulilk çilmisin.
Germa şevê çu
Bayê sekeratê tar u mar kır
Bu me kulilk u huzna meqberan

Bende warê xwe bin di nav xwe da
Dengê Bilali, narê Heyderî,
Nalina Iqbali
Hêvi heye li ser sazbin...
Fereca xerê,
bêhna cihad u rehmetê
Ba's u ba'de-l mewta ummetê...

Me piştaxwe da tarixê
Kelha Amed...
Berê xwe da diya mêra
Kelha Amed...

Guh li deng çav li rê
Bendeyê 'eskerê nurê bin

Lı hêviya şur u şerê xweda
De werin, de rabın werin
Weka şurê 'Eli, weka 'eskerê
Xalid
Weka 'edaleta 'Umer,
weke qêrina Zeyneb...

Bilındkın, bî şerefkın,
De rabın barkın vi barî
Girêdın rexta,
Bikşının xencera cihadê
Derkevın weka Dırar,
Ebu Dücane bin bî nara
Hemze bin bîbin xwedi,
Xalid bin bîbin Xalid...

Huseyn bin ji Kerbela
Jı Seîda re bî gulle u gotın
De werin xerakın konê zulmê
Zuwakın çavê mezlum,
Bikujın kufr u zulmê...

Bese qêrin u nalin,
li ser mêrg u kaniyê me
De werin ... Bikine xencer
Qur'anê bilındkın bibine âla
din...

Ey hêviya minî bîst salî!
Hestirê çavê diya
Xwina dilê birindarê susa
Namusa ğeyretkêşa,
Bî navê hezara qîzê susa
Tekbira şehid,
Dersa şehadet
Hêviya kêfa ...